



Kurdiyat



e-ISSN 2717-8315

Yıl/Sal/Year: 2023 Sayı/Hejmar/Issue: 8

e-Ağ/Web: <https://dergipark.org.tr/tr/pub/kurdiyat>



Kurdiyât



Kurdiyât - Year/Sal/Yıl: 2023, Issue/Hejmar/Sayı: 8
e-ISSN: 2717-8315

Kurdiyât is an international scientific peer-reviewed journal
Kurdiyât kovareke navneteweyî, zanistî ya bihekem e
Kurdiyât uluslararası bilimsel hakemli bir dergidir

Period | Peryod | Periyod

Biannually, June and December
Salê du hejmar, Hezîran û Kanûna Pêşîn
Yilda iki sayî, Haziran ve Aralık

Scope | Vegirî | Kapsam

Kurdish Language, Culture, Literature, History and Art
Ziman, Çand, Wêje, Dîrok û Hunera Kurdî
Kürt Dili, Kùltürü, Edebiyatı, Tarihi ve Sanatı

Language Publication | Zimanê Weşanê | Yayın Dili

Kurdî, Türkçe, English , عربي , فارسی

Articles should include a title, abstract (250-400 words), keywords (at least 5 concepts) in at least two languages, especially Kurdish and English, and should be prepared in accordance with APA 6 citation system.

Gotar divê sernavê, kurteyê (250-400 peyv) û peyvên sereke (herî kê m 5 têgeh) bihewîne ku ew kê mî bi du zimanan bê nivîsîn, bi taybetî jî kurdî û inglîzî, herwiha gotar divê li gorî sîstema jêderan a APA 6ê bê amadekirin.

Makaleler Kürtçe ve İngilizce başta olmak üzere en az iki dilde başlık, özet (250-400 kelime), anahtar kelimeler (en az 5 kavram) içerir ve APA 6 atıf sistemine uygun olarak hazırlanır.

Executive Office | Rêvebirî | Yönetim Yeri ve Adresi

Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi
Yaşayan Diller Enstitüsü, 65080, Zeve Kampüsü, Tuşba/Van
Phone/Têlefûn/Telefon: 04322251452, Fax/Faks: 04322251228

Contact | Têkilî | İletişim

e-mail: kurdiyât@yyu.edu.tr | yde@yyu.edu.tr
<https://dergipark.org.tr/tr/pub/Kurdiyât>

Design | Rûpelsazî | Dizgi

Öğr. Gör. Erdal YILDIZ, Van YYÜ

Abstracting and Indexing Services | Dizinlenme ve Kataloqlama Bilgileri

ASOS, EuroPub, OpenAIRE, Google Scholar, Index of Academic Documents, ACARINDEX, Ideonline, İSAM, ResearchGate.

Publication Date | Tarîxa Weşanê | Yayın Tarihi

December/ Kanûna Pêşîn/ Aralık 2023

T.C.
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

Publisher | Weşanger | Yayıncı

Van Yüzüncü Yıl University Institute of Living Languages
Zanîngeha Van Yüzüncü Yıl Enstîtuya Zimanên Jîndar
Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü

Owner | Xwedî | Sahibi

On behalf of Van Yüzüncü Yıl University Institute of Living Languages
Li ser navê Zanîngeha Van Yüzüncü Yıl Enstîtuya Zimanên Jîndar
Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü adına
Prof. Dr. Abdulhadi TİMURTAŞ

Editor in Chief | Edîtor | Editör

Doç. Dr. Yakup AYKAÇ

Field Editor Board | Edîtorên Biwarî | Alan Editörleri

Doç. Dr. Haşim ÖZDAŞ Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi
Doç. Dr. Kenan SUBAŞI Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye
Dr. Öğr. Üye. Ömer DELİKAYA Bingöl Üniversitesi, Türkiye
Dr. Öğr. Üye. M. Şirin FİLİZ Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye

Language Editors | Edîtorên Zimanî | Dil Editörleri

Hacı YILMAZ, Öğr. Gör., Van YYÜ (İngîlîzî/English/İngilizce)
Kenan SÖYLEMEZ, Master, Van YYÜ (Tirkî/Turkish/Türkçe)
Mahmoud ALNAFFAR, Öğr. Gör., Van YYÜ (Erebî/Arabic/Arapça)
Sinan ÇAKAR, Dr. Araş. Gör., Van YYÜ (Farisî/Persian/Farsça)

Writing Editors | Edîtorên Rastnivîsê | Yazım Editörleri

Hakan ÇELİK, Master, Van YYÜ
Fatoş ARSLAN, Master, Van YYÜ

Final Reading | Xwendina Dawî | Son Okuma

Kenan SÖYLEMEZ, Master, Van YYÜ
Fırat ATILGAN, Master, Van YYÜ

Editorial Board | Lijneya Weşanê | Yayın Kurulu

Prof. Dr. Abdulhadi TİMURTAŞ	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Türkiye
Prof. Dr. Abdurrahman ADAK	Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye
Prof. Dr. M. Zahir ERTEKİN	Mardin Üniversitesi, Türkiye
Prof. Dr. Pakhshan Sabir HAMAD	Soran University, KRG/Iraq
Prof. Dr. Tahirhan AYDIN	Dicle Üniversitesi, Türkiye
Prof. Dr. Yadgar Rasool H. AMEEN	University of Soran, KRG/Iraq
Associate Prof. Hassan SARBAZ	University of Kurdistan, Iran
Associate Prof. Hemin Omar AHMAD	Soran University, KRG/Iraq
Doç. Dr. Ahmet KIRKAN	Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye
Doç. Dr. Ercan ÇAĞLAYAN	Muş Alparslan Üniversitesi, Türkiye
Doç. Dr. Kenan SUBAŞI	Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye
Doç. Dr. Mustafa ÖZTÜRK	Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye
Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Türkiye
Doç. Dr. Osman ASLANOĞLU	Dicle Üniversitesi, Türkiye
Doç. Dr. Yakup AYKAÇ	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Türkiye
Assistant Prof. Hewa Salam KHALID	Indiana University, USA
Assistant Prof. Yadollah PASHABADI	University of Kurdistan, Iran
Assistant Prof. Abdulsalam N. ABDULLAH	University of Zakho, KRG/Iraq
Assistant Prof. Habilallah SALIMI	University of Kurdistan, Iran
Assistant Prof. Zaniar NAGHSHBANDI	University of Kurdistan, Iran
Dr. Öğr. Üye. Zafer AÇAR	Bingöl Üniversitesi
Dr. Nurettin ERTEKİN	Hakkari Üniversitesi, Türkiye
Dr. Yusuf BALUKEN	Yozgat Bozok Üniversitesi, Türkiye

Advisory Board | Lijneya Şêwrê | Danışma Kurulu

Prof. Dr. Abdullah KIRAN	Muş Alparslan Üniversitesi, Türkiye
Prof. Dr. Farouk ISMAEL	Universität Hamburg, Germany
Prof. Dr. Halit DEMİR	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Türkiye
Prof. Dr. Hasan TANRIVERDİ	Dicle Üniversitesi, Türkiye
Prof. Dr. Hayreddin KIZIL	Dicle Üniversitesi, Türkiye
Prof. Dr. Hayrullah ACAR	Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye
Prof. Dr. Jaffer SHEYHOLISLAMI	Carleton University, Canada
Prof. Dr. Ludwig PAUL	Universität Hamburg, Germany
Prof. Dr. Yadgar Rasool Hamad AMEEN	University of Soran, KRG/Iraq
Associate Prof. Bakhtiar SADIJADI	University of Kurdistan, Iran
Doç. Dr. Kemal KAYA	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Türkiye
Doç. Dr. Kenan BULUT	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Türkiye
Doç. Dr. Mahmut DÜNDAR	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Türkiye
Doç. Dr. Necat KESKİN	Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye
Dr. Michael CHYET	Washington Library, USA

Kurdiyât, 8

Reviewers of the this Issue | Hekemên vê Hejmarê | Bu Sayının Hakemleri

Prof. Dr. Abdulcebbar KAVAK	Karabük Üniversitesi
Doç. Dr. Ali TENİK	Harran Üniversitesi
Doç. Dr. Bedrettin BASUĞUY	Bingöl Üniversitesi
Doç. Dr. Canser KARDAŞ	Muş Alparslan Üniversitesi
Doç. Dr. Necat KESKİN	Mardin Artuklu Üniversitesi
Dr. İlyas SUVAĞCI	Hakkari Üniversitesi
Dr. Nevzat EMİNOĞLU	Muş Alparslan Üniversitesi
Dr. Nurettin ERTEKİN	Hakkari Üniversitesi
Dr. Ömer TAY	Bingöl Üniversitesi
Dr. Sinan ÇAKAR	Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi
Dr. Şehmus ORKİN	Muş Alparslan Üniversitesi
Dr. Yusuf BALUKEN	Yozgat Bozok Üniversitesi
Dr. Zafer AÇAR	Bingöl Üniversitesi

All responsibility of the articles published in the journal belongs to the authors and the publication rights belong to the Van Yüzüncü Yıl University Institute of Living Languages. It may not be reproduced or reproduced in any form, in whole or in part, without the permission of the publisher. Editorial board of the Journal is free to publish and publish the articles. Articles submitted to the journal are not returned. Editorial board does not accept any legal liability for articles.

Berpirsiyariya meqaleyên ku di kovarê de têne weşandinê ya nivîskarên wan bi xwe ye. Heqê weşana gotaran jî aîdê Enstîtuya Zimanên Jîndar a Zanîngeha Wan Yüzüncü Yilê ye. Qismen yan jî bi tevahî, bêyî destûra weşanger tu gotar nayê çapkirin û zêdekirin. Lijneya Weşanê di biryara xwe ya weşandin yan jî neweşandina gotarê de azad e. Gotarên ku ji bo kovarê hatine şandin bi şûn de cardin nayên îadekirin. Lijneya kovarê û komîteya editîtorî derbarê gotaran da mesûliyeta qanûnî qebûl nake.

Dergide yayımlanan makalelerin tüm sorumluluğu yazarlarına; yayın hakları ise Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü'ne aittir. Yayıncının izni olmadan kısmen veya tamamen herhangi bir şekilde basılamaz ve çoğaltılamaz. Dergi Yayın Kurulu gönderilen yazıları yayımlayıp yayımlamama konusunda serbesttir. Dergiye gönderilen makaleler iade edilmez. Yayın Kurulu ve editöryal ekip makalelerle ilgili herhangi bir yasal yükümlülük kabul etmez.

Contents/Naverok/İçindekiler

Research Articles/Gotarên Lêkolînê/Araştırma Makaleleri

ŞOPA FEQÎYÊ TEYRAN DI EDEBÎYATA TESEWUFÎ DE

The Place of Feqîyê Teyran in Sufi Literature

Feqîyê Teyran'ın Tasavvuf Edebiyatındaki Yeri

Ayhan YILDIZ—7

BANDORA ŞAXA TERÎQETA QADIRÎ-XALISÎ LI ANATOLYAYÊ

The Influence of the Sufi Order Qadirî-Khalisî in Anatolia

Kadiri-Halisi Tarikat Kolunun Anadoludaki Etkisi

Veysel BAŞÇI—31

MIRINA KALEKÎ RIND WEK BILDUNGSROMANA REWŞENBÎREKÎ KURD

Mirina Kalekî Rind as Bildungsroman of a Kurdish Intellectual

Bir Kürt Aydınının Oluşum Romanı Olarak Yaşlı Rind'in Ölümü

Mehmet YILDIRIMÇAKAR & M. Zahir ERTEKİN—51

ÂŞIK VE DENG BÊJ İCRALARINDA DİNLEYİCİ ROLÜ (KARŞILAŞTIRMALI BİR ANALİZ)

The Role of the Audience in Aşik and Dengbêj Performances (A Comparative Analysis)

Rola Temaşevanan di Performansa Aşiq û Dengbêjan de (Analîzeke Berawirdî)

Memet Metin BARLIK & Nevzat AĞÇAKAYA—69

Bibliography/Bîbliyografya/Bibliyografi

TÜRKİYE'DEKİ BAZI YAZMA ESER KÜTÜPHANELERİNDE BULUNAN "KÜRDÎ" KÜNYELİ MÜELLİFLER VE ONLARA AİT ESERLER

Nivîskarên bi Nasnameya "Kurdî" û Berhemên Wan di hin Pirtûkxaneyên Destxetên Tirkiyeyê da

Authors with "Kurdî" tags and Their Works in some Manuscript Libraries in Turkey

Kenan BOZKURT—85

Book Review/Nirxandina Pirtûkê/Kitap İncelemesi

RÊZIMANA ZAZAKÎ YA DEVOKA GINGIMÊ

Pınar YILDIZ—147



Kurdiyât

Yıl/Sal/Year: 2023

Sayı/Hejmar/Issue: 8

e-ISSN 2717-8315

Doi: 10.55118/kurdiyat.1329084

Rüpel/Sayfa Page: 7-30



Article Types/Cureyê Gotarê/Makale Türü: Research Article/Gotara Lêkolînê/Araştırma Makalesi
Received/Dema Hatînê/Geliş Tarihi: 18.07.2023
Accepted/Dema Pejirandinê/Kabul Tarihi: 10.11.2023
Ayhan YILDIZ, Dr. Öğr. Gör., Mardin Artuklu Üniversitesi.
ayhanyildiz@artuklu.edu.tr
ORCID: 0000-0002-8763-4182

Reviewing and Plagiarism/ Değerlendirme ve İntihal:
This article has been reviewed by at least two anonym reviewers and scanned by iThenticate plagiarism website./ Bu makale iki taraflı kör hakem sistemine göre en az iki hakem tarafından değerlendirilmiştir ve iThenticate adlı intihal sitesinde taranmıştır./ Ev gotar herî kêm ji aliyê du hakeman va hatiye nixandin û di malpera intihalê ya iThenticate ra hatiye derbaskirin.

Citation/Atıf: Yıldız, A. (2023). Şopa Feqîyê Teyran di edebiyata tesewufê de, *Kurdiyât*, 8, 7-30.
DOI: 10.55118/kurdiyat.1329084.

ŞOPA FEQÎYÊ TEYRAN DI EDEBİYATA TESEWUFÎ DE

Ayhan YILDIZ

Kurte

Mijara vê xebatê hêla tesewufî ya Feqîyê Teyran e. Vî şairê klasîk ê edebiyata kurdî ku bi berhemên xwe yê di terza edebiyata gel a tesewufî de bala lêkolînerên tarîxa tesewufa Îslamî û dîroka edebiyatê kêşeya, di qonaxên dîrokî yê edebiyata kurdî de cîyê xwe negirtîye. Çexera wî ya edebî ya di edebiyata kurmançî de û aliyê wî yê tesewufî yê di dîroka tesewufa Îslamî de hêjayî lêkolînê bû. Wî çawa ku qonaxeke nû bi navê “edebiyata tesewufî ya gel a kurmançî” li edebiyata kurdî zêde kirîye, karîgerîyek li ser edibên edebiyata klasîk a kurmançî yê pey xwe jî kirîye û ev karîgerîya wî ya edebî-tesewufî li ser şairên mîna Melayê Bateyî, Bekir Begê Erizî, Axaokê Bêdarî, Feqî Reşîdê Hekarî, Şêx Ehmedê Feqîr, Şêx Nûredînê Birîfkanî û Elîyê Findikî bi zelalî xuya dike. Lewre divê ku di qonaxên dîrokî yê edebiyata kurdî de bi vê bizavê binbeşeke nû ji vê bizava wî re bihê vekirin û di dîroka edebiyata tesewufî ya Îslamî de, li kêleka şairên edebiyata tesewufî ya gel a îslamî Yunus Emre û Kaygusuz Abdal ji Feqî re jî cih bihê veqetandin. Ji ber van egeran ev lêkolîn, bi armanca ku van aliyên wî yê cîyawaz bi zelalî dîyar bike dereket rê. Îddîaya vê lêkolînê ew bû ku cîyê Feqî, di qonaxên dîrokî yê edebiyata îslamî ya kurdî û tevgerên tesewufî yê îslamî de cîyekî xweser e. Lewre vê xebatê, ji teknîkên rêbaza kalîtatîf bi lêhûrbûna ser berhemên wî, xebatên ku berê li ser jîyan, berhem û kesayetîya wî ya edebî hatine kirin û bi teknîka hevîtina digel çavkanîyên hevdem bi kar anî. Bi vî awayî gihaşt wan vedîtin û wê encamê ku Feqî bi terzê zimanê berhemên xwe, bi riwangeha xwe ya edebî û tesewufî ji şairên kurmançî ên berî xwe cîyawaz e, çexereke nû di qonaxên dîrokî yê edebiyata kurmançî de vekirîye.

Peyvên Sereke: Dîroka edebiyatê, Edebiyata tesewufî, Edebiyata gel, Nutuq, Feqîyê Teyran.

Feqîyê Teyran'ın Tasavvuf Edebiyatındaki Yeri

Özet

Bu çalışmanın konusu Feqîyê Teyran'ın tasavvufî yönüdür. Tasavvufî halk edebiyatı tarzı eserleriyle tasavvufî İslam tarihçileri ve edebiyat tarihçilerinin dikkatini çeken bu kalsik Kürt edebiyatı şairi, Kürt edebiyatı tarihi dönemlerindeki yerini alamamıştır. Onun Kurmanci edebiyatındaki edebî çığır ve İslami tasavvuf tarihindeki tasavvufî yönü araştırmaya değerdi. O, Kürt edebiyatına “Kurmanci halk tasavvuf edebiyatı dönemi” adıyla yeni bir boyut kazandırmış, kendinden sonraki klasik Kürt edebiyatı edipleri üzerinde bir etki bırakmış ve bu edebî-tasavvufî etkisi Melayê Bateyî, Bekir Begê Erizî, Axaokê Bêdarî, Feqî Reşîdê Hekarî, Şêx Ehmedê Feqîr, Şêx Nûredînê Birîfkanî û Eliyê Findikî açıkça görülmektedir. Dolayısıyla Kürt edebiyat dönemleri tarihinde bu akımla yeni bir alt başlık açılmalı ve İslami tasavvufî edebiyat tarihinde de İslami tasavvufî halk edebiyatı şairlerinden Yunus Emre ve Kaygusuz Abdal'ın yanbaşında Feqî'ye de yer ayrılmalıdır. Bu sebeplerden bu araştırma, onun bu farklı yönlerini açıklığa kavuşturmak amacıyla yola çıktı. Feqî'nin İslami Kürt edebiyatının tarihi dönemlerdeki yeri ve tasavvufî İslam hareketlerindeki yeri özgün olduğu, bu araştırmanın iddiasıdır. Dolayısıyla bu çalışma nitel araştırma yöntemlerinden eserlerini ve daha önce onun yaşamöyküsü, eserleri ve edebî kişiliği üzerinden yapılan çalışmalarını inceleme tekniği ve çağdaş kaynaklarla görüşme tekniğini kullandı. Bu şekilde şu bulgu ve sonuçlara ulaştı: Feqî, eserlerinin dil tarzıyla, edebî ve tasavvufî bakış açısıyla, kendinden önceki Kurmanc şairlerden farklıdır ve Kurmanci edebiyatının tarihi dönemlerinde yeni bir çığır açmıştır.

Anahtar Sözcükler: Edebiyat Tarihi, Tasavvuf Edebiyatı, Halk Edebiyatı, Nutuk, Feqîyê Teyran.

The Place of Feqîyê Teyran in Sufi Literature

Abstract

The subject of this study is the sufi aspect of Feqîyê Teyran. This classical Kurdish literature poet, who attracted the attention of sufi Islamic historians and literary historians with his sufi folk literature style works, could not take his place in the historical periods of Kurdish literature. His literary breakthrough in Kurmanji literature and his mystical aspect in the history of Islamic sufism were worth researching. He added a new dimension to Kurdish literature with the name of “Kurmanji folk sufi literature period” and left an impact on the classical Kurdish literature writers after him, and this literary-sufistic influence was reflected in the likes of Melayê Bateyî, Bekir Begê Erizî, Axaokê Bêdarî, Feqî Reşîdê Hekarî, Şêx Ehmedê Feqîr. Şêx Nûredînê Birîfkanî û Eliyê Findikî are clearly seen. Therefore, a new subtitle should be opened with this movement in the history of Kurdish literary periods, and a place should be reserved for Feqî alongside Yunus Emre and Kaygusuz Abdal, two of the Islamic sufi folk literature poets, in the history of Islamic sufi literature. For these reasons, this research set out to clarify these different aspects of it. The claim of this research is that Feqî's place in the historical periods of Islamic Kurdish literature and his place in sufi Islamic movements is original. Therefore, this study used qualitative research methods, the technique of examining his works and previous studies on his biography, works and literary personality, and the technique of interviewing contemporary sources. In this way, he reached the following findings and conclusions: Feqî is different from the Kurmanji poets before him, with the language style of his works and his literary and sufi perspective, and he broke new ground in the historical periods of Kurmanji literature.

Key Words: History of Literature, Sufi Literature, Folk Literature, Speeches, Feqîyê Teyran.

Destpêk

Berhemên Feqiyê Teyran mîna *Dîwana* Melayê Cizîrî (1640-1568) wekî dîwaneke liserhev di wextê xwe de negihaştîye ber destê lêkolîneran. Tenê bi awayê orijînal helbesteke wî bi terzê mişa'ereyî di *Dîwana* Cizîrî de cih girtîye. Wekî edîbekî edebîyata kurmancî jî, bihîştina navê Feqî jî sedsala 17an vir ve bi Ehmedê Xanî (1651-1709) dest pê dîke. Mela Mamûdê Bazidî (1797-1867) jî hin berhemên wî îstînsax kirine û ji bo paraştinê dane A. Jaba. Hêjayî gotinê ye ku lêkolîna Herekol Ezîzan (1941), ya M. B. Rûdenko (1965), Aramê Çaçan (1974) û Ebdulreqîb Yûsuf (1988) hinek agadarîyên giring li ser Feqî û berhemên wî berhev kirine. Digel ku li cîyên cuda cuda berhemên wî di “keşkûl” û “mecmûe”yên cîya cîya de hebûn jî (bnr. Aykaç, 2023: 40), bi xebata Seîd Dêreşî û Pêzanê Elîxan (1989) cara ewil *Dîwana* Feqiyê Teyran bi tîpên erebî li Bexdayê gihaşt ber destê lêkolîneran. Piştî vê xebatê edî lêkolînerên nû, bi halaneke nû dest pê kir, li ser jî, berhem, kesayetîya edebî û tesewufî ya Feqî lêkolîn çê kir û wan hewl da ku cîyê wî yê nav edebîyata kurmancî û edebîyata tesewufî binirxînin.

Gava mirov bala xwe dide raborîya giştî ya van lêkolînen berê, dibîne ku Feqî, herçiqas şairekî klasîk ê edebîyata kurmancî ye jî, çend taybetmendîyên wî yê xweser ên “edebî” û “tesewufî” hene ku ji şairên din cîyawaz dibe. Digel ku hevdemê Şêx Şemsedînê Qutbê Exlatî (1588-1674), Mela Mehmûd/Hemîdî (ss. 16) û Melayê Cizîrî ye jî, bi terzê hûnandina teşeyên helbestên xwe, bi mijarên berhemên xwe û bi zimanê helbestên xwe xwedî cîyekî cîyawaz e. Feqî herçendî mîna Exlatî û Cizîrî çawa ku edîbekî edebîyata kurmancî ya tesewufî ye jî, ew di nav edebîyata tesewufî de bi taybetmendîya xwe ya “Edebîyata Tesewufî ya Gel” derketîye pêş û ji şêwaza wan a edebîyata tesewufî ya dîwanî cuda bûye. Wî ji çîna serdest a qesrê zêdetir berê bal û dêhna xwe daye ser çîna gel û rasteraşt bi bêjeya “xelqino” xitabî gel kirîye. Bi vî awayê jî edebîyata tesewufî ya gel a tekyayê ya tirkî, dirûvê wî dide edîben mîna Yunus Emre (kd. 1338) û Kaygusuz Abdal (wl. 848/1444). Bi ser vê cîyawazîya xwe jî, wî karîgerî li ser hin edîben edebîyata kurmancî yê pey xwe yê mîna Melayê Bateyî (ss. 18an) û Elîyê Findikî (kd. 1968) kirîye û wan li ser şopa wî berhemên xwe dane.

Feqî bi helbesteke xwe ya sofîgerî di hemû çapên *Dîwana* Melayê Cizîrî de cih digire, bes heta zemanekî dûr û dirêj bi awayekî muteber bîyografîya wî û bi terzekî birêkûpêk *Dîwana* wî derneketibû pêşberî edebîyatperweran, nirxandinên akademîk li ser kesayetîya wî ya edebî û bîr û rayên wî yê entelektuelî kêr hatibûn kirin. Di biwarê qada bîyografîya Feqî, berhem û nêrînen wî de hîn jî karê lêkolîne heye û divê hin pirs bihên kirin. Ji ber ku her lêkolîneke zaniştî civakî di her rewşê de îlhez divê bi *pîrs* û *pîrsgirêkê* dest pê bike (Tayşir, 2020: 35). Li vir, ji ber ku bi zelalî ne diyar e ev xebat jî, şairê edebîyata klasîk a kurmancî Feqî, li gor kategorîyên ilmê edebîyatê bi berhemên xwe di nav kîjan bizava edebî de cîyê xwe digire mereq dîke, vê rewşê wekî problem li qelem dide û hewl dide ku wê çareser bike.

Di pey vê pîrsa eslî de mirov dikare van pîrsên ku têkilîya wan bi vê lêkolîne re hene rêz bike: *i)* “Gelo Feqiyê Teyran şairekî gelêrî ye?”, *ii)* “Gelo ew mîrekî qesrê ye?”, *iii)* “Gelo ew dengbêjekî gel e yan şairekî fermî yê qesrê ye?”, *iv)* “Gelo ew muderrîsekî medreseyî ye ku li kêleka Melayê Cizîrî rûniştîye ders daye feqîyan, yan şagirtekî Melê ye?”, *v)* “Gelo peywendîya hizrên

sofigerî yên Feqî bi rastî jî bi bîr û bawerîyên êzidîtîyê re hene yan na?” *viii*) “Gelo birra ew ronakbîrekî neteweperwer û welatparêz ê gelê kurd e?”, *x*) “Gelo birra jî Feqî di biwarê ilmê kelam û felsefeyê de jî nêrînên xwe derbirîne?” *xi*) “Ji berhemên wî dîyar dibe ku Feqî aşîqekî raşteqîn ê Xwedê ye, baş e gelo îca hezkirina wî ya ji bo cenabê Hz. Pêxember çawa ye?” *xii*) “Gelo di navbera hizrên wî yên tesewufî û gelperwerîya wî de peywendîdarîyeke çawa heye?”

Her lêkolînerekî/ê Feqî, ew li gor bîr û bawerîya xwe pênase kirîye. Hinekan ew şoreşgerê karkeran, hinekan ew filozofê tebîetê, hinekan ew têkoşerê dijberî feodalîzmê, hinekan ew dildarê ilmê kelam, hinekan ew nêzî bawerîya êzdayetîyê û hinekan jî ew wekî dengbêj li qelem daye. Di vê rewşê de bivê nevē problema naskirina wî zehmet dibe û mirov ji wî û bîr û rayên wî dikeve nav fikaran. Lêkolînerek, piştî ku problema xwe ya xebatê dîyar dike, berê xwe dide sehayê û dikeve pey lîteratura qadê (Kuzu, 2013: 34). Tiştê ku di pêvajoya lêkolînê de li pêşberî vê xebatê ye ew e ku hîn jî *bersiva* van hemû pirsan bi zelalî nehatîye dayîn. Li vir berî ku serî li berhemên Feqî bihê xîştin, dê “lîteratura qadê” ya têkildarî Feqî û berhemên wî bihê xwendin û nixandin.

Lêkolînerek gava mijarekê ji bo lêkolîna xwe ya kalîtatîf hilbijêre, çawa ku divê rewşa heyî ya têkildarî lêkolînê dîyar bike, divê “sedem”ê ku wî ev mijar hêjayî lêkolînê dîtîye û hilbijartîye jî dîyar bike (Ekiz, 2017: 207). Piştî vê, bivê nevē mirov li ser vê helwestê digel hindêk şiroveyan, nîqaşeke kurt jî li ser tarîxa pirsê divê bihê bersivandin û problema ku divê bihê çareserkerin bike. Sedemê mezîn ê ku vê lêkolînê berê xwe daye vê mijara tesewufa Feqî ew e ku çawa ku alîyê edebîyata klasîk a tesewufî-îslamî ya kurmançî heye, wisa alîyê wê yê edebîyata dînî-îslamî ya giştî jî heye. Çûnkî Feqî, bi nêrînên xwe yên dînî-tesewufî, heq dike ku di tarîxa tesewufa giştî ya Îslamî de jî cîyê xwe bigire. Ji ber ku heta niha lêkolînên dîrokî yên tesewufî yên gelên cîran cih nedane wî, hêvî bi vê xebatê ew e ku ew jî heqqê Feqî bidinê û di nav klasîkên tesewufê de wî bi cih bikin.

Feqîyê Teyran di raborîya dîrokî ya edebîyata klasîk a kurmançî de digel ku xwedî cîyekî gewre ye û gelek lêkolîn li ser wî hatine kirin, hîn jî li ser cîyê wî yê edebî û fikrî yê di nav qonaxên edebîyata kurdî de nîqaş berdewam dikin. Ev lêkolîn hewl dide ku di pey xwendin û nixandina lîteratura vê qadê de, li ser bingeha berhemên wî cîyê wî yê di qonaxên dîrokî yên edebîyata kurdî de tesbît bike. Lewre “armanc”a eslî bi vê xebatê ew e ku ji van pirsên jêrîn re bersivan bibîne: 1. Gelo ew şairekî xîretkêş ê bawerîya sunnî ye ku li dijberî fikir û fikarên şî‘etîyê têkoşaye? 2. Gelo ew mutesewufekî terîqetê ye ku wî hemû berhemên xwe di rêya sofigerîyê de hûnane? 3. Gelo di navbera hizrên wî yên tesewufî û gelperwerîya wî de peywendîdarîyeke çawa heye?

Feqîyê Teyran bi şarezatîya zimanî, hêza qewî û hunera xwe ya edebî û fikrî, nêzîkî sê qernan e ku li kêleka şairê navdar û mezîn ê edebîyata klasîk a tesewufî ya kurmançî Melayê Cizîrî cih girtîye û hema hema di her platformê de qal û behsa kesayetîya wî ya edebî, dîrokî, gelperwerî û tesewufî dihê kirin. Ji bo ku cîyê wî di qonaxên dîrokî yên edebîyata kurdî de di nav kategorîyeke zelal a edebî û fikrî de cih bigire û mewqîfa wî di qonaxên dîrokî yên edebîyata giştî ya îslamî ya tesewufî de dîyar bibe, helbet lêkolînek pêwişt bû. Di pey çareserkerina problema vê lêkolînê re dibe ku dîroknasên edebîyata kurdî û edebîyata giştî ya îslamî ji vê xebatê sîd wergerin. Lewre qenaet pê ew e ku ev xebateke hêja ye û ji bo xebatên polînkirina qonaxên edebîyata kurdî û îs-

lamî giring e.

Di vê lêkolînê de cih ji bo agadarîyên têkildarî jîyana Feqî hindik hatine dayîn û kesayetîya wî ya îlmê felsefe û kelmê nebûye mijara nîrxandinê. Ew xebatên ku di lîteratura vê qadê li ber çavan hatine girtin û ew agadarîyên ku ew li serê xebitîne, li vir nehatine carbarekirin. Bi taybetî mijar, ziman, teşe û terzê helbestên wî, bîr û raya wî têkildarî îlmê tesewufê û girseya ku **wî** bi berhemên xwe xitabî wan kirîye derketîye pêş.

1. Pêdaçûna li Lîteratura Vî Biwarî

Dîroknûsê navdar Şeref Xan (1543-1604) gava behsa Miksê dike¹ navê Feqî nade; bes tenê gava behsa mîrên wir dike, navê du lawên mîrê Miksê Evdal Beg ku yek Ehmed, ê din Mihemed (Şem'î, 2016: 180) e zikir dike. Ji lêkolînerên ewil ên dîroka edebîyata Kurmançî Bazidî (1797-1867) hin agadarîyên kurt li ser bîyografî û berhemên Feqî dide (Bazidî, 2010: 53). Wî tenê behsa menzûmeya wî ya *Şêxê Sen'anê* kirîye. Tiştê ku heye vî alimî ne têr behsa bîyografîya Feqî kirîye ne behsa berhemên wî kirîye, ne jî li ser jî bîr û raya wî ya edebî û tesewufî nêrîneke xwe derbirîye.

Nûrî nusxeyeke *Dîwana Cizîrî* bi zimanê erebî bi navê *Dîwanu Şeyxu'l-Cizîrî* li Misirê çap kirîye² û dîyar dike ku Feqîyê Teyran helbestên “sofîgerî” hûnane (Cezerî, 1952: 221). Helbet ev agehî ji bo vê xebatê referanseke zexm e; bes êdî hew pê de çûye. Rûdenko (1965) ku menzûmeya *Şêxê Sen'an* a Feqî wergerandîye zimanê rûsî dîyar dike ku Feqî, ruh û “bîr û bawerîya gel” vedibêje (Teyran, 2019: 10). Li gor Rûdenko Feqî, bi ziman û şêwaza xwe ya helbestê di dirûvê “dengbêj”an de ye.

Bozarslan, Feqî wekî hozanên têkoşer ên marksîzmê dihesibîne û wan wekî edîbên edebîyata çîna gel û proletaryayê dinirxîne (Bozarslan, 1979: 68-71). Bozarslan di nav lîteraturê de ew lêkolîner e ku cara ewil di helbestên xwe yê tirkî de xitabî Feqî kirîye û pênc helbestên wî wergerandine zimanê tirkî. Li gor wî Feqî hozanekî têkoşer e ku çîna gel û proletaryayê bi berhemên xwe diparêze. Lewre Feqî, bi helbestên xwe li dijberî zilma mîrên feodal û neheqîya begên mêtînger derketîye, li cem karker û gundîyan cih girtîye û tûşî zindanbûn û sirgûnîyê bûye. Ji ber vê Feqî û Yunus ew hozan in ku wan şoreş û komunîzm nivîsandine. Bozarslan, Feqî ji hêla jîyana derwêşane, zimanê gel û peywendîya wî ya digel folklorê ve, cara ewil bi Yunus Emre re berawird dike. Bi vî awayî dibe ku cara ewil Feqî û Emre ketine nav lîteratura edebîyata berawirdî ya kurdî û tirkî. Li gor wî Feqî, bi helbestên xwe li dijî axa û began derketîye. Lewre ew û Yunus Emre şairên edebîyata çînî ne. Feqî, mîna şairên gel di helbestên xwe de kurdî bi hoştayî bi kar anîye. Lewre berhemên wî li ser zar û zimanê gel gihastine heta roja me.

Zivingî (1987: 914) di xebata xwe ya ku şerha *Dîwana Melayê Cizîrî* de behsa Feqî dike. Li gor wî Feqî di nav edîbên kurd de edîbekî navdar ê edebîyata kurdî ye û bi xezel û helbestên xwe yê “sofîgerî” navdar e. Lêkolînerêkî din di lêkolîna xwe de li dijberî agadarîyên M. Emîn Zekî, Blêc Şêrko û Elaeddîn Secadî derketîye û Feqî ne Makûyî, bes wekî alim û edîbekî Miksî li qelem

1 Ji agadarîyên zêdetir dikarî bnr. Y. Aykaç, Miks: Navendeke Dîrokî, ‘İlmî, Tesewufî û Edebi. *The Journal of Mesopotamian Studies*, 7(1), 2022, 67-102.

2 Ji ber ku çapîroxê vê kitêbê di “Muqeddîme”ya vê çapê de *Mêjûy Edebî Kurdî* ya Elaeddîn Secadî (1907-1984) wekî çavkanî nişan dide, dîyar dibe ku piştî Secadî hatîye çapkirin. Elaeddîn Secadî ev xebata xwe cara ewil di sala 1952yan de li Bexdayê çap kirîye. (Ji bo agadarîyên zêdetir bnr. Abdurrahman Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî*, Nûbihar, İstanbul, 2013, r. 59.)

daye (Yûsuf, 1988: 29). Herweha ew di wê bawerîyê ye ku Feqî bi menzûmeya xwe ya *Kela Dimdimê* nîşan daye ku ew ji dil û can li dijberî şî‘etîya Şahê ecem e û dildarekî qewî yê sunnîtîya Xanê Kurd e. Yûsuf di lêkolîna xwe de li dijberî agadarîyên ku li hêla manewî ya Feqî nahên derketîye, wî ew wekî welîyekî Xwedê li qelem daye û dîyar kirîye ku ew xwedî keramet bûye, lewre wî bi zimanê çivîkan zanibûye. Yûsuf piştî ku bi berfirehî behsa jîyan tehsîl û berhemên Feqî dike û gelek efsane û menqibeyên têkildarî wî neqil dike, çend helbestên wî li pey hev rêz kirine û di xebata xwe de weşandine. Herçiqas wî amaje bi welîtîya wî kiribe jî, qet dor neaniye ser alîyê wî yê sofîgerîyê.

Lêkolînerê dîroka giştî ya kurdan Kemal Burkay (1992) di lêkolîna xwe de dîyar dike ku menzûmeya *Hespê Reş* jî aîdî Feqî ye û digel ku bi lêkolînên nû derketîye holê ku Feqî edîbekî sofî ye û herî zêde bi şîretên xwe yê tesewufî derketîye pêş jî, ew îddîa dike ku Feqî, ji ber ku bi helbestên xwe li dijberî mêtîngerîyê derketîye berhemên wî bi hêsanî di nav gel de berbelav bûne (Burkay, 2011: 205). Burkay di lêkolîna xwe ya *Kürtler ve Kürdistan* de dîyar dike ku Feqî, bi helbest û hikayeyên xwe yê menzûm navdar e. Helbestên wî di nav alim û gelê kurd de bi awayê nivîskî û devkî hatiye xwendin, hinek jî berhemên wî veguherîne edebîyata devkî û bûne berhemên gelêrî. Burkay piştî ku bi kurtî behsa *Dota Gurca (Şêx Sen ‘an)* dike, dîyar dike ku Feqî xwezîyên kesên bindest anîye zimên û bêyî behsa alîyê wî yê sofîgerîyê bike dawî li mijarê diêne.

Resûl bi lêkolîneke akademîk beşdarî lîteratura têkildarî Feqîyê Teyran bûye û wî piştî ku ji çavkanîyên berî xwe agadarî rêz kirine, dîyar dike ku Feqî, bi rêya hikayeya *Şêxê Sen ‘an* ramana xwe ya felsefî û sofîtîya xwe bi awayekî sade û “millî” derbirîye (Resûl, 1998: 91). Resûl di wê qenaetê de ye ku Feqî, termînolojîya tesewufî ya taybet bi îslamê dernebirîye, wî bi wêneyekî kurdewar ramanên xwe yê vîwarê bi teşe kirîye. Herçiqas Xeznedar di gotara xwe de helbestên Feqî bi navê “lîrîk” û “epîk” dabeşî du pişkan dike (Xeznedar, 1998: 48) û bêyî ku tu agadarîyeke din bide, tenê analîza metnê *Hikayeya Zembilfiroş* dike û hew. Xeznedar di bin banê helbestên lîrîk de cih dide yê wî wîdanî, dildarî û civakî; di bin banê helbestên epîk de cih dide çîrokên helbestî. Di pey van tesbîtan de ew êdî derbasî analîza metnê hikayeyê dibe û bêyî ku têkildarî hêla tesewufî-sofîgerî ya Feqî tişteki vebêje dawî li xebata xwe diêne. Gotareke din a têkildarî edebîyata klasîk a kurdî, ya Kılıçarslan e. Wî gava behsa serdema Xalidîyan (1252-1889) kirîye, cih daye Feqîyê Teyran jî. Wî di vî xebata xwe de ji bo Feqî bêtîyên mîna rewşenbîr, hozan, xudanas, wêjegerê payebilind ku gihaştîye encama rasteqînîyê bi kar anîne (Kılıçarslan, 2001: 161).

Li gor qenaeta Sağnıç, Feqî ne şairekî serayê; bes ê gel e. Ew di xebata xwe de piştî ku hinek li lîteratura qadî û manaşî ya têkildarî Feqî digere û hin agadarî neqil dike, qenaeta xwe wisa dîyar dike ku ji ber ku Feqî li her deverê gerîyaye û di rêveçûnê de pir sivik bûye, gel leqebê “Teyran” lê danîye (Sağnıç, 2002: 370-371). Varlı gava nîqaşa ser *Qewlê Sîsebanê* dike, behsa Feqî jî dike, amaje pê dike ku heta îro jî tu kesî nekarîye delîlekî nîşan bide ku wî ev berhem hûnaye (Varlı, 2004: 287). Celîlê Celîl (2004: 15) di xebata xwe ya bi navê *Keşkûla Kurmançî* de hinek agadarî li ser jîyan û berhemên Feqîyê Teyran, daye û peyre cih daye metnê helbestên wî. Li gor wî Feqî, helbestvanekî filozof e û zimanê wî nêzî zimanê gel e.

Lêkolerekî din Feqî wekî şairê tesewuf, felsefe û xezelê li qelem daye (Findî, 2004). Findî bi lêkolîna xwe ya bi navê “Faqih Teyran: Şairu’t-Tasawwuf we’l-Felsefe we’l-Xezel” beşdarî lêkolînên têkildarî Feqî bûye.³ Ew ji xebata bi navê *el-Qissetu’l-Kurdîyye* (1930) ya Blêc Şêrko neqil dike ku şairê klasîk ê kurdî Mehmûd ji bajarê Miksê ye, menzûmeya wî ya bi navê *Şeyx Senan û Hikayeta Bersîs* heye. Findî navê wî yê “Mehmûd” raşt dike û dibêje ku “Mihemed” e. Findî bi literaturê vê qadê re diçe û ji xebatên Aleksander Jaba, *Qewaidu Luxeti’l-Kurdîyyeya* Macerson (1913), Bazidî (1860), Ebdurreqîb Yûsuf, Rûdenko (1965) agahdarîyên têkildarî Feqî dide û berhemên wî dihejmêre. Wisa dîyar e ku li gor wî digel tesewufê, hêla Feqî ya felsefeyî jî heye. Çunkî helbestên Feqî bi giştî yên sofîgerîya medreseyî ya kurdî ne. Feqî, qisseyên îslamî bi şeweya kurdî ya gel nivîsiye. Lewre Feqî, bi helbestên xwe yên resen ên edebî, ne tenê di tarîxa edebîyata kurdî de, herweha ew di tarîxa çanda îslamî û însanî de xwedî cihekî bijarte ye.

Lêkolînerê ku di xebata xwe de agadarîyên zêde cîyawaz dide Izady ye. Li gor wî Feqî şairekî goran û kurmanç e û bi eslê xwe jî Miksê ye. Lewre wî bi her du kurdîyan jî helbest hûnane û hikaye nivîsîne (Izady, 2007: 311). Bivê nevê mirov nikare xwe ji vê pirsê bigire: “Gelo heger goran be, çawa çê dibe ku ji Miksê ye û bi kurmançî berhem nivîsîne?” Lêkolînerên dîroka edebîyata kurmançî yên wekî Sefîzade û Elaeddîn Seccadî hin berhem nisbetî Feqî dikin û memleketê Feqî Makû nîşan didin (Sefîzade, 2008: 478), lêbelê hin lêkolîner jî li dijberî wan derdiketin. Heta dereng jî li ser memleketê Feqî nakokî hebûn. Li gor hinekan ew Makûyî bû; li gor hinan jî ew Miksî bû. Lêbelê qenaet û bawerîya giştî ew e ku ew bi eslê xwe jî Miksê ye.

Hin lêkolîner (Sadinî, 2011: 11-50) wisa îstinbat dikin Feqî ew Mihemed e. Sadinî di lêkolîna xwe de li ser bîyografî û berhemên Feqî kûr bûye, literatûra têkildarî wî û berhemên wî bi berfîrehî nikirandîye. Ew bi tevî ku Feqî û helbesta wî ya *Şêx Sen’an* û digel Ferîduddîn Ettar berawird dike, cîyawazîya xweser a Feqî jî ji Ettar dîyar dike. Li gor Sadinî Feqî, şairê yekem ê edebîyata kurmançî ye ku hêmanên siruştî yên mîna “av” û “çûk”an (bilbil) dide axaftin. Cîyê baldarîyê ye Sadinî dor anîye ser naveroka giştî ya berhemên Mîr Mihemed û amaje bi şîretên wî yên dînî, pesna Xwedê û pêxember, mijara tesewuf û wehdetu’l-wucûdê dike. Mirov ji xwendin û nixandina literatûrê tê digihîje, lêkolînerê ku bi taybetî balê kêşaye ser alîyê tesewufî û kelimî yê Feqî, Sadinî ye. Ew di wê bawerîyê de ye ku Feqî şairekî evîn û evîndarîyê ye û evîna mecazî û ya heqîqî li cem Feqî yek e û ew di nav hev de ne. Ev tesbîtên Sadinî ji bo vê xebatê helbet hêja û balkêş in; bes wî zêde dirêjî nedaye vê mijarê.

Li gor Orhan (2013) Feqîyê Teyran dev ji mîrtîya xwe bernedaye, seba rêya heq, rêya miletê xwe û rêya Heq teala çûye tehsîla ilmê kirîye, li gelek cihan geraye û heta çûwe Cizîrê, cem Şêx Ehmedê Cizîrî.⁴ Dîroknasê edebîyata kurdî Adak di xebata xwe de digihîje wê qenaetê ku Feqî di sala 1640î de wefat kirîye û gava ew cîyê Feqî di tarîxa edebîyata kurdî de tesbît dike, Feqî wekî helbestvanê yekem ku di bareyê hinek hikaye û serpêhatîyên jîyana tesewufî de menzûme hûnane dihesibîne (Adak, 2013: 214). Ew ji bo mînakên têkildarî tesewufê jî berhema Feqî ya *Bersîsê*

3 Bnr. AL-MADA Daily Newspaper... جريدة المدى (almadapaper.net) (24.07.2022) Gelek minetdar im ku mamosteyê min Nizar Gulî, li ser daxwaza me ya 24ê meha 7an a sala 2022yan, ev navnîşan bo vê xebatê hinart. Wekî din bnr. Reşîd Findî, “Fakih Tayran: Şairu’t-Tasawwuf we’l-Felsefe we’l-Xezel”, *el-Mede’s-Sekafi-Sekafe Kürdîyye*, Bexdad, hj. 604, Sibat, 2006. (Neqilkar: Ahmet Özel, “Klasik Kürt Şiirinin Önde Gelen Temsilcilerinden Fakî-yı Teyran”, *TDV İslam Ansiklopedisi*, Ankara, 2020, c. ek-1, r. 436-439.)

4 Bnr. Bahçesaray Miks, TRT6, 18 Eyl. 2013, <https://www.youtube.com/watch?v=IcPCd6l8aF0> (tarîxa pêgihaştinê: 23.01.2022)

Abid û *Şêxê Sen'an* destnîşan dike. Ev tesbîta lêkolîner a têkildarî dîroka edebîyata kurdî herçiqas şayanê baldariyê ye jî, wî dirêjahî nedaye temaya tesewufî ya sofîgerîya Feqî û yekser derbasî şirovekirina berhemên wî bûye. Di şiroveya *Bersîsê Abid* de lêkolîner dîyar dike ku abid û zahidê Îsraîlî Bersîs, ji ber eşqa mecazî, ji eşqa heqîqî dûr ketiye.

Lêkolînerê ku bi xebata xwe reng û rûyekî cîyawaz li kesayetîya edebî û ramanî ya Feqî zêde dike, digel nêrînên wî yên dînî-tesewufî, balê dikêşe ser nêrînên wî yên têkildarî ilmê kelim û felsefeyê jî, Yıldırım e. Wî di cildê yekem de piştî hin agadarîyên têkildarî jîyan, berhem û nêrînên Feqî û taybetmendiyên wî yên edebî, hunerî, tesewufî û felsefî û berawirdkirina wan bi Yunus Emre (1238-1338) re, metnê *Dîwanê* yê kurmançî û wergera wê ya bi tirkî digel “analîza wan a têgehî” amade kirîye (Teyran, 2014: 28).

Lêkolînerê ku tezeke maşterê li ser Feqî amade kirîye, Koyuncu ye. Ew di xebata xwe de gava ji têgehên tesewufî dora lêhûrbûnê diêne ser “cewr û cefa”yê, cih dide rewşa Feqî û dîyar dike ku ji ber cefayê ew serxweş e û goştê canê wî pijîyaye; lêbelê derdên wî mecazî ne (Koyuncu, 2014: 50). Vê xebatê kir ku ji bo vê lêkolînê motîvasyoneke baş çê bibe. Tenik lêkolîneke dîrokî-şiroveyî ya gelek berfireh li ser tesewuf û terîqetên cografyaya kurdan bi rêbaza akademîk amade kirîye û çap kirîye. Ew piştî ku bi kurtî behsa bîyografîya Feqî û terzê helbestên wî dike, dorê diêne ser aliyê wî tesewufî û bi berfirehî li ser bîr û rayên wî yên sofîgerîyê kûr dibe (Tenik, 2015: 219-221). Tenik bi ser helbestên wî yên mîna *Dilo Rabe*, *Ey Av û Av*, *Şêx Sen'an*, *Ellah Çi Zatekî Ehsen e*, *Îro Ji Dest Husna Hebib*, *Îro Giya Me Tê*, *Feqe û Bilbil*, *Feqe û Mela* û *Bersîsê Abid* re bîr û raya wî sofîgerîyê dinirxîne. Bi vê mutaleeya xwe lêkolîner di raborîya lîteratura qadî ya têkildarî Feqî de cîyê herî hûr, kûr û dirêj digire. Ev lêkolîn dê di vê biwarê de ji vê xebata Tenikî sûd wergire.

Ali K., bi cîyawazîya lêkolîna xwe balê dikêşe. Wî menzûmeyê *Bersîsê Abid* a Feqî ku eslê wê hikayeyeke gel e, bi berhema Goethe *Faust* ku ew jî wisa ye re “berawird” kirîye. Wî lehengê hikayeyê Bersîs daye ber lehengê hikayeyê Faust û ji hêla kesayetîyê ve ew nikirandine. Bi ser vê berawirdîyê ve wî berê bala xwe daye ser statuya aqilê ramangirên rojavayî û mutefekkirên rojhilatî bê ka çawa rojavayî aqil; rojhilatî neqlê derdixin pêş û hewl daye ku peyamên van edîbên pêşewayê hizirê bi delîlan nîşan bide. Li gor wî her du edîban jî xwestîye ku rê nîşanî mirovan bidin bê ka çawa dikarin li dijberî metirsî û xetereyên jîyanê kesayetîya xwe biparêzin. Çawa ku Faust bi aqilê xwe zanyar e, lê ji hêla dil û derûnîya xwe ya rûhî ve qels e, Bersîs ji hêla dil û derûnîya xwe ya gîyanî ve baş e, lê ji hêla vîn û feraseta xwe ya aqilî ve kêmqewet e. Faust bi fam û feraseta xwe ya hizirî bi ser Mephisto ve diçe lê Bersîs ji ber dilovanîya xwe ya dûrî aqilan dide pey “murşîd”ekî qelp (Îblîs) jîyana wî bi mirina dualî bi dawî dibe. Ev helwesta Feqî, helbet bi tevî ku sofîgerekî rasteqîn e jî nîşaneya wê yekê ye ku mirov abidekî çiqas qewî û sadîq be jî, helbet divê aqil û mentiqê ji bîr neke. Ev jî aliyekî din ê sofîgerîya Feqî ye (K., 2015: 22-25). Mîna vê berawirdîyê ev terzê bi menzûmeyên hikayeyî vegotina bîr û rayên hizirî, di raborîya ramangêrî ya şariştanîya îslamê de jî heye. Wekî mînak mirov dikare berhema *Hey bin Yeqzan* a Ebû Bekir Muhammed b. Ebdulmelîk Îbn Tufeyl (1110-1185) bide. Ev filozof jî hevalê Îbn Ruşd bûye (Mesûd, 1999: 129).

Orkin li ser alîyê tesewufî yê Feqî xebitîye. Wî piştî ku li ser jîyan, nav, mexles, xwendin, kesayetîya wî ya edebî û berhemên wî kûr bûye, dor daye hêmanên tesewufî yên di berhemên Feqî de. Ew bi berfirehî li ser rêbaza Feqî ya helbesthûnana tesewufî kûr bûye û wî hêmanên tesewufî ku di berhemên wî de hene tesbît kirine. Digel ku lêkolîna wî û ev xebata ber destê me nêzî hev in jî, wî di asta masterê de balê kêşaye ser alîyên tesewufî yên Feqî; bes ev xebat bi awayekî hîn cîyawaz nêzî Feqî dibe û giranî dide ser nêrînên wî (Orkin, 2015).

Îlhan bi gotareke analîzî ya li ser menzûmeya *Şêxê Sen'an* derketîye pêş. Ew balê dikêşe ser evîna beşerî ya lehengê rûdanê ku çawa veguherîye evîna Îlahî. Îlhan hemû çarînên menzûmeyê ji *Dîwanên* Feqî yên ku li Tirkîyeyê hatine çapkirin sûd wergirtîye û li ser wan şiroveyên xwe kirine (Îlhan, 2016). Yılmaz li ser hikayeya Zembîlfiroş lêkolîneke “teza masterê” bi kurmancî kirîye. Wî di vê lêkolîna xwe de metnên *Zembîlfiroşa* Feqîyê Teyran, Mela Huseynê Bateyî (1417-1495) û Muradxanê Bazidî (1743-1784) “berawird” kirine û li ser motîfên wan ên folklorîk kûr bûye (Yılmaz İ. , 2016).

Kaya li ser yek berhemeke Feqî xebitîye. Wî piştî ku bi giştî behsa jîyan, mexles, kesayetîya wî ya edebî, cîyê wî yê di edebiyata kurdî de û berhemên wî kirîye, têgehên dînî, tesewufî û civakî ku di menzûmeya *Şêx Sen'an* de derbas bûne rave kirine. Li gor wî Feqî ku şairekî navdar ê “edebiyata kurdî ya tesewufî” ye, tesewuf bi “hal” û “eşq”ê rave kirîye. Lêbelê wî cîyê Feqî yê di edebiyata “tesewufî ya gel” de tesbît nekirîye.

Doskî bi xebata xwe ya *Li Baxê Feqîyê Teyran* balê kêşaye ser dirûvdarî û cîyawazîya ku di navbera Feqîyê Teyran û Melayê Cizîrî de heye (Doskî, 2017: 57). Li gor wî Mela, wekî alimek û muderrisekî serdema xwe, di medreseya mîrî de bi awayekî fermî navdar bûye; bes Feqî bi rehetî û azadîya xwe di nav xelkê de deng daye. Ji ber vê herçiqas ew her du jî di heman mijarê de parêzvanê eşqa îlahî bûne jî, Mela bi helbesta xwe xitabî derdora qesrê kirîye; lêbelê Feqî xitabî gelê ewam kirîye. Ev tesbîta Doskî ji bo qenaeta vê xebatê bûye wekî referanseke bingeîn. Li gor qenaeta Ertekin bi tevî Melayê Cizîrî, Feqîyê Teyran jî hem bi menzûmeya xwe ya *Şêxê Sen'anîyan* hem jî bi helbestên xwe yên din, bi terzê zimanê gel tesewuf hûnaye (Ertekin, 2018: 9).

Îlî, nêrîna “wucûd”ê ku meseleyeke sereke ye di teswwufa Îslamê de bala Feqî kêşaye wî jî nêrînên xwe di vê biwarê de derbirîne (Îlî, 2018). Îlî, ev nêrînên wî ji *Dîwana* Feqî derxistîne û li ber lêkolîneran raxistîne. Li gor wî Feqî, nêrînên xwe yên têkildarî “wucûd”ê, di bin banê hizira “wehdeta wucûdê” de dîyar kirine.

Serfîraz (2018) di xebata xwe de Feqî wekî şairê yekem edebiyata bajarî ya kurdî dihesibîne û yê ku wê hikayeya *Zembîlfiroş* ku bi sedsalan di nav gel de bi awayê devkî hatiye vegotin û neqil-kirin, cara ewil bi awayê nivîskî vegotîye Feqî ye. Lewre ew bi vî awayê xwe dibe pêşewayê “edebiyata kurdî ya bajarvanîyê”. Wî bi taybetî li ser poetîkaya Feqî tesbîtên balkêş kirine. Li gor wî Feqî digel ku ji malbata mîrên Miksê ye jî, neketîye nav hevrikîya seltenetê, bes berê xwe daye ser rêya muhebbet û derwêşîyê û ketîye nav ehlê eşq û îrfanê (Sarfîraz, 2020: 377). Li gor melayê Miksê ne ku Feqî ji mîrektîyên Miksê ye; bes mîrektîyên Miksê ji malbata Feqî ne.⁵ Feqî alimekî zaf mezin û filozof bûye û hemû millet bawer dike ku wî bi zimanê teyran û heywanên din zani-

5 Bnr. Rêwî (Yolcu), Beşa 287an (Van-Bahçesaray), (25.09.2018), <https://www.youtube.com/watch?v=X51DBms3RQY> (20.01.2022).

bûye.

Li gor qenaeta Celîlê Celîl (2019: 10-15) Feqî bi ziman û şêwaza xwe ya helbestê di dirûvê “dengbêj”an de ye û Feqî helbestvanekî filozof e “husna wî ya hebîb” siruştaya welatê Kurdistan e. Dîsa li gor wî “dîndarên êzîdî” jî gelek sêxiştên Feqî ji bo şîretdayînê bi kar diênin. Celîlê Celîl menzûmeya *Şêxê Sen‘a* ya bi awayê taybet amade kirîye û jê re *Pêşgotinek* nivîsîye. Li gor wî Feqî helbestvanekî filozof û lîrik e helbestên wî li ser “flora” û “fauna”ya welatê Kurdistan e. Lewre gelê Kurd li ser wî gelek efsane pev xistine. Celîl balê dikêşe ser “sûfîzm”a wî û diyar dike ku husna wî ya hebîb, “tebîeta welatê Kurdistan” e. Ew wisa pê bawer e ku menzûmeya *Şêxê Sen‘an* sertaca sêwirandinê Feqî ye û herçiqas cara ewil Ferîduddîn Ettar ev menzûme hûnabe jî, Feqî bi awayekî xweserî tehera xwe ya hunerî-edebî ew ji nû ve nivîsîye. Çunkî hikayeya *Şêxê Sen‘a*, çawa ku di nava dîndarên êzîdîyan de berbelav e, di nav Kurdên muslim ên sofî de jî cîyekî berfirê digire. Tiştê ku heye Celîlê Celîlê di vê xebata xwe de tenê *Şêxê Sen‘a* daye ber xwe û derbasî berhemên din ên Feqî nebûye.

Nêrwayî di xebata xwe de li ser Feqî kûr dibe û bi qenaeta wî navê Feqî hem “Mîr Mihê” ye hem “Mîr Mihemed” e (Nêrwayî, 2019: 149). Lêkolerekî din ku di gotara xwe ya bi navê *Şêwaza Berhemên Feqîyê Teyran* de cih daye hêla tesewufî ya berhemên Feqî Cihanî ye. Wî bi mînakên diyar kirîye ku Feqî helbestên xwe xistine xizmeta şîret û pendên tesewufî (Cihanî, 2019: 116). Özel (2020) bîyografiya Feqî nivîsîye û amaje bi gera wî ya mîna derwêşan û navê wî ye din “Feqîyê Gerok” kirîye. Li gor qenaeta Özel, temenê Feqî û Mela nêzî hev e û dibe ku her du dost û hevalê hev bin. Di dirêjahîya lêkolîna xwe de Özel dora nîrxandinê diene ser aliyê tesewufî ye Feqî û digihîje wê baweriyê ew di biwarê mijar û mezmûnên tesewufî de biserketî ye (Özel, 2020: 436-439).

Karaca helbesta Feqî ya *Ey Av û Av* digel qesîdeya Fuzûlî *Su* “berawird” kirîye û hêla edebî û tesewufî ya Feqî li ser du milan nikirandîye: Berhemên wî yên menzûm *Şêxê Sen‘anî*, *Bersîsê Abid*, *Zembîlfiroş* û *Kela Dimdimê* beşek; helbestên wî yên din ên mîna qesîde, musemmet, xezel û qit‘e beşa din e. Feqî ji aliyekî ve di berhemên xwe yên dînî-tesewufî de cih daye mijarên mîna wehdeta wucûdê, felsefe, kelam, fiqih, hedîs, şîretên dînî, evîna Xwedê û pêxemberê wî; ji aliyê din ve di warê edebîyata nedînî de helbestên têkildarî mirov, siruşt, hiciw û rûdanên dîrokê hûnane (Karaca, 2020: 14). Karadeniz (2021) di pêşekîya xebateke xwe de bi awayekî balkêş Feqî bi terz û xweserîya şairî dişibihîne Yunus Emre (1238-1338). Ew balê dikêşe ser temayên mîna evîn, dostanî, wefa, rastî, giringîya alim û îlim, peywendîya navbera heqîqet û mecazê, vîn, hezkirina ji siruştê, axaftina bi heywanan re, hesret, mirin û jîyana axretê (Teyran, 2021: 5) ku Feqî di berhemên xwe de ew girtine nav berhemên xwe. Herweha ew diyar dike ku Feqî xwe wekî “Şairê Şîretan” bi nav dike peyre balê dikêşe ser wê yekê ku hin helbestên Feqî bi awayê muzîka tesewufî û muzîka modern hatine bestekirin û gelek derdoran ew ezimandine.

Mahabad bi gotareke xwe beşdarî nîqaşa têkildarî kesayetîya edebî û nêrîna hizrî ya civakî ya Feqî dibe û ew wî wekî edîbê yekem ê edebîyata gel a tesewufî derdixê pêş (Mahabad, 2021). Li gor wî xelkê ew carinan wekî welî, carinan jî wekî derwêş hesabandîye. Bi qenaeta wî tu delîlekî zaniştî tune ku Feqî telebeyê Melayê Cizîrî be. Feqî, xwe dûrî edebîyata Dîwanê ku çîna gel

piçûk dibîne ragirtîye û wî cîhana ruhî û heştî/hissî ya gundiyan bêerd ji helbestên xwe re kirîye tema. Lewre ew li dijî nêrîna Celadet a ku dibêje Feqî ji malbata mîr e derdikeve û dîyar dike ku Feqî tu întihareke çînî nekirîye û dev ji çîna xwe ya raser bernedaye û xwe danexistîye çîna bindest. Navê mîrê Miksê ku Şeref Xan dibêje Muhemmed bûye, ne delil e ku ew Feqî be. Çunkî ji berhemên wî yên mîna “Ez dengbêj im heta vira / Heta hebin dengê mîra / Ez ê binivîsim ser kaxeta / Ne diçim dêra ne mizgefta” dîyar dibe ku ji çîna gel e. Li gor Mahabad Feqî, di serdema xwe de li pêşberî pirsgerêkên sîyasî xemsar nemaye, li dijberî mîrên kurdan, tercîha xwe ya çînî û sîyasî daye ser gelê hejar û kedkar ku di bin pêkûtiya mîran de pelixîne. Li gor bawerîya Mahabadî Feqî mirovekî wisa yê bawermendîyê ye ku bi wê jîyana xwe ya gundane, digel nefspîçûkiyeke tesewufî bûye waqîfê zanîne û hewl daye ku aramîya/huzûra hinavî (dîl û derûnî) bibîne. Lewre çawa ku ew di nav hêtûna evîne de şewitîye, wî hewl daye ku bi bawerîya xwe ya bi Xwedê, li dijberî derdan jî xwe ragire.

Li gor tesbîta Gürbüz (2021) Feqî, di helbest û destanên xwe de hêmanên tesewufî bi kar anîne û ketîye bin karîgerîya cografyaya xwe. Gürbüz piştî ku bi kurtî behsa her yek berhemeke Feqî dike, dorê diene ser nêrîna wî ya têkildarî wehdeta wucûdê. Ew wisa bawer dike ku li gor Feqî, kengê mirov gava bi hevrebûna mirîd-şêx di wucûda Xwedê de xwe fanî bike, dikare bigihîje wehdeta wucûdê (Gürbüz, 2021: 44-63). Lewre Feqî menzûmeya *Şêxê Sen'an* ji bo ku giringîya disîplîna tesewufî ya bi rêbertîya şêx re nîşan bide hûnaye.

Di pêvajoya amadekirina vê lêkolînê de Gevêrî (2023: 6) meqaleyek bi navê “Çend Feqîyê Teyran Hene” di kovara *Nûbiharê* hejmar 162yan de belav kir. Ew hêla meqamê edebîyata devkî/gelêrî û hêla edebîyata nivîskî ya Feqî dikole. Bi tesbîta wî Feqî divê di nav her du kategorîyan de jî bihê qebûlkin. Çinku çawa ku Ehmedê Xanî cihê wî di edebîyata kurdî ya klasîk de destnîşan dike, gel jî bi serpêhatîyên têkildarî Feqî, cihê wî di çand û edebîyata gel a devkî de destnîşan dike.

2. Metoda Xebatê

Di vê lêkolînê de ji hîpotezan zêdetir tesbîtkirina, danasîn, analîz û şirovekirina mijara tesewufî ya di helbestên Feqî de dê bibe mijar. Ji unîverseya qadê ku çavkanîyên nivîskî û referansên devkî ne dê dane bihên berhevkerin encama wan bihê analîzkirin. Di vê lêkolînê de mijar alîyê sofîgerî yê Feqîyê Teyran e. Daneyên ku dê li ser vî alîyê wî ji qadê bihên berhevkerin, dê bi awayê bêlayan bihên şayesandin. Lewre dê li gor “modela lêgerînê” li ser nêrînên Feqî yên têkildarî teswwufê xebat bihê bipêşxistin.

Ji bo vê lêkolînê “unîverse”, qada çavkanîyên nivîskî û “populasyon” jî qada çavkanîyên devkî yên ehlê medreseyê ku têkildarî mijarê ne. Çawa ku dihê zanîn terîma “unîverse” dihê wateya her tiştî û her kesî.⁶ Kewn (tr. evren, ing. universe), ew cih e ku lêkoler, hîpotezên tê de test dike. Gava lêkolerek anketên amade bike, helbet jê re cih û kes lazim in, herweha ji bo rêbaza hevdîtinê jî mirov jê re lazim in. Nexwe lêkolîneke zanîstî bêyî kewn û şênîyan çê nabe. Lewre li gor pêdivîya lêkolînê çavkanîyên nivîskî û devkî dê bibin unîverse. Ehlê medreseyê wekî “populasyon” a vê xebatê hat destnîşankirin; bes di vê biwarê de agadarîyên têkildarî Feqî, bi qasî yên li ser alimên

6 Bnr. <https://www.vocabulary.com> (26.12.2121)

din tunebû. Tiştê ku heye giranîya vê xebatê li ser unîverseya cografyaya di nav Tirkîyeyê de ye, hêla xebatên ku li Îran, Iraq û Sûrî hatine kirin, ji ber bêderfetîyan, çend xebat jê ne tê de, bi giştî li derve hatine hiştin. Digel van, ew xebatên ku li ser tarîxa terîqetên Îslamî hatine kirin jî, wekî çavkanîyên vê xebatê dê bihên bikaranîn.

Numûneyên ku ji wekî ji unîverseya qadê dê bihên berhevkerin, bi giştî ew agadarîyên lêkolînên berê ne ku li ser jîyan, berhem û kesayetîya edebî ya Feqî hatine nivîsîn û belavkerin. Bi tevî van, berhemên wî yên ku heta niha hatine çapkirin bi xwe jî, wekî numûne dê bihên bikaranîn. Tiştê ku heye pê re gihastina bi hemû unîverseya têkildar re ji hêla dem û derfetan ve zehmet e. Ji lew re analîzên ku dihê bihên kirin, li gor derfetan “tixûb” kirî ye. Bi rêbaza xwendin, wergirtina ji çavkanîyên nivîskî û hevdişîna digel kesên peywendîdar dê dane ji unîverseya lêkolînê bihên berhevkerin, li ser numûneyên wan çavdêrî bihê kirin. Piştî keşfa agadarîyan dê bi “metoda şayesandinê” şiroveya wan bihê kirin.

3. Feqîyê Teyran û Cureyên Edebî yê Edebîyata Tesewufî ya Gel

Şairên sofî bi awayê menzûm û mensûr (pexşan) gelek berhem nivîsîne. Hinek ji şairên sofî, di heman berhemê de şîr û nesir digel hev bi awayê yekkirî nivîsîne. Heta hinekan wezna arûz û wezna kîteyê di heman berhemê de bi kar anîye. Bi domana demê re di nav edebîyata tesewufî ya gel a bi navê din “edebîyata tekyayê” de cureyên edebî yê mîna *îlahî*, *nefes*, *nutuq*, *dewriye*, *terîqetname*, *şefaetname*, *desûr* û *duwazdeh* çê bûne. Digel van çend cureyên din ên mîna *hikmet*, *gulbank* û *menaqibname* jî hene (Kemikli, 2013: 245).

3.1. Îlahî

Îlahî ew cure helbestên tesewufî yê gel in ku şair, rasteraşt li ser hezkirina Xwedê dihûne. Helbestên bi teşeyê îlahî, ji cureyên edebîyata dîwanê dişibin helbestên “tewhîd”î. Cîyawazîya îlahîyan ji tewhîdan ew e ku di tekyaya û dergayan de, di wextê ayînan de bi newayî dihên gotin. Wezna îlahîyan bi giştî 7, 8, 14 û 16 kîteyî ye. Di dîroka edebîyata tesewufî ya gelê tirk de herî zêde Yunus Emre (1238-1338) bi vî terzî helbest hûnane. Îlahî li gor cureyên terîqetan navên cîyawaz werdigire: **Ayîn** (li tekyayên mewlewîyan), **tapux** (li tekyayên gulşenîyan), **durak** (li tekyayên xelwetîyan), **nefes** (li tekyayên elewî-bektaşîyan) û **deme** (di rêûresmên cemî yê elewîyan de).⁷

3.2. Hikmet

Hikmet ew cure helbestên tesewufî yê gel in ku şair bi wan mijarên dîni li gor pêjn û têgihastina xwe dihûne. Ji hêla teşeyî ve dirûvê hikmetan ji cureyê edebîyata gel dide “koşuk”an. Herçiqas hinek bi wezna erûzê hatîbin nivîsîn jî, bi pîranî bi wezna kîteyî $4+3=7$, $4+4+4=12$ û bi teşeyê yekeya çarînan dihê nivîsîn. Di helbestên hikmetî de şair esasên Îslamê, edebên tesewufê, halê qiyametê, hezkirina pêxember û menqîbeyên li ser derwêşan vedibêje (Bilgin, 2011: 381-384). Ahmed Yesevî bi helbestên xwe yê *hikmetî* dihê naskirin. Jixwe ev cure bi berhema wî *Dîwan-i Hikmet* dihê naskirin. Wî di vê berhema xwe de prensîbên Îslam û tesewufê nivîsîne. Wezna kîteyî ya hikmetên wî $7+7=14$ e (Kemikli, 2013: 245).

3.3. Nutuq

⁷ Ji agadarîyên zêdetir bnr. <https://www.turkedebiyati.org/ilahi.html> (02.01.2022)

Cureyekî helbesta tesewufî ya gel “nutuq” e. Helbestên nutuqî yê tesewufê dîdaktîk in, bi wezna kîteyê dihên nivîsîn, yekeyên wan ên nezmî “çarîn” in. Helbestên nutuqî ji hêla “teşe”yê xwe ve di dirûvê “koşma”yan de ne û bi şemaya qafiyeyî ya awayê aaaa/ ccca/ddda ye.⁸ Şemaya qafiyeyî ya nutuq û koşmayan dibe ku bi awayê xaxa yaxud abab jî deşt pê bike (Albayrak, 2002: 226-227). Hejmara kîteyên rêzîkan 11 ye, hinek ji wan bi awayê 7 kîteyî yaxud 8 kîteyî jî dihên hûnandin.⁹ Di edebîyata tesewufî ya osmanî navdartirînê vî cureyî Kaygusuz Abdal (848/1444) e.¹⁰

3.3.1. Nutuq û Feqîyê Teyran

Gava mirov li “mijar”, “teşe”, “wezin” û “şema”ya vê menzûmeya Feqî ya *Şêxê Sen’an* dinihêre, dibîne ku raşteraşt di formata “nutuqên tesewufî” de ye. Bi zelalî dîyar e ku haya Feqî ji zanînen teorîk ên edebîyata tesewufî ya dunyayê” heye. Wî menzûmeya *Bersîsê Abid, Zembîlfi-roş, Ey Av û Av, Îro ji Deşt Husna Hebîb, Bi Çar Kerîman, Îro Girya Me Tê, Dilber,¹¹ Dilo Rabe, Îlahî Lew Dikim Zarî, Ez Çi Bêjim, Ay Dilê Min Ay Dilo, Qewî Îro Zeîfhal im, Çiya Anî li Deştê Kir*; bi teşeyê cureyê nutuqê hûnaye. Bi vî awayî hejmara berhemên wî yê bi terzê “nutuq”ê dibe 12.

Formata ruxsarî ya helbestên nutuqî yê Feqî bi cureyên nutuqê re ji hêla qafiyeya şema û kîteya rêzîkan li hev dike:

Ey av û av ey av û av	a
Ma tu bi ‘îşq û mehebbetê	b
Mewc û pêlan tavêy belav	a
Bê sekne û bê rahetê	b
Bê rahet û bê sekne yî	c
Yan ‘aşîqê baxê xwe yî	c
Yan şubhetê qelbê xwe yî	c
Jî ‘îşqa kê natebitê	b

Bê rahet û bê sekne yî = 8 kîte
Yan ‘aşîqê baxê xwe yî = 8 kîte

Çawa ku ji çavkanîyên edebî hat famkirin edîben sofî, helbestên nutuqî bi armanca pend û şî-retên ji bo kesên ku nû dikevin nav keşûhewayaya terîqetê dihûnin. Ev taybetmendî di nutuqên Feqî de jî xuya dibe:

Zîkrê civata bêmelek

8 Ji agadariyên zêdetir dikarî bnr. <https://www.bilgenc.com/nutuk-nedir/> (01.01.2022)

9 Bnr. <https://www.edebiyatogretmeni.org/nutuk/> (15.01.2022)

10 Kaygusuz Abdal, wekî şairekî mutesewuf ên damezirînerê edebîyata elewî-bektaşî dihê qebûlkin. Di desdala XIV-an de hatîye dunyayê. Navê wî yê raştîn Xeybî ye û kurê Begê sancaxa Alaiye (Alanya) ye. Wî di zemanê xwe de ilmên devra xwe xwendîye. Ew palewanek bûye, di tîr û kevan, siwarî û şerê bi şûrî de kes bi ser wî de tunebûye. Nêçîrvanekî bi nav û deng bûye. Rojekê li pey karxezalekê ye dihê Elmaliyê û dibîne ku ew ket dergayê Abdal Mûsa. Ji derwêşan dipirse bê ka “We karxezal dît gelo?” Ew dibêjin “Na.” Abdal Mûsa jê dipirse: “Ma tu tîra kevana xwe nas dikî?” Xeybî dibêje “Erê.” Abdal Mûsa gava milê xwe radike, ew dibîne ku va ye tîra wî li binê çengê wî ketîye. Li ser vê dibe mirîdê wî. Şêxê wî mexlesa Kaygusuz Abdal dide wî, piştî çil salî ji îcaze ku ji pîrê xwe werdigire, digel çil evdali berê xwe dide hecê. Ku digihîje Misirê, derdikeve huzûra Sultan, peyre li qeraxê çemê Nîlê dergayekî bi navê Qesru’l-Eyn dide avakirin û ber bi Mekkeyê ve dikeve rê. Di vegera hecê de rêya xwe bi ser Şam, Heleb, Kîlîs, Enteb, Bexdad, Hille, Kûfe, Nefes û Kerbaleyê dixê. Ji Bexdadê berê xwe dide ser Medain, Semerra, Mûsul, Nuseybinê û vedigere dergayê Abdal Mûsa. Kaygusuz Abdal şoggerê Yunus Emre ye û wî helbestên ji cureyê “sathîye” nivîsîne. (Nihat Azamat, “Kaygusuz Abdal”, *TDV İslam Ansiklopedisi*, Ankara, 2002, c. 25, r. 74-76.)

11 Cîyawaziya vê helbestê ji yê din ew e ku di dirûvê teşeyê nezmî yê “murebbe’ê, murebbe’a mutekerrir de ye.

Sed car bikin ‘amî gelek
Şubhê ne‘amê bînemek
Dûr e ji zewq û lezzetê (*Şêxê Sen‘an*, çarîn 20)

Zikrê wacib e ‘amî bikin
Nêzîkî şeyx sofî bikin
Murşîd murîdî hî bikin
Xaric bikin ji zulmetê (*Şêxê Sen‘an*, çarîn 21)

Dilo rabe dilo rabe
Veke çavan ku êvar e
Nezan û bes di xew da be
Bi newmê ra mebe yar e (*Dilo Rabe*, çarîn 1)

Xizmeta sultan û mîran
Sin‘eta dana û zîran
Hûn mekin bê şêx û pîran
Guh bidin vê **şîretê** (*Bersîsê ‘Abid*, çarîn 2)

Ev **pende** xass e şîret e
Şertê xulaman xizmet e
Ba xu nebînin zehmet e
Heqê însaf û mirwetê (*Bersîsê ‘Abid*, çarîn 3)

4. Feqîyê Teyran û Edebîyata Tesewufî ya Gel

Herçiqas bêjeya *feqî*, ji koka bêjeya erebî fiqihê dihê û Ehmedê Xanî ji bo navê wî ve bêjeyê bi teşeyê feqîh bi kar diêne jî, wisa xuyaye, dibe ku di ilmê fiqihê de alim be û ji ber wê wî ev mexles ji xwe re eyîşandibe. Çunkî piranîya ehlê tesewufê, alimê ilmê fiqihê Îslamê ne.

Berhemên Feqî ji hêla teşeyê helbestan, ji hêla wezna wan, ji hêla ziman û mijara wan ve bi giştî di bin banê taybetmendiyên “edebîyata tesewufî ya gel” de ne. Lewre mirov dikare wî wekî şairekî “edebîyata tesewufî ya gel” bihesibîne. Çunkî ji van alîyan ve cîyawazîya wî ji Melayê Cizîrî (kd. 1640), Şêx Şemsedînê Exlatî (1588-1674) û Ehmedê Xanî (1651-1709) heye. Ev her sê şairên klasîk ên edebîyata kurmancî, ji hêla taybetmendiyên edebî yê berhemên xwe ve dikevin bin banê “edebîyata tesewufî ya klasîk a dîwanê”.

Lêkolînerên polînkirina edebîyatê, pênaseya edebîyata tesewufî ya gel, di çavkanîyan (Bilgin, 2011: 381-384) de bi awayekî zelal derbirîye. Edebîyata tesewufî/tekyayî, mîna edebîyata dîwanê û edebîyata gel, şaxekî sereke ye edebîyatê ye. Ji ber ku berhemên vî şaxî, zanînen dîni jî di bin banê xwe de dihewinin, jê re “edebîyata dîni-tesewufî” jî hatîye gotin; bes ji ber ku mijara wê ya sereke tesewuf e, jê re “edebîyata tesewufê”, ji ber ku ev cure edebîyat li dormedora tekîyayan çê

bûye, jê re “edebîyata tekyayê” û ji ber ku şêwaza wê nêzî zimanê gel e, jê re “edebîyata tesewufî ya gel” jî dihê gotin. Çavkanîya eslî ya edebîyata tekyayê, tesewufa îslamê ye û ji hêla taybetmendiyên xwe yê cîyawaz ve di cîyekî navbera “edebîyata gel” û “edebîyata dîwanê” de digire. Hinekane ev “edebîyata tesewufî ya gel” li şaxê “edebîyata gel a tesewufî” û şaxê “edebîyata klasîk a tesewufî” polîn kirîye. Li gor bawerîya lêkolînerên mîna Agah Sırrı Levend, Vasfî Mahir Kocaturk û Abdurrahman Güzel, şairên mutesewuf ên tirk hem ketine bin karîgerîya edebîyata gel hem jî ketine bin tesîra edebîyata dîwanê, lewre divê ku di dîroka edebîyata tirkî de wekî disîplîneke serbixwe bihê lêkolîn. Di vê edebîyata tesewufê de mijarek “wucûd” e. Li gor şairên edebîyata tesewufî ya gel asasê wucûdê, Xwedê ye ku bi tabîrên mîna “zatê mutleq, wucûda mutleq û husna mutleq” dihê binavkirin. Ew mewcûdên din hemû sûretên demdemî û hin sî ne ku ji teyîsîna wî derkertine. Mirovê ku bi seyr û sulûkê ji hêla manewî ve bi pêş bikeve, divê hewl bide ku sîrrê îlahî yê di hebûna xwe de keşif bike, nefsa xwe perwerde bike û berî mirina xwe bimire û bigihîje Xwedê. Gava mirovek emelên baş bike, bi îbadet û zikir meşxûl bibe, êdî tecellîyên îlahî dest pê dikin di dilê wî/wê de derdikevin. Ev nêrîn, hizir, bîr û ray û hal, temayên edebîyata tesewufî ya tekyayê ne. Mîjarên tesewufî bi vî awayî wekî cereyaneke hizrî gelek zêde ketine nav helbestên îslamî. Ev rêbaz serê pêşî di edebîyata erebî de hatîye dîtin, ji wir derbasî edebîyata farisî bûye, peyre jî ya tirkî. Li gor van edîban di nav evîna mecazî û heqîqî de îrtibatên qewî hene. Li Anatolyayê şairên mîna Nesîmî, Qadî Burhaneddîn û Şeyhî, di vê çexerê de ji bo edebîyata dîwanê zemîn amade krine. Ahmed Yesevî bi “hikmet”ên xwe mînakên ewil ên edebîyata tekyayê dane û bi zimanê gel îslamê ji gel re vegotîye. Ji sedsala XI-an (mîldaî) pê ve zumreyên tesewufî yê mîna ebdalên rûmî, qelenderî, heyderî hatine Anatolyayê û di serdema selçûqîyan de wan çandêke tesewufî çê kirîye. Wê hingê terîqetên mîna mewlewîyye, rifaîyye û bektaşî, ji bo huzûr û aramîya gel xebitîne. Sofîyên mîna Hecî Bektaşê Velî (kd. 669/1271) û Yunus Emre (1238-1338) di vê serdemê de gihaştine û di helbestên xwe de bi zimanê gel xîtabî gel kirine. Di vê pêvajoyê de bi wesîleya şairên sofî, edebîyeteke dewlemend a tesewufî çê bûye. Şairên mîna “Ahmed Fakih”,¹² Hoca Dehhanî (kd. 804/1401), Şeyyad Hamza (ss. 13) û Nesîmî (1369-1417) jî mensûbê vê edebîyatê ne.

Nîşaneyêke herî berbiçav a ku Feqî şairê “edebîyata tesewufî ya gel” e ew e ku di helbestên xwe de bêjeya baneşanî ya “xelqino” bi kar diêne:

Ew mîr kerîm e satir e

Xweş hakim e di barê xwe da

Xelqino! Ne dîr e hazir e (Allah Çi Zatekî Ehsen e, qit'e 6)

Xelqino! Ji kê ra ev qese

Da heq bi 'urfê nas bikî

12 Ahmed Fakih (kd. 1221 miladî), bi navê xwe dişibe Feqiyê Teyran, lewre li vir hinek agadarî ji bo wî hatine dayîn. Ahmed Fakih, li gor çavkanîyên terîqeta mewlewî û terîqeta bektaşîyan li Konyayê jiyaye. Bi vî navê du nav hene: Xwace Ahmed Fakih û Sultan Xwace Fakih. Ev kes bi unwanên mîna “Qutbu’ş-Şerq we’l-Xerb, Qutbu’l-Budela, Seyyîdu’l-Meczûbîn û Qudwetu’l-Ebdal” hatîye nasîn û memleketê wî jî wekî Azerbeycan û Xorasan hatîye diyarkirin. Wefata wî 618/1221 yaxud 650/1252 ye. Li gor lêkolîna Abdûlbaki Gölpınarlı di sedsala XIII-an de li di serdema Selçûqîyên Anatolyayê de bi navê Ahmed Fakih du kesên çiya çiya hebûne. Navê Ahmed Fakihê duyem jî Arap Ahmed Fakih e. Di *Dîwana* Yunus Emre de jî navê wî weha derbas bûye: Ahmed Fakih Kutbu’-d-Dîn Sultan Seyyid Necmu’-d-Dîn / Mevlana Celaluddin il kutb-i cihan kanî? (Osman Fikri Sertkaya, “Ahmed Fakih” *TDV İslam Ansiklopedisi*, İstanbul, 1989, c. 2., r. 65-67.)

Er dê bizanî ev bes e (Ella Çi Zatekî Ehsen e, qit'e 6)

Dinê **xelqino** bi kê maye
 Belê qenc e û mezra ye
 Ji xêran ra Xwedê daye
 Xebatkar bin ku ev car e (Dilo Rabe, qit'e 43)

5. Paşxaneya Feqî ya Edebîyata Gel

Bivê nevē ji bo lêkolîneran cîyê mereqê ye bê ka gelo ev çexera xwe ya edebî ya ku bi zimanê gel xîtabî gel dike ji kû bi dest xîstîye. Çawa ku Bozarslan (1979: 71) jî amaje pê dike, Feqî bi tamamî hozanên gel teqlîd kirîye. Feqî, şairên gel ji xwe re mînak wergirtîye û helbestên xwe bi kurdîya gel hûnane. Ji ber vê gel li berhemên wî xwedî derketîye û li ser zar û zimanê xwe neqlî roja me kirine. Bi vî awayê xwe ew dişibihe Elî Herîrî. Çunkî Herîrî jî hem berhemên edebîyata gel a kurmancî derbasî nivîsê kirine, hem jî helbestên xwe bi zimanê gel hûnane.

Feqî, bi menqibeyên xwe zêdetir di nav gel de hatîye naskirin. Wî bi hin hikayetên millî, tesewufî û edebî yên gel derbasî nivîsê kirine, di dilê gel de cih girtîye û wekî edîb û alimekî nêzî gel nav û deng daye. Ji ber vê wî çawa ku di nav xelkê de cih girtîye, di nav ehlê medrese û tesewufê de cih negirtîye (Ç3, Ç4).

6. Dirûvdarîya Feqî digel Yunus Emre

Helbet divê li vir ew bas jî bihê kirin ku bê ka Feqî helbestên xwe yên nutuqî, ji kîjan edebîyatê wergirtîye. Di edebîyata tewwufî ya tirkî de helbestên nutuqî gelek berbelav in. Gelo Feqî ji wan mifa wergirtîye? Gelo haya Feqî ji şairên edebîyata tesewufî ya tirkî heye? Bi taybetî wî helbestên Yunus Emre dîtine, xwendine? Nîşaneyeke vê yekê li ser Melayê Cizîrî heye ku li gor rîwayeta Anter ku ji Şefîq Ervasî wergirtîye, Ş. Ervasî jî ji mamê xwe Ebdulhekîm ku di wextê xwe de serîmamê Mizgefta Sultanahmed bûye wergirtîye û ragihandîye ku piştî ku Fatîh Sultan Mehmed Stenbolê fetih dike, seydayê wî Akşemseddîn Xoce dike biçe hecê. Fatîh ji seydayê xwe dipirse: “Baba, tu dê ji min re çî xelat biênî?” Xoce gotîye: “Lawê min, ez dê yê ku layiqî te ye biênim.” Di rêwîtiya hecê de Akşemseddîn rêya xwe bi zanîngeha Ezherê dixê. Li wir ciwanekî bi navê Muhemmed ku leqebê wî Goranî ye dibîne. Ew wî îqna dike ku were bibe xoceyê padîşah û ji wir werdigire û wî diêne Stenbolê. Gava pevra diçin qesrê, padîşah dipirse: “Ka ye dîyarîya min Baba?” Akşemseddîn dibêje: “Lawê min, min ji te re xelateke wisa anî ku dê heta ebedê şana te bala bike.” Mela Goranî, peyre Medreseya Fatîh ava dike. Îcar Mela Goranî û Mela Ehmedê Cizîrî hevaldersên hev ên feqîtiyê bûne û di nav wan de peywendîdarîyê dewam kirîye. Melayê Cizîrî, medhîyeya xwe ya ku dibêje “Ey şehinşahê muezzem, Heq nîgehdarê te bit / Suretê îna fetehna hafiz û yarê te bit” digel nameyekê ji Mela Goranî re dişêne. Goranî, gava ku vê nameya Cizîrî ji Fatîh re tercume dike û dixwîne, Fatîh gelek kêfxweş dibe û wî vedixwêne Stenbolê. Çî heye ku Cizîrî îcabetî vê vexwendinê nake, digel spasîyên xwe, mazûrîya xwe jê re dişêne. Ew jî 17.000 akçe jê re dişêne. Cizîrî jî pê, mizgeft û medreseya xwe ava dike (Anter, 2011: 67). Li gor ku Feqî bi Cizîrî re di nav peywendîdarîyê de ye, dibe ku haya wî ji edebîyat û edîbên edebîyata

tesewufî ya tirkî hebe.

7. Hezkirina Gel

Ji ber vê helwesta wî ya gelperwerî, gel navê wî di çanda xwe de jî paraştîye. Wekî mînak di çanda kurmancan de ji ber ku meha adarê 31 roj e, nîqaş derketîye bê ka ev roja dawî li ser meha adarê ye yan li ser nîsanê ye. Ka bi çi awayî hebe, ji bo ku dawî li vê nîqaşê bihê, wan navê Roja Muhemmed Feqîyê Teyran li vê rojê danîye û dawî li nîqaşê anîye. Ji ber ku navê wî di dilê xelkê de gelek zêde şîrîn bûye, kesî îtiraz nekirîye û pîrsgirêk çareser bûye. Bi ser de jî xelkê ev roja ha, wekî roşanek û cejneke neteweyî pîroz kirîye (Ûskan, 2017: 61).

Di nav gel de gelek efsane û menqîbeyên li ser Feqî bi awayê devkî nifş bi nifş hatine neqilkin. Hozanên gel helbestên Feqî bi newayî di nav gel de stranê û gel ew jidev kirine. Aramê Tigran yek ji wan e ku wî helbesta Feqî ya *Ay Dilberê* derbasî stranê kirîye û bi newayî straye.

8. Feqî û Mezhebê Şî‘eyan

Di destpêka meqaleyê de hatibû diyarkirin dê di pêvajoya lêkolînê de hewl bihê dayîn bê ka gelo peywendîya Feqî digel mezhebê şî‘yan çi ye. Bersiva vê pirsê di menzûmeya wî ya destanî ya *Şerê Kela Dimdimê* de hat dîtin. Feqî di serê berhemê de vî mezhebî heqîr dibîne û di berdewamiya wê de carinan davêjê:

Helal kiriye Tahayê
Mezhebê qe kêr nayê
Em dimirin nayêne rayê
Axret xoştir e ji dunyayê

Qeda li dunyayê bikevî
Dê rûreş bin li nik Nebî
Qebûl nekin vî mezhebî
Hemîyan go belave bî (Sadîni, r. 383).

Feqî gava behsa şerî dike, diyar dike ku eskerên Lepzêrîn, li hember Şahê ‘ecem, di rêya Xwedê, Pêxember û xelîfeyên wî de şer dikin û yên ku di vê herbê de bimire, şehîd e:

Li ser xatira ‘Umer e
Di rêya Pêxember e
Xwe bikin ker bi ker e
Rûspî bin da di mehşer e

Rûspîyê di mehşer kin
Herine wan ker bi ker kin
Bi gotina Pêxember kin
Şehîd bin dinê terk kin (Sadîni, r. 384).

Cihê baldarîyê ye ku Feqî, bi tevî ku di gele çarînên deştanê de şervanên Xanê kurdan wekî şehîd bi nav dike, şervanên Şahê ‘ecem jî wekî kafir li qelem dide:

Bohtan hemî bi mîr ve
Demek sekinîn bi şîr ve
Kefen di bin çengî ve
Kafir hatin ji pîr ve

Kafir di dil qewî ne
Dema ku wan dibîne
Heybet li wan ketîne
Qurcî nizanin kî ne (Sadînî, 393).

9. Feqî û Karakterê Giştî yê Berhemên Wî

Herçendî ji temamiya berhemên Feqî, bi piranî sofîgerîya wî dixuyê; bes menzûmeya wî ya *Şerê Kela Dimdimê*, aliyê wî yê welatparêzîyê jî nîşan dide. Çunkî ji temamiya berhemê dîyar dibe ku wî eskerên Xanê kurd wekî muminên mêrxas; şervanên Şahê ‘ecem jî wekî zalim û neheq dîtine. Wekî din, mirov dibîne ku ew bi van berhemên xwe yê zimansade dixwaze ku gelê wî jî bi exlaqê tesewufê terbiye bibe û ji newalên kûr û tarî yê nezaniyê xelas bibe. Li ser vê bingehê mirov dikare aliyê wî yê gelperwerî jî qebûl bike. Nexwe ew ne tenê sofîyekî tekyayê ye; bes ew hem dildarê gelê xwe ye hem jî dildarê zimanê kurdî ye. Jixwe gava mirov lîteratura ku li dor jî-yan û berhemên wî çê bûye dixwîne, vê taybetmendîyê bi hêsanî dibîne.

10. Analîza Daneyan

Feqîyê Teyran digel ku di nav avhewayaya ehlê medreseyê de tehsîla ilim dîtîye û haya wî ji edebîyata qesrê ya dîwanê heye jî, li ser vê şopa edebîyatê neçûye û berê xwe daye edebîyata gel a tesewufî, bi zimanê gel, ji bo gel, ne bi teşeyên nezmî yê edebîyata dîwanê; bes bi teşeyên nezmî yê edebîyata gel (nutuq û hikmet) berhemên xwe hûnane. Herçiqas wî ji ilmên medreseyê zêdetir bal û dêhna xwe dabe ser ilmê tesewufê jî, dîsa îrşada xwe ya sofîgerîyê jî bo gel kirîye. Wî di berhemên xwe de serê pêşî xîtabî nefsa xwe kirîye, peyre jî xîtabî gel kirîye û heta jê hatiye ji asta têgihaştina gel derbas nebûye. Çawa ku Melayê Cizîrî li pêşberî edîbên navdar ên gelên cîran bi hunera xwe dîpesine, Feqî bi her awayê xwe nefisbiçûkiya xwe derdibire. Lewre gel ew ji nav xwe hesibandîye, muslimên sunnî mertebeya welîtîyê dayêye, gelên êzîdî mertebeya pîrîtîyê dayêye, sosyalîstan ew wekî piştevanê proleterayê li qelem daye. Bi domana demê re xelkê gelek menqîbe û efsane li ser navê wî pevxistine û nîş bi nîş neqil kirine. Gel li berhemên wî xwedî derketîye û ji her fikir û bawerîyê mirovan xwe di hunera wî de dîtîye û ji ber vê jî wan xwe li berhemên wî girtîye. Çawa ku wî cîyê xwe di dilê muslimên sunnî de çê kirîye, bûye şîrîne dilê êzîdî û gelparêzên modern jî. Bi ser vê de hozanên gel jî, helbestên wî newadar kirine û strane. Heta ji menqîbeyên wî dîyar dibe ku navbera wî û ehlê kîtabê jî xweş bûye.

Feqî ew şairê edebîyata kurmançî ye ku cara ewil deştana kurdan *Keleha Dimdimê* û hikayeya

gel a *Zembilfiroş* a edebîyata gel a devkî bi awayê nivîskî hûnaye. Lewre ew çawa dibe deştan-nûsê yekem ê edebîyata gel a kurmancî, wisa jî ew hikayenûsê yekem ê hikayeyên gel ên edebîyata kurdî ye jî. Mirov dikare di warê hikayeyên tesewufî yên menzûm de wî wekî şairê yekem ê edebîyata kurdî li qelem bixe. Çunkî wî *Şêxê Senanê* û *Abidê Bersîs* jî hûnaye. Dibe ku ji ber vê yekê be ku Xanî di deştêka *Mem û Zînê* de bi çend beytên balkêş amaje bi Feqî dîke (Xanî, 2010: 38):

Min dê ‘alema kalamê mewzûn
‘Alî bikira li banê gerdûn

Bi î nawe rûha Melê Cizîrî
Pê hey bikira ‘Elî Herîrî

Keyfek we bida Feqîyê Teyran
Hetta ebed bimayî heyran

Feqîyê Teyran di mişareya xwe ya digel Melayê Cizîrî de jî bi awayekî karîger helbeşta xwe bi kurmancîya gel nivîsîye û wisa xuyaye kirîye ku Cizîrî jî di vê mişareyê de bi zimanê gel helbeşta xwe bihûne. Vî terzê wî yê edebî ku bi zimanê gel û bi terzên edebîyata gel helbeşt nivîsîne, “bandor” li ser Bekir Begê Erizî, Axaokê Bêdarî, Feqî Reşîdê Hekarî, Şêx Ehmedê Feqîr, Şêx Nûredînê Birîfkanî (kd. 1851) û Seyîd Elîyê Findikî kirîye.

Encam

Li ser bingeha rikin û zanînen mîna dîroka edebîyata îslamî û teybetmendîyên têkildarî tesewufê, ji lîteratur, jînameya seyyahî ya Feqî û helweşta wî ya sofîgerîyê dîyar bû ku ew ji edîbên ewil ên edebîyata tesewufî ya gel a kurdî ye û ew di nav raborîya dîrokî ya terîqên cografyaya xwe de nêzî çexera neqşî-xelwetîyê ye. Ji ber ku di eslê xwe de tesewuf bi zaniştên sosyal-beşerî yên mîna felsefe, sosyolojî, psîkolojî û pedogojîyê re; ji îlmên dînî-îslamî bi kalam û fîqhê re peywendîdar e, Feqî jî bi berhemên xwe, şopa zanîna xwe ya bi van îlman nîşan daye. Ji naveroka berhemên wî, ji helweşta wî ya edebî ya li pêşberî rûdanên civakî yên serdema wî ev bi hêsanî dîyar dibe.

Feqî li pêşberî rûdana trajîk a civakî ya serdema xwe *Şerê Keleha Dimdimê* bi awayekî bêhelweşt nemaye û digel metnê edebî, wî çawa ku nêrinên xwe yên têkildarî vê rûdanê bi awayê meyla xwe ya alîgir a Xanê Lepzêrîn derbirîne, pesnê mezhebê xwe yê sunnî daye, rexneyên tund û tûj li artêşa Şahê ‘ecem û mezhebê wî ku şî‘e ye girtîye. Ji ber vê helweşta wî, hinek ji gelperweran ew wekî welatparêzekî kevnar ê kurdan bi nav kirîye. Ji ber vê yekê mirov dikare wî wekî şairê yekem, herweha nivîskar û hûnerê/danerê deştana [millî] kurmancî bi nav bike.

Wekî mutesewuf, entelektuel û ramangirekî îslamî-kurdî yê sedsala 16an ku ji binemaleke xanedan a mîran tê, Feqî digel ku hevdem û hevalê wî yê sofîyê edîb ê edebîyata klasîk a tesewufî ya dîwana qesrê ya mîrê Botan Melayê Cizîrî û Şêx Şemsedînê Exlatî (1588-1674) ye jî, wî ji çîna serdeşt zêdetir berê bal, dêhn û haya xwe daye ser gelê awam û hemû helbeşt û menzûmeyên xwe

bi zimanê gel ê rojane, bi terzê hozan û edîbên edebîyata gel nivîsîne. Feqî li şûna çîna qesrê, rasteraşt xitabî gel kirîye û hewl daye ku hezkirina Xwedê bixe dilê gelê xwe û gelê xwe bikêşe nav ser û sinc û jîyana tesewufî û exlaqê terîqetê. Mirov dikare berhema wî ya bi navê *Şêxê Senanê û Abidê Bersîs* ku wî ew li ser bingeha terbîyeya tesewufê hûnane, ji bo vê angaştê wekî mînak nîşan bide. Lewra wî ji bo vê armanca xwe, piranîya helbestên xwe ji cureyên nezmî yên edebîyata tesewufî, bi terzê nutuqê hûnane.

Menzûmeyên Feqî yên mîna *Bersîsê Abid, Zembîlfiroş, Ey Av û Av, Îro ji Deşt Husna Hebîb, Bi Çar Kerîman, Îro Girya Me Tê, Dilber Dilo Rabe, Îlahî Lew Dikim Zarî, Ez Çi Bêjim, Ay Dilê Min Ay Dilo, Qewî Îro Zeîfhal im, Çîya Anî li Deştê Kir*, ji hêla hêmanên mîna mijar, teşe, wezin û şemayê ve rasteraşt di formata “nutuqên tesewufî” de ne. Lewra dîyar dibe ku haya Feqî ji zanînen teorîk ên edebîyata tesewufî ya edebîyatên cîran ên mîna ereb, fars û tirk heye ku wî karîye van menzûmeyên xwe bi teşeyê nutuqê bihûne.

Heta Ehmedê Xanî (1651-1709) jî navê Feqî di berhema xwe ya *Mem û Zînê* de li kêleka ‘Elîyê Herîrî û Melayê Cizîrî zikir kirîye. Ji vî alîyî ve mimkun e ku mirov cihê wî di dîroka edebîyata kurdî de wisa dîyar bike ku ew şairê ewil e ku di biwarê edebîyata klasîk a tesewufî de berhemên menzûm ên tesewufî hûnane.

Feqî, hikayeya gel *Zembîlfiroş* jî bi awayekî menzûm hûnaye û li ser binaxeya edebîyata gel, bi zimanê gel û bi awayê hozanên gel ên mîna dengbêjan hûnaye û derbasî edebîyata nivîskî ya klasîk kirîye. Bi vî awayê wî, Elîyê Herîrî ne tê de, mirov dikare wî wekî hikayenûsê ewil ê edebîyata gel bihesibîne. Nexwe du alîyên wî yên bingeîn hene: Şairîya edebîyata tesewufî û edîbtîya edebîyata gelêrî. Lêbelê dîsa jî bi qasî ku ji tevahîya berhemên wî yên edebî û tesewufî dîyar dibe, wî berhemên gelêrî yên kurdî jî kirine xizmeta exlaq û terbîyeya tesewufê.

Ji ber ku Feqî di her fîrsetê de hezkirina xwe ya ji gelê xwe dîyar kirîye, wî helbestên xwe bi zimanê gel bi berhemên, di berhmên xwe bang li gelê xwe kirîye û bi giştî wî berê bal û dêhna xwe daye ser gelê xwe, gelê wî jî gelek zêde jê hez kirîye, di çanda xwe de jî cih daye Feqî û xelkê menqîbeyên li ser wî, bi sedsalan nîş bi nîş neqil kirine. Heta ji xwendina lîteraturê û sehaya xebatê dîyar bû ku gelê kurd, 31ê Adarê wekî roja Feqîyê Teyran bi nav kirîye û wan ev roj, wekî rojê roşanê pîroz kirîye. Hozanên gel, çawa ku zemanê berê hin helbestên Feqî newadar kirine û di civat û caxîyan de ştrane, hunermendên serdema me jî hin helbestên wî derbasî ştranê kirine û dîstrên.

Çawa ku gelê sunnî yê kurdan ji Feqî hez kirîye, gelê êzîdî jî ji Feqî hez kirîye û wan jî ew nêzî xwe dîtîye. Heta ji ber vê eleqedarî û hezkirina zêde ya gel, wisa bûye ku hinek lêkolîner ketine gumanan û wan xwe daye lêkolînan bê ka gelo ev Feqîyê Teyran yek e, yan zêdetir çend kes in? Ev taybetmendîyên ha yên cîyawaz, heta niha, li gor daneyên ber destê me, hema hema di tu edîbekî din ê edebîyata kurdî de nahetine dîtin û dîroknasên dîroka edebîyata kurdî ew li qelem nedane.

Taybetmendîya Feqî ya edîbtîya gel, hiştîye ku gelek lêkolînerên ku ji derdora bîrûrayên çepgir û hizrînerên raştgiran jî li ser wî û berhemên wî bixebitin û nêrînen xwe yên curbicur li serê derbibirin. Hinek ji lêkolînerên çepgir Feqî wekî şairê proleterayê li qelem daye; hinekan jî ew

wekî şairekî wisa destnîşan kirîye ku ew bûye dengê çîna bindest. Xebatên li ser bîyografiya wî, berhemên wî û kesayetîya wî ya edebî, zêdetirî sedsalekê ye berdewam dikan. Neqilkirina menqibeyên li ser wî, çawa ku hîn jî di nav gel de nifş bi nifş berdewam dike, bi awayê nivîskî jî berdewam dike. Ev alîyê Feqî jî dike ku dîrokasên dîroka edebîyata kurdî, cihekî taybet di raborîya dîroka edebîyata kurdî de ji bo wî terxan bikin. Bi qasî ku ji “lîteratura qadî ya li ser Feqîyê Teyran” dihê famkirin, ji her alî û derdorên ku bîr û bawerîyên wan cuda cuda ne, gelek zêde lêkolîneran ew kirîye mijara lêkolîna xwe. Ev ku heye, nîşaneyê wê yekê ye ku hema hema her alî û derdorên, berê bala xwe daye ser wî û berhemên û wî li ser wî xebitîne. Vê dawîyê mirov dibîne ku ew bûye mijara meqaleyên akademîk û tezên lîsansa bilind ên zanîngehan jî. Çi bi zimanê tirkî be, çî jî bi zimanê kurdî derdora 4 tezan li ser wî û alîyên wî yên cuda cuda hatine amadekirin û belavkirin.

Çawa ku Xanî di mesnewîya xwe ya *Mem û Zînê* de navê Feqî li kêleka ‘Elîyê Herîrî û Melayê Cizîrî bi bîr anîye, dîyar e ku haya wî jî jê hebûye û wî jî berhemên Feqî xwendine. Nexwe mirov dikare bigihîje wê qenaetê ku Xanî jî li ber ronahîya helwesta wî ya gelperwer rabûye, hikayeya gel *Mem û Zîn* bi terzê edebîyata klasîk a Îslamî, ji nû ve hûnaye û derbasî nivîsê kirîye. Ji berhemên edebîyata kurmançî ya piştî Feqîyê Teyran mirov derdixê ku wî karîgerî li şairên mutesewuf ên edebîyata kurmançî yên mîna Melayê Bateyî û Seyîd Elîyê Findîkî kirîye.

Gava mirov bi giştî li yekûna berhemên wî dinihêre, bi hêsanî dibîne ku piranîya berhemên wî pedogojîk in. Bi vî terzê xwe dirûvê wî daye edîben sofî yên edebîyata tesewufî ya gel a Osmanî Yunus Emre û Kaygusuz Abdal. Nexwe ihtîmal heye ku haya Feqî ji edebîyatên cîran, ji ya gelê tirkî jî hebûye. Feqî bi vî terzê û vî terhî, çexereke cîyawaz di raborîya dîrokî ya edebîyata kurdî ya klasîk de vekirîye. Çinku ji raborîya dîrokî ya edebîyata kurmançî, cîyawazîya Feqî û berhemên dîyar dibe ku berî wî şairekî kurmançî ku di biwarê edebîyata tesewufî de, berhemên xwe bi terzê edebîyata gel û bi zimanê gel nivîsibe, nabîne. Bi vî awayê xwe ew wekî nûnerê yekem ê edebîyata tesewufî ya gel a kurdî cihê xwe di dîroka edebîyata kurdî de digire.

ÇAVKANÎ

- Badıllı, A. (1990). *Mufassal Tarihçe-i Hayat. c. II*, (neqilqêr: Ali Tenik). İstanbul: Timaş.
- Adak, A. (2013). *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasik*. İstanbul: Nûbihar.
- Albayrak, N. (2002). Koşma. *İslam Ansiklopedisi, c. 26*. (s. 226-227). İstanbul: TDV.
- Aykaç, Y. (2022). Miks: Navendeke Dîrokî, ‘İlmî, Tesewufî û Edebî. *The Journal of Mesopotamian Studies*, 7(1), 67-102.
- Aykaç, Y. (2023). *Mecme’ a Xezelyatêd Şu’erayêd Kurmancan*. Wan: Peywend.
- Anter, M. (2011). *Hatıralarım, (2. Baskı)*. İstanbul: Aram.
- Bazidî, M. M. (2010). *Cami’eya Risaleyan û Hikayetan bi Zimanê Kurmançî*, (Amadekar: Ziya Avcî). İstanbul: Lîs.
- Bilgin, A. A. (2011). Tekke Edebiyatı. *İslam Ansiklopedisi, c. 40*. İstanbul: TDV.
- Bilgin, A. A. (2011). Tekke Edebiyatı. *İslam Ansiklopedisi, c. 40* (s. 381-384). İstanbul: TDV.

- Bozarslan, G. (1979). *Partî Gûn Işığı Nardalı*. İstanbul: Aydınlık.
- Burkay, K. (2011). *Neolitik Çağdan 1. Dünya Şavaşı'na Kürtler ve Kürdistan*. İstanbul: Deng.
- Celîl, C. (2004). *Keşkûla Kurmancî*. Wîen: Doğa Basın Yayın.
- Cihanî, P. (2019). Şêwaza Berhemên Feqîyê Teyran. *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Dergisi*, sal 5, c. 5, j. 10.
- Dîwanu eş-Şeyxu'l-Cezerî, (1952). *Dîwanu eş-Şeyxu'l-Cezerî*, (Tabî': Muhemmed Nûrî). Mîsir.
- Doskî, T. Î. (2017). *Li Baxê Feqîyê Teyran*. Dihok: Pertûkxaneyê Nûrsîn.
- Ekiz, D. (2017). *Bilimsel Araştırma Yöntemleri*. Ankara: Anı.
- Ertekin, N. (2018). *Şeyda'nn Divan'ında Tasavvuf. (Teza neçapkirî ya maşterê)*. Bingöl: Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü, Kürt Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı.
- Findî, R. (2004). Fakih Tayran: Şairu't-Tasavvuf we'l-Felsefe we'l-Xezel. *el-Mede's-Sekafi-Sekafe Kürdiyye, Bexdad*, hj. 604, Sibat.
- Gürbüz, S. A. (2021). Feqîyê Teyran'ın Divanı'nda Yer Alan Şêxê Sen'an Hikayesinin Vahdet-i Vücut Açısından Değerlendirilmesi. *Van İlahiyat Dergisi*, 9/14.
- Îlhan, Z. (2016). Micahidê Fetihandina Dil: Şêx Sen'an -Dahûrîn û Rexne-. *Nûbihar*, hj. 137.
- İli, E. (2018). *Feqîyê Teyran'ın Varlık Görüşü. (Teza Neçapkirî ya Maşterê)*. Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Felsefe Anabilim Dalı.
- Izady, M. R. (2007). *Kürtler: Bir El Kitabı* (İngilizceden Çeviren: Cemal Atila). İstanbul: Doz.
- K., Ali (2015). Bersîsê Abid û Faust Îradeya Mirov, Îblîs û Mephisto. *Nûbihar*, hej. 130.
- Karaca, F. (2020). Berawirdkirinek li Ser Qesîdeya Avê ya Fuzûlî û Helbesta Ey Av û Avê ya Feqîyê Teyran ji Alîyê Hêmana Avê ve. *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi* c. 6, hj. 11.
- Kaya, B. (2017.). *Feqîyê Teyran'ın Şêxê Sen'an Şiirinin İçerik Açısından İncelenmesi. (Teza neçapkirî ya maşterê)*. Diyarbakır: Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı.
- Kemikli, B. (2013). Tasavvuf ve Edebiyat. H. Aksoy, *Türk İslam Edebiyatı* (s. 245). Ankara: Anadolu Üniversitesi.
- Kılıçarslan, Î. (2001). Edebîyata Kurdî ya Klasîk. *Nûdem*, hej. 39-40.
- Koyuncu, H. (2014). *Di Hin Dîwanên Kurdî de Bandora Tesewwufê*. Bingöl: Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Kürt Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı.
- Kuzu, A. (2013). Araştırmaların Planması. A. Ş. (edt.), *Bilimsel Araştırma Yöntemleri*. Eskişehir: Anadolu Üniversitesi.
- Mesûd Serfîraz. (2020). *Feqîyê Teyran: Hayatı, Poetikası ve Eserleri. Kürt Tarihi ve Siyasetinden Portreler*, (Derleyenler: Yalçın Çakmak & Tuncay Şur). İstanbul: İletişim.
- Mesûd, M. (1999). *Udebau Felasifeti*. Beyrût: Darulilmi Lilmelayîn.
- Nêrwayî, E. T. (2019). *Emûrxanê Lepzêrîn û Kela Dimdim: Di Navbera Mêjû û Efsaneyê da*.

İstanbul: Avesta.

Orkin, Ş. (2015). *Di Berhemên Feqiyê Teyran de Hêmanên Tesewufî*. (Teza neçapkirî ya masterê). Muş: Muş Alpaslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı.

Özel, A. (2020). *Klasik Kürt Şiirinin Önde Gelen Temsilcilerinden Fakî-yı Teyran*. Ankara: TDV İslam Ansiklopedisi.

Resûl, Î. M. (1998). Feqiyê Teyran: Jîyan û Berhemên Wî. (Werger: Mîkaîl Canpolat). *War*; hj. 1.

Sadinî, M. X. (2011). *Feqiyê Teyran: Jîyan Berhem û Helbestên Wî*. İstanbul: Nûbihar.

Sağrıç, F. H. (2002). *Dîroka Wêjeya Kurdî*. İstanbul: Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê.

Sefîzade, S. B. (2008). *Mêjuwî Wêjey Kurdî*. (Bergî Duwem). Hewlêr: Dezgay Çap û Belaw-kirdinewey Aras.

Şem'î. (2016). *Terceme-i Tevarîh-i Şeref Han*. (Hazırlayan: Adnan Oktay). İstanbul: Nûbihar.

Tayşir, E. A. (2020). *Bu Tez Nasıl Bitecek?*. İstanbul: İletişim.

Tenik, A. (2015). *Tarihsel Süreçte Kürt Coğrafyasında Tasavvuf ve Tarikatlar*. İstanbul: Nûbihar.

Teyran, F. (2008). *Hemû Berhemên Wî*. (Bi Pêşgotineke Rênas Jîyan). Stenbol: Belkî.

Teyran, F. (2014). *Divan & Dîwan*. (Çeviri ve Analiz: Kadri Yıldırım). Ankara: Kültür ve Turizm Bakanlığı.

Teyran, F. (2019). *Şêxê Sen'anîyan, Nezîre: Xemgîn*. (Amadekar: Celîlê Celîl). İstanbul: Weşanên Wardozê.

Teyran, F. (2021). *Dîwan: Metnê Kurdî & Türkçe Çevirisi*. (Çeviri ve Notlandırma/Werger û Not: Ali Karadeniz). İstanbul: Nûbihar.

Ûskan, S. (2017). *Payîzxêr li Ser Salnameya Kurmancî Xebateke Folklorîk*. İstanbul: Wardoz.

Varlî, E. M. (2004). *Dîwan û Gobîdeyê Ahmedê Xanî yêd Mayîn*. Stenbol: Sîpan.

Xanî, E. (2010). *Mem û Zîn* (Hazırlayan: Namık Açığöz). Ankara: T.C Kültür ve Turizm Bakanlığı.

Xeznedar, M. (1998). Zembîlfiroşa Feqiyê Teyran. Bêcih: *War*.

Yılmaz, H. K. (2016). *Ana Hatlarıyla Tasavvuf ve Tarikatlar*. İstanbul: Ensar.

Yılmaz, İ. (2016). *Vekolînek li Ser Çîroka Zembîlfiroş*. (Teza Neçapkirî ya masterê). Muş: Muş Alpaslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı.

Yûsuf, E. (1988). *Şairên Klasîk ên Kurd*. Uppsala: Weşanên Jîna Nû.

Zivingî, M. E. (1987). *Min 'Eqdî'l-Cewherî fî Şerhi Dîwani'ş-Şeyxi'l-Cezerî, c. 2*. Qamîşlo.

Çavkanîyên Zindî

Ç1. Melayê Miksê, 70 salî, Miks

Ç2. Nacî Orhan, 60 salî, Miks

Ç3. Mela Hesenê Sofya, 80 salî, Dîyarbekir

Ç4. Mela Ahmedê Botî, 55 salî, Findik

Çavkanîyyên Dijîtal

Mahabad, Occo, “Ezilenlerin Sesi Feqiyê Teyran”, *Basnews*, 2021. Ezilenlerin sesi Feqiyê Teyran (basnews.com) (tarîxa pêgihaştinê: 30.12.2021)

Naci Orhan, Bahçesaray Miks, TRT6, Bajarên Me, 18.09.2013. <https://www.youtube.com/watch?v=IcPCd6l8aF0> (tarîxa pêgihaştinê: 23.01.2022)

Naci Orhan Belgeseli (Belgesela Naci Orhan), 16.05.2019. <https://www.youtube.com/watch?v=ObTW2WHkH6M>

Rêwî (Yolcu), Beşa 287an (Van-Bahçesaray), (tarîxa pêgihaştinê: 25.09.2018) <https://www.youtube.com/watch?v=X51DBms3RQY> (tarîxa pêgihaştinê: 20.01.2022)

<https://www.edebiyatogretmeni.org/nutuk/> (tarîxa pêgihaştinê: 15.01.2022)

<https://www.turkedebiyati.org/ilahi.html> (tarîxa pêgihaştinê: 02.01.2022)

<https://www.bilgenc.com/nutuk-nedir/> (tarîxa pêgihaştinê: 01.01.2022)

<https://www.vocabulary.com> (tarîxa pêgihaştinê: 26.12.2121)



Kurdiyat

Yıl/Sal/Year: 2023

Sayı/Hejmar/Issue: 8

e-ISSN 2717-8315

Doi: 10.55118/kurdiyat.1350471

Rüpel/Sayfa Page: 31-50



Article Types/Cureyê Gotarê/Makale Türü:
Research Article/Gotara Lêkolînê/Araştırma Makalesi
Received/Dema Hatîne/Geliş Tarihi: 26.08.2023
Accepted/Dema Pejirandinê/Kabul Tarihi: 24.09.2023
Veysel BAŞÇI, Dr. Öğr. Üye., Batman Üniversitesi.
veyselbasci77@gmail.com
ORCID: 0000-0003-1525-0355

Reviewing and Plagiarism/ Değerlendirme ve İntihal:
This article has been reviewed by at least two anonym
reviewers and scanned by iThenticate plagiarism
website./ Bu makale iki taraflı kör hakem sistemine
göre en az iki hakem tarafından değerlendirilmiştir ve
iThenticate adlı intihal sitesinde taranmıştır./ Ev gotar
herî kê m ji aliyê du hakeman va hatiye nixandî û di
malpera întihalê ya iThenticate ra hatiye derbaskirin.

Citation/Atf: Başçı, V. (2023). Bandora şaxa terîqeta
Qadirî-Xalisî li Anatolyayê, *Kurdiyat*, 8, 31-50.
DOI: 10.55118/kurdiyat.1350471.

BANDORA ŞAXA TERÎQETA QADIRÎ-XALISÎ LI ANATOLYAYÊ

Veysel BAŞÇI*

Kurte

Terîqeta Qadirî ku yek ji du terîqetên mezin ên cihana Îs-
lamê ye û di nav kurdan de jî bi heman rengî belav bûye. Di ser-
dema yekem de hebûna sofîyên kurd ên wekî Ebu'l-Hesen Elî
b. Muhemed el-Qureyşî yê Hekkarî ku di silsileya Qadiriyan
de cih girtiye, herwiha hebûna xizm û eqrebayên Şêx Evdilqa-
dirê Geylanî û nevî û naskiren nêzikî wî, di cih û warên kurdan
de heta pênc nifşan berdewam kiriye; ev tişt bûne sedem ku
ev terîqet bi lezûbez pêş bikeve û di nav kurdan de wesayet û
têkiliyên xizimtiyê bi dest bixe. Di dîrokê de çend şaxên giring
ên vê terîqetê di cih û warên kurdan de derketine ku yek ji wan
şaxên giring jî şaxa *Xalisî* ye. Şêx Ziyaûdîn Evdirehman Xalis
Telebanî, şaxa Xalisiye di sedsala XIX-an de damezirandiye.
Ev şaxa terîqetê ku ji Misirê heta Sûriyê, ji Îranê heta Kavkas-
yayê li erdnîgariyeke berfireh belav bûbû, bi saya xelîfeyên
ku Şêx Evdirehman Xalis li hin herêmên Anatolyayê destnîşan
kiribû, bandora xwe hîn zêdetir kir. Xelîfeyên Şêx Evdireh-
man Xalis ên wekî Mûr Elî Baba, 'Umer Xudayî Baba, Dede
Osman 'Ewnî Baba ku li parêzgehên wekî Sêwas, Amasya,
Toqat, Elezîz û Rihayê cih bûbûn, bûn sedema belavbûna vê
terîqetê li Anatolyayê. Di çavkaniyên dîrokî yên Osmanîyan de
gelek caran behsa bandora malbata şêxan Telebanîyan hatiye
kirin. Hin kesayetên giring ên burokrasiyê, wekî Mustefa Saf-
fet (Yetkin) Efendî, ku di serdema Siltan Evdilhemîd de serokê
Meclîsa Meşayîxê û paşê jî bûbû wekilê Rihayê û di komîteya
îdarî ya *Cemîyeta Sofîyê* de cih girtibû, bûn xelîfe û nûnerê
Şêx Elî Telebanî yê kûrê Şêx Evdirehman Xalis, li Anatolyayê.
Bandora malbata şêxan Telebanî/Xalisî di Tirkiyeya nû de jî
demeke dirêj li gelek bajaran bi taybetî li Stenbol, Îzmir, Bur-
sa, Elezîz, Erzirom û Trabzonê berdewam kir. Ev bandor bi
saya Mustefa Xeyrî Baba yê Meletî, Şêx Mustefayê Sêwasî,
Şêx Keremê Ercîşî, Şêx Mistefayê Qersî, Şêx Evdillahê Trab-

* Spasdarê hevkarê hêja Dr. Çetin Taş im ji bo serastkirina vê gotarê ji aliyê rêziman ve.

zonî demeke dirêj li Tirkîyeyê berdewam kiriye û heta niha jî didome. Çavkaniyên dîrokî yê Osmanî û Tirkîyeyê yê îroyîn gelek caran behsa bandora malbata şêxên malbata Telebanîyan kirine. Dikare bê gotin ku di sedsala XIX-an de piştî Şêx Xalidê Şehrezorî û Xalidîtî, tesewifa kurdî ya ku herî zêde bandora xwe li Anatolyaya û Tirkîyeya nû kiriye, terîqeta Xalisîyeyê ye ku jî aliyê Şêx Evdirehman Xalis Telebanî ve hatiye damezrandin. Lewma di vê lêkolînê de pêşî bandora siyasî-civakî ya şaxa terîqeta Qadirî-Xalisî

ku yek ji şaxên terîqeta herî giring e û di valahiya siyasî û civakî ya ji holêrabûna mîrektiyên kurdan de derketiye pêş, dê bê vegotin. Piştî, ji parêzgeha bajarên wekî Mûsil, Kerkûk û Silêmanî de derbas dibe û li ser têngiştina tesewifî ya li Anatolyayê de kiriye, dê bê nîrxandin. Herwiha behsa hin xelife û nûnerên vê şaxa terîqetê jî dê bê kirin.

Peyvên Sereke: Tesewif, Terîqet, Qadirî, Xalisî, Anatoliya.

Kadirî-Halisî Tarikat Kolunun Anadoludaki Etkisi

Özet

İslam dünyasının büyük tarikatlarından birisi olan Kadîrîlik, Kürtler arasında en hızlı yayılan tarikatların başında gelir. Ebü'l-Hasan Ali b. Muhammed el-Kureşî el-Hakkârî gibi ilk dönem Kürt sülûfilerinin Kadîrîlik silsilesi içerisinde yer alması, Şeyh Abdülkadir-i Geylânî'nin hısımları ve akrabaları ile kendisine yakın isimlerin Kürtlerin yaşadığı coğrafyada beş kuşak süren uzun dönem mevcudiyetleri gibi etkenler bu tarikatın Kürtler arasında vesayet ve akraba ilişkileri de kazanarak hızla yayılmasını sağlamıştır. Tarih boyunca bu tarikatın Kürt coğrafyasında birkaç önemli kolu ortaya çıkmıştır ki bu önemli kollardan birisi de XIX. yüzyılda Şeyh Ziyaüddin Abdurrahman Hâlis Tâlabânî tarafından temellendirilmiş olan *Hâlisîyye* koludur. Kadîrî-Hâlisî tarikat kolu ilk müessesleştiği Kerkûk ve çevresinde zamanla koruyucu bir niteliğe dönüşmüş, geniş tarikat ağı vesilesiyle de on binlerce mürit ve taraftara kavuşarak kısa süre içerisinde Mısır'dan Suriye'ye İran'dan Kafkasya'ya uzanan geniş bir coğrafyada etkili olmayı başarmıştır. Şeyh Abdurrahman Hâlis, söz konusu bölgelerdeki Kadîrî tekke ve hanaklara halifeler atamak suretiyle irşad faaliyetlerini genişletmiştir. Anadolu'da da nüfuzu giderek artan Şeyh Abdurrahman Hâlis'in Mûr Ali Baba, Ömer Hüdâyî Baba, Dede Osman Avnî Baba gibi halifeleri Sivas, Amasya, Tokat, Elazığ ve Urfa vilayetlerinde Kadîrî-Hâlisî tarikatını yayan isimler arasındadır. Osmanlı tarihi kaynaklarında Tâ-

labânî Şeyh ailesinin nüfuzundan ve etkisinden defaatle söz edilmiştir. Abdülhamid döneminde *Meclis-i Meşâyih Reisi*, ardından Urfa milletvekili ve aynı zamanda Anadolu'da faaliyet gösteren *Cem'iyet-i Sûfiyye*'nin idare heyetinde yer alan Mustafa Saffet Yetkin gibi bürokraside yer alan bazı önemli isimler Şeyh Abdurrahman Hâlis'in oğlu ve halifesi Şeyh Ali Tâlabânî'nin halifesi ve Anadolu'daki mümessili olmuşlardır. Tâlabânî Şeyh ailesinin İstanbul, İzmir, Bursa, Elazığ, Erzurum ve Trabzon olmak üzere birçok ilde etkisi uzun süre devam etmiştir. Mustafa Hayri Baba Malatyavî, Şeyh Mustafa Sivasî, Şeyh Kerem Erçişi, Şeyh Mustafa Karsî, Şeyh Abdullah Trabzonî gibi isimler vasıtasıyla bu etki uzun süre devam etmiş ve halen de devam etmektedir. Denilebilir ki Mevlâna Halid Şehrezori el-Bağdadî'den sonra Anadolu'da en fazla etki ve nüfuz sahibi olmuş Kürt mutasavvıf, Şeyh Abdurrahman Halis Tâlabânî ve kurucusu olduğu Kadîrî-Halisî tarikat koludur. Dolayısıyla bu çalışmada ilkin Kürt mirliklerinin ortadan kalkmasıyla birlikte oluşan siyasî ve sosyal boşlukta öne çıkmış önemli tarikat kollardan birisi olan Kadîrî-Hâlisî tarikat kolunun siyasal-sosyal nüfuzu ile yerleşik olduğu Musul, Süleymaniye ve Kerkûk gibi vilayetleri aşarak Anadolu sahasındaki tasavvufî hayata etkisine ve dahi halife ve mümessillerine değinilecektir.

Anahtar kelimeler: Tasavvuf, Tarikat, Kadîrî, Hâlisî, Anadolu.

The Influence of the Sufi Order Qadirî-Khalisî in Anatolia

Abstract

The Qadiriyya, one of the major sects of the Islamic world, is one of the most rapidly spreading Sufi orders among the Kurds. Factors such as the inclusion of early Kurdish Sufis such as Abul-Hasan Ali ibn Mohammad al-Kureishi al-Hakkari in the Qadiriyya lineage, the presence of names closely related to Shaykh Abdul Qadir al-Jilani among his relatives and acquaintances in Kurdish-inhabited regions, and their long-term presence over five generations in Kurdish geography have contributed to the rapid spread of this order among Kurds, gaining influence and kinship. Throughout history, several important branches of this order have emerged in the Kurdish region, and one of these important branches is the Halisiyye branch, founded by Sheikh Ziyauddin Abdurrahman Khalis Talabani in the 19th century. The Qadiri-Khalisi order first established itself in and around Kirkuk and gradually developed into a protective organisation. Through its extensive network, it quickly became influential in a wide geographical area stretching from Egypt to Syria, from Iran to the Caucasus. Sheikh Abdurrahman Khalis expanded his caliphs/khalifas activities by appointing successors to Qadiriyya tekkes and hankahs in these regions. In Anatolia, Sheikh Abdurrahman Khalis, whose influence grew steadily, had disciples such as Mor Ali Baba, Omer Hodayi Baba, Dede Osman Avni Baba, who contributed to the spread of the Qadiriyya-Khalisi order in provinces such as Sivas, Amasya, Tokat, Elazig and Urfa. Ottoman historical sources frequently

mention the influence and impact of the Talabani sheikh family. Some important figures in the bureaucracy during the Abdulhamid era, such as the Chairman of the Council of Sufi Sheikhs, later MP of Urfa, and members of the Board of Directors of the Sufi Society operating in Anatolia, such as Mustafa Saffet Yetkin, became disciples and representatives of Sheikh Ali Talabani, the son and successor of Sheikh Abdurrahman Khalis. The influence of the Talabani sheikh family continued in many cities of the Anatolia, including Istanbul, Izmir, Bursa, Elazig, Erzurum and Trabzon. Thorough personalities such as Mustafa Hayri Baba Malatyavi, Sheikh Mustafa Sivasi, Sheikh Kerem Ercishi, Sheikh Mustafa Karsi, Sheikh Abdullah Trabzoni, this influence lasted for a long time and still exists today. It can be said that after Mevlana Khalid Şahrazori al-Baghdadi, Sheikh Abdurrahman Khalis Talabani and the Qadiri-Khalisi branch he founded were the most influential Kurdish Sufi mystics in Anatolia. Therefore, in this study we will first examine the political and social influence of the Qadiri-Khalisi branch, one of the prominent Sufi orders that emerged in the political and social vacuum created by the disappearance of the Kurdish principalities, and its impact on religious life and Sufi understanding in Anatolia. We will also look at the role of the caliphs and representatives of this branch, which extended from the provinces of Mosul, Sulaymaniyah and Kirkuk to Anatolia.

Keywords: Sufism, Sect, Qadiri, Khalisi, Anatolia.

Destpêk

Terîqeta qadîrî ku yek ji terîqetên herî mezin a cihanê Îslamê ye û di serdema destpêka xwe de li cih û warên kurdan belav bûye. Îhtimala kurdbûna Şêx Evdîlqadîrê Geylanî (kd. 1116) ku pîrê damezirînerê vê terîqetê ye (Tenik, 2015: 55), yan jî ew, di derûdora çandî ya bi ramanên kevnar ên îranî-genostîk ên wek *muşebbihiyeyê* gihîştîye, bûye yek ji wan sedemên herî giring ku ev terîqet di nav kurdan de zû belav bibe. Li gorî Nikitin (2008: 388) sedema belavbûna terîqeta qadîrî di nav erd û eşîrên kurdan de ew e ku ew bixwe kurd e yan jî ji ber ku xizm-eqreba û neviyên wî, li pênc nîşan li cih û warê kurdan de mezin bûne. Nîşaneyên herî giring a ku vê ramana Nikitin piştrast dike hebûna sofîyan wekî Ebu'l-Hesan Elî b. Muhemmed b. Mewlana el-Qureyşî el-Hekkarî (kd. piştî 1079) û yek ji neviyên wî Şêx Şemseddîn Elî ye ku bi saya wan, qadîrî jî rojên ewil di nav kurdan de belav bûye. Birêxistinkirina ramana kurdî ya sofîtiyê di nav eşîrên kurdan an jî çîna serdest a kurdî di hin serdemên dîrokê de faktoreke din e ku bûye sedem, terîqeta Qadîrî bi leztir di nav kurdan de belav bibe. Bi rastî jî mîrê Hekkariyê Seyîd Suleyman Baba (kd. piştî 1642) yek ji wan mîrên kurdan ên navborî ye. Wek mînak, Seyîd Muhemed Nûdehî (kd. piştî 1650) ku jî seyîden malbata Berzenciyan e, berê întisabê terîqetên wekî Nûrbexşîye û Xelwetiye kiribû, piştî ku derbasî terîqeta Qadîriyeyê bû û bi nasnavê *Kibritu'l-Ehmer* hat naskirin, ev terîqet di nav kurdan de bi leztir belav bû. Malbateke din a seyîd ku di vê belavbûnê de bûye alîkar, bê guman malbata *Nehriyan* e. Wekî ku tê zanîn, malbata Nehriyan neviyên Şêx Evdîlqadîrê Geylanî ye û malbeteke mezin û xwedî zar û zêç in ku ûrta wan jî digihîje Hz. Pêxember. Ev malbata ku îro bi paşnavên *Geylanî* û *Geylanîzade* tê naskirin, ji aliyê bav digihîjin Hz. Huseyn û ji aliyê dê ve jî digihîjin Hz. Hesen. Lewma ew malbat hem wekî *şerîf* hem jî wekî *seyîd* tê nasîn ku ev herdu nasnav di cihana îslamê de pir kêmtên dîtin. Ji xeynî van nasnavan, ji ber ku ev malbat demeke dirêj bi dîn û terîqetê re têkildar bûne, bûye sedem ku wekî *Malbata Şêxan* li erdnîgariya çandî ya ku tê de dijîn, nasname û otorîteya dînî û çînî îfade bike. Berê li *Nehriyê* (ku girêdayî navçeya Şemzînana Colemêrgê bû) bi cih bûne û piştî ew navçe ji aliye dewletê ve bûye gund. Ji ber vê yekê bi navê *Sadatên Nehrî* yan jî *Seyîdên Nehrî* yan jî *Sadatên Şemzînî*, *Şêxên Şemzînî*, *Şêxên Şemzînan* hatine naskirin. Malbata *Sadatên Nehrî* wekî zarokên Şêx Ebûbekir Evdîleziz Geylanî (kd. 1206) neviyê Şêx Evdîlqadîrê Geylanî ji Akreyê hatine vê herêmê û li gorî hin gotinan, ew jî herêma Şengalê hatine û li gundê *Stûnê* ya navçeya Herkî ya Şemzînana îro bi cih bûne (Başçı, 2022: 37). Şêx Heyder Geylanî, yek ji neviyên Şêx Ebûbekir Ebdîleziz Geylanî ye, demekê li vî gundî bi çend şagirdên xwe re jiyaye û li vê herêmê terîqeta qadîrî belav kiriye (Nikitine, 2008: 388-389). Herwiha bi belavbûna terîqeta qadîrî re di erdnîgariya berfireh a kurdan de, bi demê re çend şaxên giring derxistine meydana. Bêguman yek ji wan şaxên giring *Muştaqiye* ye ku ji aliyê Seyîd Mustefa Muştaqê Bedlîsî (kd. 1831) ve hatiye damezrandin û ya din jî şaxa *Xalîsiye* ye ku ji aliyê Şêx Evdîrehman Xalîs Telebanî (kd. 1858) ve li Kerkûkê hatiye damezrandin.

1. Malbata Şêxên Telebanî û Têkiliya Şêx Evdîrehman Xalîs Telebanî bi Terîqeta Qadîrî re

Malbata Şêx Evdîrehman Xalîs Telebanî ku wekî *Malbata Şêxên Telebanî* jî tê naskirin, bi eslê xwe ji rojhilata Kurdistanê ye. Ew ji kurdên *Kakesûrî*, şaxekî eşîra *zengenê* ye, lê bi navê *Şêxên Teleban* yan jî *Şêxên Telebanî* navdar bûye. Bi rastî jî şair Şêx Rîza Telebanî, kurê navîn yê Şêx Evdîrehman Xalîs Telebanî ye, di dîwana xwe de bi helbesteke farîsî wiha behsa vê mijarê kiriye:

*Evdirehman Telebanî bi navê Xewsê duyem li cihanê navdar e
Ceddê wî Mehmûd, bavê wî Ehmed e, her sê jî welî ne, qutbê qutban e
Herçiqas Mehmûd ji zengeneyê bê zanîn jî, lê murîdê Pîrê Lahor e
Herçend bi eslê xwe gulek be jî pelek ji rezê Kakesûrîyê ye (Başçı, 2020: 32).*

Rustem Axa, bapîrê Şêx Mela Mehmûd (kd. 1800) ku cara yekem navê wî di zarên malbata şêxên Qadîrî-Telebanî de derbas dibe, eslê xwe ji bajarê *Bûkan* a Kurdistanana Îranê ye. Piştî li herêma *Qeredax* a Kurdistanana Iraqê bi cih bûye û Mela Mehmûd jî li wir hatiye dinyayê. Ew bi qîza Mîr Îsmail, serokê eşîra zengenê re zewicîye. Mela Mehmûd bi saya merivantîyê ku bi serokên eşîran re datîne, ew kiriye endamê eşîrê û herwiha hiştiye ku ew bikeve nav çîna bijarte ya wê eşîrê jî. Ji ber vê, rol û rîsta xwe ya di eşîra zengenê de bû sedem ku jê re bibêjin Şêx Mela Mehmûdê Zengenê (Başçı, 2020: 33). Şêx Mehmûdê Zengenê xelîfetiye ji Şêx Ehmedê Hindî el-Lahorî (kd. 1747) wergirtiye û cara ewil li gundê *Tekyayê/Qerhê* tekyayek ava kiriye û li wir dest bi xebatên îrşadê kiriye. Şêx Ehmedê hindî demekê li gundê *Qerhê* dimîne û rêberiya murîdê xwe Şêx Mehmûd dike. Şêx Ehmed (kd. 1834) kur û xelîfeyê Şêx Mehmûd, li hemberî gundê *Qerhê* gundekî nû bi navê *Telebanî* ava dike. Ji vir pê ve jî ev malbat navê *Malbata Şêxên Telebanî* digire. Piştî, malbata şêxên Telebaniyan bi toreyên derwêşî yên ku di serdema Şêx Ehmed de li Kerkûk û derdora wê hatine avakirin, bi kapasîteya xwe ya dînî û tesewîfî girseyeke civakî ya mezin kiriye bin bandora xwe (Işık, 2017: 436-437). Bi demê re ev malbat jî mîna eşîrên din ên herêmê bû eşîreke serbixwe û ev eşîr veguherî yek ji eşîrên herêmî ku valahiya hêzê dagirt ya ku di serdema piştî jiholerakirina mîrektiyên kurdan de, di pêvajoya navendîbûnê de ku di salên 1830an de dest pê kiribû. (Çetinsaya, 1999: 153). Şêx Riza Telebanî yek ji wan kesan e ku vê taybetmendiya malbata xwe ya ku bi peyrew û peyrewên xwe ve bi nasnameya xwe ya qadîrî ve bûye eşîreke mezin, di helbesta xwe ya kurdî *Le Basî Bab û Bapîrî* de herî baş vedibêje. Di vê helbestê de dibêje ku Mela Mehmûd xelîfetiye ji Şêx Ehmedê hindî wergirtiye, ji ber vê yekê, ew diyar dike ku ew bûne hêzeke eşîrî û ji bili vê faktora qadîrî di avakirina malbat/eşîrê xwe de wiha aniye zimên:

*Dema ku Xwedê bixwaze bendeyek ji bendeyên xwe şad bike
Tiştê ku di dilê wî de ye ji dûr ve tîne ber bi lingên wî
Ji Hindistanê ber bi welatê Kurdistanê ve ji rêya şeş mehan be jî
Xwedê Şêx Ehmedê hindî şand cem Mela Mehmûd
Mela Mehmûdê Zengenê ew ku stûna xeleka rêberiya îrşadê bû
Ku dengê ya hû ya ma 'bûd ji her derê tîrba wî bilind dibû
Piştî koça dawî li şûna wî Şêx Ehmed rûnişt
Mîna rûniştîna Silêman li şûna bavê xwe yê Dawûd
Erê, helbet ji bavekî wisa dê kurekî wisa bibe
Xwedêyo! Tu gora wî bav û kurî sed hezar carî ronî bikî
Piştî rehmeta Mehmûd û Ehmed, dora Evdirehman bû
Ew kurê Mehmûd û Ehmed, ku ez ji can fedayê wî bûm
Ew bûn ên ku em mezin kirin, ku em bigihîjin armancên bilind
Ên ku em kirin em, ew bûn*

*Niha xwediyê rêberiya îrşade Şêx Elî ye, kurê wî yê mezin
Ew jî wek bav û kalê xwe di nav ewliyayên Xwedê de ye
Riza jî ji ûrta wan e, lê Rebbê wî bibore
Ji ber ku gul bê strî, derya bê mij, dûman jî bê agir nabe (Telebanî, 1946: 14-15).*

2. Şêx Evdîrehman Xalîs Telebanî û Tesîra Wî ya Tesewîfî

Bê şik di nav şêxên Telebanî de navdartirîn şêx, Şêx Ziyauddîn Evdîrehman Xalîs Telebanî, kurê Şêx Ehmed e. Ew damezrînerê şaxa *Xalîsiye* ya Qadiriyyê ye ku bi navê wî hatiye nas-kirin. Şêx Evdîrehman Xalîs di sala 1797an de li gundê Telebanê hatiye dinyayê. Şêx Evdîrehman, xwendina xwe ya ewil li cem bavê xwe Şêx Ehmed dîtiye, piştê li Bexda û Silêmaniyeyê xwendina xwe berdewam kiriye. Xwendina xwe ya tesewîfî li Silêmaniyeyê li cem Şêx Merûf Berzencî tamam kiriye ku yek ji şêxên Qadirî yên herî giring ê herêmê bû (Edmons, 2003: 109). Berî ku Şêx Merûf wefat bike, Şêx Evdîrehman xelîfetî jî destê wî wergirtiye. Şêx Evdîrehman, piştî wefata murşîdê xwe vedigere xizmeta bavê xwe, ji ber xizmeta wî ya ji bo du murşîden med-lcfzin, nasnavê *Zu'l-Cenaheyn* lê tê kirin. Şêx Evdîrehman ku piştî wefata bavê xwe li Kerkûkê bi cih bû, derwêşxaneyê ku dê bibe navenda şaxa Xalîsiyê ava kir (Tenik, 2015: 66). Bîdestpêkirina Şêx Evdîrehman Xalîs ji bo wezîfeya rêbertiya îrşadê di terîqata Qadirî de, bû sedem ku bandora malbata wî li hemû civakên Kerkûk û derdora wê veguherîne roleke parastinê. Bi demê re li taxa *Bulax* a Kerkûkê ku derwêşxaneyê Xalîsiyê li wir bû, mizgefteke bi minare hate avakirin (Başçı, 2020: 34). Şêx Evdîrehman Xalîs ew derwêşxane ku cihê ta'et û ibadetê bû, kir navenda muzîka edebî û dînî ya herêmê û piştê ew derwêşxane di cihanê de bû navenda herî giring a terîqata Qadirî-Xalîsiyeyê. Bi fermana Şêx Evdîrehman, bi demê re li bajarên din jî derwêşxaneyên din ên girêdayî vê derwêşxaneyê, bi rêya birayên wî û peyrewên wî vebûn. Mihemed Xurşîd Paşa (kd. 1878) di berhema xwe ya bi navê *Seyahatnameya Hudûd* de behsa bandora Şêx Evdîrehman Xalîs dike li Kerkûk û derdora wê. Xurşîd Paşa dema ku hûrgiliyên gund û axên ku Şahê Îranê afirandine jî şêxên Neqşî-Xalîdî Hekariyê yên wekî Şêx Seyîd Tahayê Nehrî (kd. 1853) re parve dike, behsa tesîra Şêx Evdîrehman Xalîs Telebanî jî dike. Xurşîd Paşa di raporên xwe de bal dikêşe li ser erdnîgariyê û bandora van herdu şêxên kurdan (Seyîd Taha û Şêx Evdîrehman Xalîs) a li ser deverê dike û piştê jî wan herdu şêxan dide berhev:

“Li gundê Berdesorê, Şêxekî bi navê Şêx Seyîd Salîh ku ew jî birayê Şêx Seyîd Taha Nehrî ye ku jî şêxên Neqşî-Xalîdî ye û li Îmadîyeyê li herêma Geverê postnîşînê îrşadê, heye. Li wî gundî derwêşxaneyek heye û Şêx Salîh li wê derwêşxaneyê postnîşînî û xalîfetîya birayê xwe dike. Xelkê vî gundî bi giştî Înabelû ne. Sê gundê wê herêmê yên bi navê Dize, Beyraseb û Milebasak ku girêdayî Mergêver û Tengeverê ne û ew herdû dever jî di nav sînorê Şemzînan a ku gîredayê Akreyê ye ji aliyê Şahê Îranê ve radestî Şêx Taha bûne. Du gundê cuda jî dîsa ji aliyê Şahê Îranê ve radestê Seyîd Salîh bûne ku hemû derhatê wan gundan digihije destê wan şêxên navborî. Şêx Taha ku di herêma Mûsil, Akre û Îmadîyê de tê nasîn û hez kirin li derûdora Êrûmiyê jî hin erd û gundên din di bin desthilatdariya wî de ne. Li wê herêmê bi xwedî keramet û bi nav û dengîya xwe weke navdar û serbilind tê nasîn. Ew jî mîna hezreti Şêx Evdîrehman Xalîs Telebanî Efendî ye ku li Kerkûkê dijî.” (Hurşîd Paşa, 1977: 244-245).

Şêx Xalîs ji bilî şêxekî bi bandor, şair e û bi gelek zîmanan helbestên wî hene û di helbestên xwe de nasnavê *Xalîs* bi kar aniye. Menaqibnameya Şêx Evdîlqadir Geylanî ya bi navê *Behçetu'l-Esrâr* ku ji aliyê Şêx Nûreddîn Şettanûfî ve bi zîmanê erebî hatiye nivîsandin, wergerandiye tirkîya osmanî. Her wiha dîwaneke helbestê ya bi navê *Cezbeyê Eşqê* ku ji xezel û qesîdeyên erebî, farîsî û tirkî pek hatine, herwiha berhemeke bi navê *Kitabu'l-Me'arif fi Şerhê Mesnewi'uş-Şerîf* jî heye ku tê de tefsîra hejdeh dubendiyên pêşîn ên Mesnewiya Mewlana Rûmî bi zîmanê farîsî kiriye. Di hin çavkaniyan de (Kavak, 2015: 68) tê gotin ku helbestên Şêx Evdîrehman bi zaravayê hewramî/ewramî yê kurdî jî hene û tevî ku hin agahiyên devkî hatine dayîn *Dîwana* wî ya bi navê *Cezbeyê Eşqê* jî ji kurdî bo farîsî hatiye wergerandin. Lê me ev helbestên bi kurdî bi dest nexistin. Şêx Ebdîrehman Xalîs, rêbaza seyr û sulûkê ya ku bi *Esmayê seb'e* di terîqeta qadirî de dihat kirin, bi kelîmaya *tewhîd* û *leŷzeya celalî* ve sînordar kiriye û ew bi vê taybetiya xwe ve hatiye naskirin. Wekî ku tê zanîn di şaxa Xalîsiyê de zikir, ji terîqata qadirîyê cudatir, hem bi şiklekî ser piyan (qiyamen) hem ji bi şiklê rûniştinê (qu'ûden) tê kirin (Tenik, 2015: 38). Bi ser de jî di nav gel de li ser wî efsaneyên awarte hatine gotin. Li gorî ku Şêxulîslam Heyderîzade Îbrahîm Efendî ragihandiye, gelek kesan di dergah û derwêşxaneyên wî de xwarin xwarine bêyî ku ferq û cudahiyeke di navbera dîn û terîqata wan kesan de bê danîn. Bo nimûne, tê gotin rojekê Mecûsiyek li dergahê dibe mêvan û merasîma xwe ya dînî ya li gorî baweriya xwe dike, dema kesên ku ew dîtine û xwestine wî derxin derve, şêx pêşiya wan girtiye û jê re gotiye ku ayîna xwe pêk bîne (Çelik, 2019: 575).

Navûdeng û bandora Şêx Evdîrehman Xalîs bi demê re ji sînoren herêmê derbasî axa Osmanî û Anatolyayê jî bûye. Li Osmanî û Anatolyayê, digel xelk, hinek giregirên dewletê jî li dû rêya wî çûne. Herwiha wî li gelek deverên Anatolyayê ku wekî Sêwas, Amasya û Toqatê, bi taybetî li Kurdistanê, û dergahên Qadirî yê li Stenbol, Semerqend, Medîne, Misir, Tanta, Sûriye û Îranê jî xelîfe peywirdar kirine. Sultan Ebdulmecîd (kd. 1861) gava gelek raporên ku pesnê Şêx Evdîrehman didin, hildide wê demê ji bo ku hurmeta xwe ji wî re nîşan bide mizgeftêk dide ava kirinê. Herwiha *Sultane Xatûn* a jina Sultan Ebdulmecîd, dikeve bin tesîra hin xewnên xwe ku di wan de dibe şagirda Şêx Evdîrehman Telebanî û bi hezkirin û hurmeteke bê dawî bi wî ve tê girêdan. Bi rastî jî wê mohra xwe li pirtûkeke bi navê *Buxariya Şerîf* da ku ev pirtûk di muzexaneyên Stenbolê de veşartîbû. Ev pirtûk ligel hin diyariyên din ku di nav de çend ta ji riyên Hz. Pêxember ên mibarek jî hebûn, jê re wek diyarî şand Kerkûkê. Ji bilî vê her meh ji sandoqa dewletê Şêx re 100 qurûş mehmîz hat dayîn. Herwiha ji weqfa Şêx Evdîlqadir Geylanî ya li Bexdayê bi navê *teamiyeyê* her meh ji dahata xwe 500 qurûş terxan kir û ji heman wesiyetê mehmîza şêx derxist 1500 qurûşî. Digel vê jî ji bo xizmeta mizgeftê 500 qurûş mehmîz hat dayîn (Çelik, 2019: 576).

Şêx Evdîrehman, wekî me li jor jî behs kir; piştî ku di sala 1859an de li Kerkûkê diçe ser di-lovaniya Xwedê û li hewşa dergaha Telebanî ya li wir, tê veşartin. Di dema jiyana xwe de wekî serokê hemû şêxên qadirî hatiye dîtin. Di serdana xwe ya asayî ya li ser tirba Şêx Evdîlqadirê Geylanî de ji aliyê mezinên terîqetê û neqîbu'l-eşrafê Bexdayê ku yek ji neviyên wî bû û li Bexdayê rûdinişt, qedr û qîmeteke mezin didît. Her sal di tirba Evdîlqadirê Geylanî de serokatiya zikir û wird dewreyê kir. Ji ber ku di dergaha Şêx Evdîlqadirê Geylanî de li qudûm û amûrên mûzîkê yê bi vî rengî lê dixistin û îlahî digotin. Derwêşên dîndar serî li şêxê Bexdayê dane û giliyê Şêx

Evdirehman kirine. Wê demê neqîbu'l-eşrafê Bexdayê ketiye navberê û gotiye ku “Ez nikarim bikevim navbera Sultan û wezîrê wî.” Ev nişan dide ku Şêx Evdirehman Xalis, şêxê Qadirî yê herî mezin ê wê serdemê bûye (Tenik, 2015: 66). Li gorî tiştên ku li ser Şêx Evdirehman Xalis hatine nivîsîn û gotin, ew yek ji şêxên zana kêmpêyda ye ku di nav terîqeta Qadirî de mezin bûye. Hezkiriyên sofîyên Xwedê yên ku bêhna wî ya xweş a wek gula sedpelî bêhn dikirin û feyz jê werdigirtin, ji bilî tewhîdê tiştek nedigirtin û pê re digihiştin bi heqîqeta Muhemmediyeyê. Kesên ku ew nas kirine, li ser wî ev agahî dane:

“Ew yek ji wan alimên herî hêja bû ku para wî ji mohra Hz. Pêxember ronî bû, ku dunya derxistibû ronahiyê. Di dema ku ew bi mijarên narîn û giring ên tesewifê re mijûl dibû, bilindahiya xizmetên wî û bilindbûna rûhiyeta wî ewqasî ku ji devê wî ji bilî hikmet û îrfanê ti gotineke din dernediket û pileya cemal-kemalê pê re bilind dibû. Merdaniyeke sofîyane nişanî li her kesî dida û ger tiştêkî wî tunebûya da ku bide yekî, cil û bergên xwe derdixist û didayê.” (Tenik, 2015: 67).

Li gor rîwayeta Edmons, li ser rîwayeta derwêşekî Xalîdî, ji Silêmaniyê, Şêx Evdirehman Xalis digel Seyîd Kak Ehmed Berzencî destê Mewlana Xalid (kd. 1827) ramûsîne, jê re hurmeta xwe nişan dane û dilpakîya xwe ragihandine (Edmons, 2003: 110). Piştî mirina wî kurê wî yê mezin Şêx Elî Telebanî (kd. 1912) bi nasnavê *Ebu'l-Mehasîn* derbasî cihê wî bûye.

3. Malbata Şêx Telebanî ya Piştî Şêx Evdirehman Xalis

Bi saya terîqeta berfireh a ku li herêmê, bi taybetî li bajarên navendî yên Kurdistana Iraqê ava kiribûn, malbata Telebanî, nemaze di serdema Şêx Evdirehman Xalis de bi deh hezaran sofî û hezkirî bi dest xistibûn. Ev pêşveçûn di serdema Şêx Elî Telebanî de, ku xelîfe û postnişînê Şêx Evdirehman Xalis bû jî berdeyam bû. Bi saya pozîsyon û karîzmaya xwe ya dîni, Telebaniyan, ku pêşî bandora wan li ser endamên malbata wan zêde bû, bi hêzên ku di nav derdora xwe de ava kirin, li herêmeke mezin a ku bi demê re kontrol kiribûn, bûn parçeyek ji eşîrên feodal ên wê herêmê. Ji ber vê sedemê jî gelek çavkanî malbata Telebaniyan wekî eşîrek bi nav dikin (Işık, 2017: 437). Di vî warî de Bruinessen (2015: 329) girêdana eşîrî-dîni ya Telebanî nişan daye û gotiye ku herçiqaş çalakiya Telebanî di wê demê de ji dîni zêdetir eşîrî xuya bike jî, lê ev hêz bi rastî ji ber bandora dîni ya nifşên borî bû. Di hevsengiya hêza eşîrî ya Telebanî de, nemaze kakeyî, cebbarî, berzenî bi taybetî di helbestên Şêx Riza yên kurdî û farisî de, ku wekî yek ji mîrasên nivîskî yên vê malbatê tê qebûl kirin, nakokiyên bi eşîrên dîn ên kurdan re, dijminên kevneperest, di nav wan de dawûdî, bi qasî ku pêkan e, yan jî hûrgiliyên giring li ser peymanên aştiyê yên ku di navbera van eşîran de hatine çêkirin, têne dayîn. Sultan Evdilhemîdê II. (kd. 1918), piştî ku Şêx Evdirehman Telebanî wefat kir, malbata Telebaniyan hîn jî ji aliyê wî ve demeke dirêj hat parastin. Nivîsên balkêş û giring ên ku ji aliyê Tepeyran ve hatine nivîsîn, nişan dide ku malbata Telebaniyan di heman herêmê de bandora sînorên xwe yên dîni û eşîrî roj bi roj berfireh kirine. Ji van gotinan bi zelalî tê fehm kirin ku Siltan Evdilhemîd piştgirî dide bo malbata Telebaniyan. Çavdêriyên Tepeyran wiha ne:

“Du şêxên terîqetê hebûn ku Siltan Ebdulhemîd pir rêz li wan digirt, bi navên Telebanî Şêx Elî li Kerkûkê û Şêx Seîd Kak li Silêmaniyê. Peyva “şêx” li wan deran ne tenê ji bo şêxên terîqetê dihat gotin, mesela ji wan re dibêjin Qatircîbaşî yan jî Şêxulmekarî û herwiha ji serokên eşîran

re jî dibêjin şêx. Ev Hamût ji eşîra Şêx Elî Telebanî ye. Min kir nekir Siltan mijara şêxên nijdevan fêhm nekir. Dema ku me li ser vê mijarê dest bi tehqîqatê kir; Ji aliyê dewletê ve destûra çewsandinê derneket; gotin ku li ser buxtanên ermenan rexnekirina meşayîx û ekabîrê îslamê nabe. Lewma kurê wî Şêx Elî jî bi wergirtina pereyî ji gundên Kerkûkê ji bo baca çekan li ser navê dergahê Hûmeyûn a Telebanî û hin belgenamêyên azadîyê yên ku bi pereyan dabûn qatîl û sûcdaran, hatibûn girtin. Li dijî sûcdarên ku ev belgenamêyên azadîyê werdigirtin ku dişibe kaxezîyên kirîna bihûştê yên berê ku papayan difirotin, nabe ku doz were vekirin. Ev kurê Şêx Elî bi madalyaya Mecîdî ya pileya sêyem li ser sîngê wî ve hat xelatkirin û berdan. Şêx Hemût û dozdeh hevrêyên wî li ser têlgirafa serokê Metîfê/Katîba Mabeynê hatin berdan: Herçiqas ji aliyê komîsyona lêkolînê ve hatibe îspatkirin ku Şêx Hamût Telebanî û dozdeh hevalên wî yên din beşdarî kiryarên weke kuştin û şewitandina gundan bûne jî, divê piştî vê carê bi cezayê herî giran bîn cezakirin, lêbele bila a niha ji wan re bê gotin ku Siltan wan efû dike û serbest bîn berdan.” (Tepeyran, 1998: 372-373).

Di serdema xelîfeyê Şêx Evdirehman Xalîs û kurê wî Şêx Elî de hem li herêma ku lê dijîn û hem jî li erdnîgariyên ku di serdema bavê wî de belav bûne, bandora Xalîsiyeyê berdewam kiriye. Wek mînak, 123 derwêşên ku peyrewên Şêx Elî Telebanî bûn, ku bandora wan li herêmên kurdên sunnî yên Îranê berdewam bû, dilsoziya xwe bi Dewleta Osmanî re ragihandin (Ahmad, 2022: 74-78). Herwiha xangaha Necar a Qadiriyan ya li Hewramanê ku heta îro jî dewam dike, ji aliyê xelîfeyên Şêx Elî Telebanî ve hatiye avakirin. Bi heman awayî, wekî ku em ê li jêr hûrgiliyan bidin; Mustefa Saffet Yetkîn, ku serokê meclîsê û parlamenterê Rihayê yê Împaratoriya Osmanî bû, li Anatolyayê yek ji xelîfeyên Şêx Elî Telebanî kurê Şêx Evdirehman Xalîs bû.

4. Çend Nûner û Xelîfeyên Giring ên Xalîsiyeyê li Anatolyayê

Piştî ku Şêx Evdirehman Xalîs Telebanî di nivê pêşîn ê sedsala XIX-an de bû serkeşê terîqeta Qadiriye-Xalîsiyeyê dibe bandora wî bi riya hin nûner û xelîfeyan li gelek deverên Anatoliyê belav dibe. Ji xelîfe û nûnerên herî giring ên ku di belavbûna Xalîsiyeyê de li Anatolyayê xwedî xizmetên giring ev in:

4.1. Mûr Elî Baba

Eslê xwe ji Mûsilê ye û Şêx Evdirehman Xalîs ev nasnavê *Mûr Elî* daye wî û bi navê Mihe-med b. Ehmed Paşa b. Abdullah Paşa (kd. 1884) jî tê nasîn. Mûr Elî Baba ku ji zarokatiya xwe ve bi sûfîtiye re eleqedar bû û bi balixbûna xwe re dest bi sulûka xwe kir û di 15 saliya xwe de tevî terîqeta Qadiri bû. Hê wextê zarok bûye, Şêx Evdirehman Xalîs Telebanî di xewna xwe de dîtîye û Şêx Evdirehman ew vexwendîye Kerkûkê û gotîye ku dê perwedeya te li cem min be. Şêx Evdirehman wekî kesekî *ehlê sidqê* (sadiq) xîtabî wî kiriye, ew bi xwe re biriye dergaha xwe ya li Kerkûkê. Mûr Elî Baba ku li wir nêzî şeş mehan xizmeta şêx kir, ji nişka ve bi dîtina murşîdê xwe û bêyî hemdê xwe ji dergahê derdikeve û diçe li şikeftê, zozan, gund û bajarokên li derûdora Kerkûkê dijî. Di wê heyamê de, di jiyana xwe ya bi coş û şînê de, her cure dînîti kiriye ku dê gelê herêmê bêzar bike. Mûr Elî Baba, heft salan di vê rewşê de maye, rojekê di heman rewşê de tê û li pêşberî Şêx Evdirehman Xalîs disekine. Şêx Evdirehman pesnê wî dide û xurmeya di destê xwe de dide wî û ev rewşa wî ya perîşan ji holê radibe. Mûr Elî Baba, ev heft salên jiyana xwe wek

xewnekê difikire û ji ber vê rewşa xwe şerm dike û mehekê nikare bi kesî re biaxife. Şevkê di xewna xwe de dibîne ku bavê Şêx Evdirehman Xalis û Şêx Ehmed Telebanî, mushefek daye destê wî û wî jî bi tevahî ji ber kiriye. Herçiqaş berê nexwende bû jî, lê dema ji xewê şiyar dibe, dibîne ku di xwendina Quranê de jîr e. Ji bo ku ew nebe nîşana mucîzeyan, Şêx Evdirehman ew da destê seydayekî kor û jê xwest ku rojane cuzek ji Quranê jiber bike. Bi vî awayî ew jî Quranê xitim kir. Şêx Evdirehman Xalis, ji ber ku zanebûna wî ya ji bo zanîstê, ew xiste nav xelega zanîne ya ser-xelîfên xwe. Mûr Elî Baba di bin çavdêriya wî ser-xelîfeyan de du salan ilmên dînî û xebatên tesewifi xwendine. Piştî, ew ji aliyê Şêx Evdirehman ve hat şandin bo xizmeta Ehmed Şah, ku dergaha wî li gundê *Rejavê*, ku bi rêya şeş menzilan ji Kerkûkê dûr bû. Mûr Elî Baba ku du salan li wir bi berhevkirina nan xizmet kir, bi daxwaza Şêx Evdirehman Xalis çû Bexdayê û demekê li cem şêxê xwe li wir ma. Bi şîreta şêxê xwe pênc mehan li wir gunehê xwe dawêşand û paşê vegeriya Kerkûkê (Kıbrıs, 2015: 3-5). Kesê ku xirçe, cil û bergên tesewifi li Mûr Elî Baba kiriye Şêx Evdirehman Xalis Telebanî ye. Şêx Evdirehman ev yek li ser daxwaza bavê xwe Şêx Ehmed Telebanî û kalîkê xwe Molla Mehmûd Zengene aniye cih. Wan jê re gotîbûn ku yek ji şagirdên wî dê li herêma Sêwasê dergaha qadirî ava bike û ew ê li wir bi ser keve. Lewma jî li gor gotinên wan, erka xelîfetiye daye Mûr Elî Baba (Terzibaşı, 2013: 218).

Li gor gotineke din, waliyê Sêwasê yê wê demê nameyek ji Şêx Evdirehman Xalis Telebanî re şandiye û jê xwestiye ku xelîfeyekî bişîne bajarê wan û wî ev daxwaz gelek caran dubare kiriye. Her xelîfeyê Şêx Xalis Telebanî, ku wî teklîf jê re kir, got: “Ez xizmeta xwe li ber şêxê xwe bernadim, ez jê lava dikim ku vê şerefê ji min bêpar meke!” û Şêx paşê ferman da xelîfeyên xwe; yên ku heta asta evîne jê re dilsoz bûn û heta ku ev sûfî-meşreb Mûr Elî Baba nas bike, çûyîna Sêwasê derengî xist (Çelik, 2015: 576). Mûr Elî Baba ku li ser fermana Şêx Evdirehman dergah terikandibû, digot qey Sêwas gundekî giredayî Kerkûkê ye, yekser berê xwe dide Mûsilê û ji ser *Acisuyê* re jî diçe Amedê. Di sala 1844an de, piştî rêwîtiyeke dijwar, digihîje Sêwasê. Di hucreyekê de li dergaha derwêşan a Şêx Îbrahîm Naîbî Sêwasî (kd. 1864) bi cih bû. Derwêşên ku ji ber rewşa wî ya dînbûyî yên Mûr Elî Baba ku hîna bi tirkî nizanibû bêzar bûbûn, ew giliyê Şêx Îbrahîm Naîbî kirin. Dema ku ew û derwêş ji aliyê fikr û ramanê bi hev nakin, Mûr Elî Baba ji dergahê derdikeve û li taxa Ganemê li dibistaneke wêranbûyî bi cih dibe û ev dibistan bi hezkiriyên Qadirî-Xalîsî tijî dibe (Kıbrıs, 2015: 5). Mûr Elî Baba, ew kesên ku dixwestin li ser esasê terîqeta Qadirî werin cem, ji wan re got ku li gorî dilê xwe ew nikare tiştêkî wiha bike û dema ku ev mesele ji Şêx Evdirehman Xalis re hat gotin, wî Mûr Elî Baba wek çîgirê xwe dest nîşan kir. Mûr Elî Baba, dudil bû ku ew ji bo vê yekê ne şareza ye, bi nameyekê rewşa xwe jî Şêx Evdirehman Xalis re vedibêje, û wî jî şîret li wî kir ku bikeve erbaînekê. Mûr Elî Baba piştî vê erbanê dest bi bi‘et-girtina terîqata qadirî dike û bi fermana Şêx Evdirehman Xalis roja sêşem û îne ji ayîna şerîf a Qadiriyê îcra dike. Dem bi dem ji hin şagird û murîdên wî hin rewşên dînbûnê dihatin dîtin. Ev rewş dibû sedem ku hinek kes nerazîbûna xwe nîşan bidin. Loma jî bi fermana Şêx Evdirehman Xalis ji taxa ku lê dima derket û di sala 1854an de li navçeya *Îmaretê* ya Sêwasê avakirina dergaha derwêş û murîdan tamam kir. Ji bo ku ew dergah di warê aboriyê tengasiyê nekişîne hinek dahatû hatin peydakirin û ji bo dergahê hatin bexşandin.

Mûr Elî Baba li Sêwasê peywira xwe ya rêbertiyê ne tenê bi ziman rave kir, belkî wî bal kêşa

ser giringiya tesewif û terîqetê ku ji bo peyrew û bawermendên xwe. Wî hûrgiliyên seyr û sulûkê vegot, derbarê erkanê Qadirî-Xalisî de hinek dîtin û pêşniyazên xwe, ku ew esas dihesiband, rave kirin. Xebata xwe ya bi navê *Tenbîhu's-Salikîn*, ku tê de helbestên farisî jî hene, di salên 1862-63an de li wir qedand (Kıbrıs, 2015: 6). Mûr Elî Baba li kêleka dergaha xwe dibistaneke ji bo zarokan, Mekteb-i Sibyan, ava kir û ew dibistan bexşande dergahê. Altuncuoxlî Mehmed Efendî, kur û xelîfe wî Evdilqadir Xulamî (kd. 1886) jî li vê dibistanê muelimî kirine û ders dane.

Mûr Elî Baba ku xizmetên xwe yê mezhebî li bajarên derdorê didomand. Li demsala biharê di navbera salên 1862-1865an de li ser vexwendina heval û hogirên xwe- di vê serdanê de bi Ziya Paşa re 'dewletmend, rewşenbîr, rojnamevan û helbestvan'- çû Amasyayê. Amasya (kd. 1880) girêdayî wî bû. Di salên paşerojê de jî hevaltiya wî bi Ziya Paşa re berdewam dike. Her çend Mûr Elî Baba ji aliyê Ziya Paşa, peyrewên wî û şagirdên wî Xeyredîn Efendî û ser-leşker mabeyncî Hecî Elî Efendî ve ji bo Stenbolê bê vexwendin jî, lê bi hinceta ku di navbera qesr û derwêş de tşkiliyeke mentiqî nabîne, ev pêşniyaz red kiriye. Mûr Elî Baba di sala 1870yan de bi kurê xwe yê hivdeh salî, Evdilqadir Xulamî, li Kerkûkê serdana dergaha Telebanî dikin û piştî wefata Şêx Evdirehman Xalis sê mehan ji kurê wî yê mezîn Şêx Elî Telebanî re xizmet dikin. Mûr Elî Baba di 29ê Adara 1878an de dergaha xwe vediguhêzîne weqfê û kurê xwe yê mezîn Evdilqadir Xulamî jî wekî peywirdar tayîn dike. Dema ku li dergahê şêx an xelîfe tunebûn, xelîfeyên dergaha Şêx Evdirehman Telebanî ya li Kerkûkê ji bo dergahê dihatin peywirdarkirin. Mûr Elî Baba derfetên dergaha xwe berfireh dike û Evdilqadir Xulamî yê ku ew wekî peywirdar tayîn kiriye, di 28ê Çileyê 1881ê de weqfeke din amade dike. Bi vekirina şaxeke din a dergaha xwe ya li navçeya Girîn a Sêwasê, hewl da ku bandora şaxa Terîqeta Qadirî-Xalisî li Anatolyayê berfireh bike. Mûr Elî Baba ku li Toqat, Amasya, Sêwas û parêzgehên derdorê bi bandor bû, di sala 1884an de li Sêwasê çû ser dilovaniya xwe. Kurê wî yê mezîn Evdilqadir Xulamî, piştî wî bû postnişînê wî û heta dawîya temenê xwe, sala 1886an, berdewam kir (Kıbrıs, 2015: 7). Tirba Mûr Elî Baba li dergaha ku di Sêwasê de çêkiribû hat definkirin û heta niha jî tîrbeya wî tê ziyaretkirin. Xelîfeyên herî giring Şêx Evdilqadir Xulamî kurê wî yê mezîn û Şêx Bekir Sidqî Efendî (kd. 1924) yek ji nûner û nûnerên herî giring ên Qadirî-Xalisî li Qeremanê û Şêx Qol-axasî Elî Riza Efendî (kd. 1925-30) ne (Kıbrıs, 2015: 49-51).

4.2. Şêx Evdilqadirê Xulamî

Şêx Evdilqadirê Xulamî kurê mezîn ê xelîfê Mûr Elî Baba ye. Di sala 1854an de li Sêwasê hatiye dinyayê. Bi dersên ku ji bavê xwe û Altunoxlî Xoce Mehmed Efendî girtiye, dest bi perwerdeya seretayî kiriye. Paşê perwerdeya xwe li ber destê Îbrahimzade Xoce Mehmed Efendî berdewam kiriye û bawernameya xwe wergirtiye. Wî destkeftiyên xwe yê zanistî û giyanî bêtir bi xwendina xwe ya kesane di bin çavdêriya bavê xwe de bi dest xist. Ji zarokatiya xwe ve derfet dît ku bi Mûr Elî Baba re xwendina berhemên tesewifî ên erebî û farisî bixwîne û car caran jî ketiye bin bandora van berheman. Evdilqadirê Xulamî, di sala 1870an de, dema ku şanzdeh salî bû, li ser xwesteka rûhî ya ku pê hesiya, bi Mûr Elî Baba re, çû dergaha Şêx Evdirehman Xalis Telebanî ya li Kerkûkê. Gava Şêx Elî Telebanî, ew bi nasnavê *Ebu'l-Mehasin ku* di sala 1858an de piştî wefata bavê xwe Şêx Evdirehman Xalis Telebanî, ketibû şûna wî, Xulamî ji sê mehan li dergaha Telebanîyan di xizmeta Şêx Elî de dimîne. Di vê serdemê de Evdilqadirê Xulamî *Kitêba Perîşanî*

ji Evdîlqadir Faîz (kd. 1897), ku bira û xelifeyê sereke yê Şêx Elî Telebanî bû, bi farîsî xwend (Terzibaşı, 2013: 224, Çelik-Çelik, 2010: 98). Dema ku ji Şêx Elî Telebanî re hat gotin ku Evdîlqadirê Xulamî helbestan dinivîse, şêx ew rakir ser lîngan û ferman da ku çend xezalan bixwîne û paşê jî bi dilxweşî ew pîroz kir. Piştî demekê Mûr Elî Baba daxwaz ji Şêx Elî Telebanî kir ku kurê wî Evdîlqadir bi dergah û derwêşxaneyê mîbarek qebûl bike. Şêx Elî Telebanî, Evdîlqadirê Xulamî rakir ser pêyan û bey'ata wî qebûl kir û ew wek xulamê Evdîlqadir Geylanî qebûl kir. Piştî vê rûdanê, Evdîlqadir nasnavê *Xulamî* bi kar anî û piştî demekê li dergaha Telebanî bi ilim û ibadetê re mijûl bû û dûre bi bavê xwe re vejeriya Sêwasê. Hezkerin û hurmeta kûr a Evdîlqadirê Xulamî ya ji bo Şêx Elî Telebanî gelek zêde bû. Ji ber vê yekê wî ew hezkerin û elaqeya xwe bi helbesteke ku metla' û pêşgotinê wê wiha dest pê dike, aniyê zîmen (Terzibaşı, 2013: 224, Çelik-Çelik, 2010: 98):

*Kalbimi bir demde pür nûr eyledi envâr-ı şeyh
Âfitâb-ı manevîdir şüphesiz rûhsâr-ı şeyh*¹

Dîwana Evdîlqadirê Xulamî ya ku helbestên xwe yên ku ji panzdeh-şanzdeh saliya xwe de li Sêwasê dest û li Kerkûkê berdewam kiri bû, ku ji çil û heşt rûpelên mezin pêk tê, di sala 1873an de, çend sal piştî vejerê ji Kerkûkê, temam kiri û di sala 1874an de li Stenbolê li Matbaa-i Amireyê hatiye çapkirin (Terzibaşı, 2013: 226). Di vê dîwanê de ji bilî texmîsan bo xezelen Şêx Evdîrehman Xalîs, her wiha kasideyan ku medha Şêx Evdîrehman Xalîs ji hatine nivîsandin û di şair gelek ciyan de pesnê wî daye (Terzibaşı, 2013: 224). Bo nimûne di beyteke xwe de wiha dibêje:

*Dem-â-dem derd ü efgândır işim senden meded Hâlis
Enin ü âh u sûzândır işim senden meded Hâlis*²

Xulamî ji helbestvanan herî zêde ketiyê bin tesîra Şêx Evdîrehman Xalîs Telebanî (Çelik-Çelik, 2010: 109-117). Evdîlqadirê Xulamî yek ji mufetîşên perwerdeyê yên ewil ên Sêwasê ye û demeke dirêj mamostetî jî kiriye. Paşê, ew ji me'arifê derketiyê û dest bi karê hesabdariyê kiriye û paşê li ser daxwaza xwe dev ji karmendiyê berdaye. Mûr Elî Baba, kurê xwe Evdîlqadirê Xulamî, yê ku berî mirina xwe ew hem wekî peywirdar û hem jî wekî xelîfe dest nîşan kiribû, piştî mirina bavê xwe cihê wî rûnişt. Evdîlqadirê Xulamî ku di sala 1886an de di temenekî ku mirov dikare ciwan bihesibîne di dawîya jiyana bi bereket a sî û du salan de koça xwe ya dawîn dike û li kêleka tirba bav û mamosteyê xwe Mûr Elî Baba, li qebriştana li dergahê hate defînkirin. Piştî wefata Evdîlqadirê Xulamî birayê wî Şêx Seyfedîn Efendî li şûna wî rûnişt. Kesayetiyên wekî Sirri Paşa û Abîdîn Paşa, waliyên Sêwasê, ji çand û zanîna bilind a Xulamî sîd wergirtine. Bi taybetî Sirri Paşa piştî wefata Xulamî gelek xemgîn bûye. Evdîlqadirê Xulamî, bi rayedarên dewleta Osmanî yên wek Esad Paşa, Halet Paşa û Ehmed Îzzet Paşa re jî têkilî danî bû. Qazancîzade Emîn Edîb Efendî, ku di nav helbestvanên Sêwasê de xwedî cihêkî giring e, ji Xulamî fêrî farîsî bûye. Evdîlqadirê Xulamî, helbestvanekî berhemdar bû û bi hêsanî dinivîsî. Ew di bin bandora Fuzûlî de maye û gelek helbestên wî nivîsandine û heyraniya xwe bi çêkirina nezîreyan di xezelên xwe de jê re aniyê zîman. Wî li ser helbestên şairên sofî yên ku bi farîsî nivîsîne, wek Evdîrehman Camî,

¹ Werger: *Nûra şêx ji nişka ve dilê min tije nûr û ronahî kir / Bêguman rûyê şêx rojê manewî ye.*

² Werger: *Ez her gav bi tengahiyê diqîrim, karê min ew e ku alîkariya te bixwazim, Xalîs / Tim bi nalîn û ax û feryad im, karê min ew e ku alîkariya te bixwazim, Xalîs.*

texmîs nivîsîne û bi vî awayî eleqeya xwe bi vî zimanî û helbestvanên wî re di asteke bilind de nîşan daye. Herwiha Xulamî ji bo şêxên terîqeta Qadirî-Xalisî ku endamê wê bû, helbest nivîsîne. Zimanê ku Xulamî di helbestên xwe de bi kar anîye, bi îmajên termînolojiya sofîtiyê pêçayîye û pir giran e. Di hin dubendiyên wî de tê dîtin ku peyvên tirkî jî nehatine bikaranîn. Xulamî ku destnivîsa wî bi qasî ya xettatekî rind e, du berhemên xwe, *Tacu'l-Muheqqiqîn* û *Miracu'l-Muştaqîn*, bi destnivîsa xwe nivîsandine. Evdîlqadirê Xulamî yê ku demeke kurt jiyaye, di 14ê Adara 1876an de kurê wî yê bi navê Fezlûllah çêbûye. Fezlullah Efendî yê ku piştî Qanûna Paşnavê, paşnavê *Moral* bi kar anîye, di 11 saliya wî de bapîrê wî, Mûr Elî Baba û di 13 saliya wî de jî bavê wî Evdîlqadirê Xulamî çûne rehmê. Fezlullah Efendî ku di atmosfera zanistî û manewî ya dergahê de mezin bûye û wek kal û bavê xwe zimanê erebî û farisî baş zanibûye û li parêzgehên wek Amasya, Toqat, Riha û Mêrdînê mamostetî kiriye û li medreseya *Séwas Daru'l-Xilafeyê* jî ji bo demeke dirêj gerîndetî kiriye (Kıbrıs, 2015: 46-49).

4.3. Şêx Siddîq Evdîlqadirê Erbilî

Şêx Evdîlqadir Hewlêrî xelîfeyê Şêx Evdirehman Xalis e û yek ji zanayê dînî yê wê serdemê ye. Di destpêka sedsala XIX-an de li Hewlêrê ji dayîk bûye, di sala 1898an de li Rihayê di 91 saliya xwe de koça dawî kirîye û li kêleka dergâ

ha Xelwetî ya li vî bajarî li goristanê hatiye veşartin. Di çavkaniyan de navê wî wek Evdîlqadir Siddîqî, Evdîlqadir Kemaleddîn û Evdîlqadir Erbilî derbas dibe. Li gorî nivîsa ku li ser tîrbeya wî hatiye nivîsandin nasnameya wî ya tevahî Ebû Muhemed Muhyeddîn es-Seyîd eş-Şêx Evdîlqadir eş-Şerîf Muhammed Muhyeddîn es-Sidiqî el-Erbilî ye (Tenik: 2015: 39). Di çavkaniyan de tê gotin ku ew murîd û xelîfeyê Şêx Evdirehman Xalis bûye û ji terîqeta Xelwetîyê û Neqşîbendîyeyê jî îcazeya terîqetê wergirtiye. Hewlêrî bi salan şagirdê Şêx Evdirehman Xalis bûye. Sulûka xwe li ba wî temam kiriye û heta pêncî saliya xwe, yanî heta ku hatiye Rihayê, dest ji jiyaneke tesewîfî nekişandiye. Heke em kurdên ku li erdnîgariya Iraqê dijîn nehesibînin, di sala 1859an de hatiye şaxa Qadirî-Xalisî ya Rihayê ya ku herî zêde peyrewêrên wê bûn. Di heman salê de şêxê wî, Şêx Evdirehman Xalis çûye ber dilovaniya Xwedê. Piştî qedandina dergaha ku li Rihayê çêkiribû, Saqîb Efendî, ku peyrewê terîqeta Qadirî bû, ji Şêx Evdirehman Xalisê ku jê re digot “murşîdê agah” re ragihand, ku ji bo rêvebirinê şêxek lazim e. Li ser vê daxwazê Şêx Evdirehman yek ji xelîfeyên xwe, Evdîlqadir Hewlêrî, şand vî bajarî. Hewlêrî heta mirina xwe li vî bajarî maye û xizmeta mezheba Qadirî-Xalisî kiriye. Herwiha Hewlêrî navê sofîyê yekane wergirtiye yê ku herî zêde di nav derdorên dînî yên vî bajarî de nivîsandiye (Tenik, 2015: 69-70).

4.4. Şêx Seyîd Dede Osman ‘Ewnî er-Ruhawî

Şêx Dede Osman Ewnî yan jî Seyîd Dede Osman er-Ruhawî şêxekî giring ê Qadirî-Xalisî ye ku li Rihayê ji dayîk bûye, mezin bûye û demeke dirêj di nav terîqetê de xizmet kiriye. Dede Osman Ewnî ne tenê şêxekî terîqeta Qadirî ye, di heman demê de muntisîbê terîqeta Neqşîbendîyeyê ye jî. Mêjûya jidayîkbûna Dede Osman Ewnî tam nayê zanîn. Li ser kêlikê gora Dede Osman Ewnî ku di goristana Mizgefta Dergahê de ye, hatiye nivîsandin ku bav û kalê wî şêx û seyîdên terîqetê bûn, yanê ew ji malbateke ehlê terîqetê ye. Bavê wî Evdal Muhamed (kd. 1814) û bapîrê wî Eyûb (kd. 1781), ku di nav

gel de bi navê Derwêşê Eyûb dihat nasîn, bi salan wek xelîfeyên giring yê terîqeta Qadirî xizmet kirine. Dede Osman Ewnî piştî wefata bapîrê xwe Derwêş Eyûb Urfewî, li dû Şêx Evdîrehman Xalis Telebanî çûye. Perwerdeya xwe ya ewil li medreseyên herêmê, bi taybetî jî li Medreseya Ridwanîyeyê, ku medreseya navdar a Rihayê bû, wergirtiye. Ji ber meyla tesewifî ya ku ji malbata wî dihat, li cem bavê xwe dest bi xwendin û perwerdeya sofîtiyê kiriye. Piştî çûye Hewlêrê û li cem şêxê xwe Evdîrehman Xalis Telebanî perwerdeya tesewifê wergirtiye. Piştî ku xwendina xwe qedand û bawernameya terîqetê ji Şêx Evdîrehman Xalis Telebanî wergirtiye, demeke dirêj li Mizgefta Dergah a Rihayê wek şêxê Qadirî ya şaxa Xalîsiyeyê, xizmeta terîqetê kiriye. Dede Osman Ewnî di sala 1883an de piştî jiyana zêdeyî nod salî li Rihayê wefat kir û li cihê ku bi salan li wir xebata dînî dikir, li Mizgefta Dergahê hat defînkirin. Li ser tabelaya li ber goristana wî, Dede Osman Ewnî Baba ji xulefaya Qadirî, hatiye nivîsin (Tenik, 2018: 39-40). Seyîd Dede Osman Ewnî Baba bîrmend û sofîyekî mezin e ku li Rihayê mezin bûye. Di heman demê de Şêx Evdîrehman, yek ji xelîfeyên herî giring e ku ji aliyê Xalis Telebanî ve hatiye perwerdekirin û wî jî bo belavbûna Xalîsiyeyê li Anatolyayê roleke mezin lîstiye. Dede Osman Ewnî ku heftê sal xizmeta tesewif û terîqetê kiriye, bi rewş û zanîna xwe ya dînî tesîreke mezin li mirov û sofîyên derûdora xwe kiriye. Ji ber ku piştî wî tu kurên wî tunebûn, xelîfeyên ku dê xizmetên mezhebê bikin li pey xwe hiştine. Van xelîfeyan di belavbûna şaxa Xalîsiyeyê ya terîqeta Qadirî de li Anatolyayê xizmetên giring kirin (Tenik, 2018: 45). Ji van sofîyên herî giring ên ku para wan di belavbûna Xalîsiyeyê de li Anatolyayê hebû, Hafîz Xelîl Efendî yê Besnîyî (kd. 1907), Mustefa Baba yê Dilokî (kd. 1921) û bêguman Hecî ‘Umer Xudayî Baba (kd. 1905) ye.

4.5. Hafîz Xelîl Efendî

Hafîz Xelîl Efendî, yek ji şêxên Xalîsî yê herî giring e, ku piştî Dede Osman Ewnî li Rihayê di sala 1832an de hatiye dinyayê û li wir perwerdeya xwe qedandiye. Dema ku li Rihayê di gelek mizgeftan de peywira melatîyê dikir, li cem Dede Osman Ewnî perwerdeya tesewifê girtiye. Bi fermanekê fermî di sala 1880î de wekî melayê Mizgefta Mewlîdê Xelîl hatiye peywirdarkirin. Paşê îcaznameya terîqeta Qadirîyê ji Dede Osman Ewnî wergirtiye. Hafîz Xelîl Efendî ku bi wefata Dede Osman Ewnî re, di zawayîya Mewlîdê Xelîl de dest bi peywîrê kiriye. Wezîfeya xwe wekî xelîfeyê şaxa Xalîsiyeyê ya terîqeta Qadirî berdewam kiriye. Di sala 1907an koça dawî kiriye û li rex tirba Dede Osman Ewnî hatiye defînkirin ya ku di goristana Mizgefta Dergahê de cih digire (Tenik, 2018: 46).

4.6. Mustefa Baba yê Dilokî

Xelîfeyê Dede Osman Ewnî yê Dilokê ye. Mustefa Baba li Dilokê hatiye dinê. Derbarê mêjû û cihê jidayîkbûyîn û perwerdeya wî de û kengê û çawa întisabî terîqeta Dede Osman Ewnî kiriye agahî nîne. Li ser kêlikê tirbeyê ku di tirba şêxên Qadirî de li kêleka Mizgefta Dergahê ye wiha hatiye nivîsandin: Di sala 1921an de li Rihayê wefat kir û li tirba Hafîz Xelîl Efendî, xelîfê Rihayê ya Dede Osman Ewnî ku çardeh sal berî koça dawî kirîbû, hat veşartin. Li gorî nivîsa ku li ser kêlikê Mustefa Baba hatiye nivîsandin, ev xelîfeyê Dede Osman Ewnî yê Dilokê ye. Ji ber

ku Dilok nêzikî Rihayê ye, wisa tê fêmkirin Mustefa Baba gelek caran murşîdê xwe yanê Dede Osman Ewnî ziyaret kiriye. Ji ber ku zêde ji şêxê xwe hez kiriye, her tim li Rihayê li cem wî bûye û li wir jiyana xwe ji dest daye (Tenik, 2018: 47). Herwiha îhtimal heye ku ev kes heman kesê Hisnê Mensurî (Semsûrî) Sarî Şêx Mustafa Efendî be jî (Yüksel, 2018).

4.7. Şêx Seyîd Hecî Omer Xudayî Babayê el-Mûrîwî

Yek ji navên din ên giring ên şaxa Xalisiyeyê ya li Anatolyayê Omer Xudayî Baba ye ku bi eslê xwe ji Xarpêtê ye. Di sala 1811an de li gundê *Mûrî* yê ku navê wî yê niha *Yünlüce* ye, li Elezîzê ji dayik bûye (Çelik-Dumlu, 2018: 91). Li ser vî gundî wekî el-Mûrîwî jî tê binavkirin (Tenik, 2018: 45). Berî ku tev li şaxa Xalisiyeyê bibe, ew întisabî Muhemed Heyat Wehbî Efendî yê Erzinganî (kd. 1848) kiriye ku bi navlêka *Terzî Baba* deng dabû dinê. Wehbî Efendî Erzinganî yek ji xelîfeyên Şêx Evdilâh Mekkî el-Erzinganî ye ku ew ji xelîfeyê Mewlana Xalidê Şarezorî (kd. 1827) bûye li herêma Erzingan û Erziromê. Li ser daxwaz û şîreta Wehbî Efendî, girêdayîna wî bi Şêx Omer Nûranî yê Erebgirî (kd. 1898) çêbû û lê îcaznameya Neqşî-Xalidî ji wî wergirtiye. Piştî demekê Şêx Omer Nûranîyê Erebgirî, Omer Xudayî Baba şand cem Dede Osman Ewnî, ku xelîfe û nûnerê herî giring ê Evidirehman Xalis Telebanî bû li Rihayê, da ku îcaznameya Qadirî bigire. Omer Xudayî Baba, biryar da ku li cem Osman Dede bimîne û îcaznameya Qadirî-Xalisî ji wî wergirt û paşê vegeriya Xarpêtê û li gundê Kovenkê bi cih bû ku niha girêdayî navenda Elezîzê ye û navê wî yê niha *Guntaş/Çağlar* e. Hecî Omer Xudayî Baba di sala 1905an de wefat kir û tirba wî li vî gundî ye (Yüksel, 2018: Nîşe: II). Gelek xelîfeyên wî hebûn û di nav wan de yê herî giring Hecî Muherem Hilmî Efendî (kd. 1964) ye. Ew yek ji xelîfeyên giring ên Hecî Omer Xudayî jî Hecî Muhemed Baba Kûrkî (kd. 1927) ye, ku di heman demê de şêxê Mustefa Xeyrî Baba yê Meletiyî bû. Xelîfeyekî din ê giring jî Şêx Mustefa Efendî ye Gullî ye. Xelîfeyê Şêx Mustefa Gullî Efendî jî şêxê Elezîzê yê Cafer Teyyar Şaşmaz (kd. 1973) e ku ew ji yek kurden zaza bûye (Yüksel, 2018: Nîşe: II). Kesên ku îro di silsîleya Qadirî-Xalisî de cih digirin ew in ku wan kesan bi têkiliya Omer Xudayî Baba û ji ber ku girêdayî wî bûn, bûne xelîfe û îrşadekerê vê terîqatê:

- 1- Şêx Seyîd Hecî Mustefa Xeyrî yê Meletî (kd. 1979)
- 2- Xeyru'n-Nîsa Xedîcetu's-Suxra
- 3- Şêx Mustefa yê Sêwasî
- 4- Şêx Kerem ê Ercîşî
- 5- Şêx Niyazî yê Meletî
- 6- Şêx Mustefa yê Qersî
- 7- Şêx Muhemed Selîm ê Kemalî
- 8- Fatima Enqerewî
- 9- Şêx Evdilâh ê Trabzonî
- 10- Şêx Seyîd Mustefa Yaşar ê Goletderewî
- 11- Şêx Enwer Karakaş

Çar ji wan xwediyên şaxan in:

- 1- Yaşariyye, Şêx Seyîd Mustefa Yaşar Goletderewî

- 2- Keremiyye, Şêx Kerem ê Ercişî
- 3- Niyaziyye, Şêx Niyazî Meletî
- 4- Salimiyye, Şêx Muhemed Salim Kemalî (Çelik-Dumlu, 2018: 99-100).

Çend murşîdên Qadiriyye/Xalîsiyê ku di nav silsîleya Omer Xudayî Baba de cih digirin ev in:

1. Şêx Seyîd Hecî Muhemed Baba yê Kûrkî
2. Şêx Ehmed Cemalî (Wisalî)
3. Şêx Mistefa Baba yê Gullî
4. Şêx Hemze Baba
5. Şêx Şukrî Baba
6. Şêx Miherem Hilmî Efendî
7. Şêx Mehemed Baba yê Tepecikî
8. Şêx Mehemed Baba yê Perçençî
9. Şêx Mihemed Emîn Baba yê Îzolî
10. Evdilâh Fexrî Baba yê Xarpûtî
11. Şêx Heqî yê Boranî
12. Şêx Heyder ê Elezîzî
13. Şêx Îbrahîm ê Palewî
14. Şêx Doxan ê Babayî
15. Şêx Mustefa ê Borlî
16. Şêx Muhemed ê Kilîsî
17. Şêx Muhemed ê Memudawî
18. Şêx Muhemed Baba
19. Evdilâh Efendî
20. Şêx Seyîd Muhemed Nûrûllah Kogengî (Çelik-Dumlu, 2018: 111-112).

4.8. Sahibu'z-Zeman Şêx Seyîd Hecî Muhemed Baba yê Kûrkî

Sahibu'z-Zeman Şêx Seyîd Hecî Muhemed Baba yê Kûrkî yek ji xelîfeyên herî giring ê Omer Xudayî Baba ye. Wisa tê texmînkirin ku şaxa terîqeta Qadiriye/Xalîsiyeyê ya li derdora Elezîz û Meletiyê ji aliyê wî kesî ve heta roja îro hatiye (Çelik-Dumlu, 2018: 111). Herçiqas derbarê jiyana wî de agahî kêmbin jî, li gundê *Kûrkê* yê girêdayî navçeya *Sivriceya* Elezîzê ji dayîk bûye. Li wê herêmê ji malbata wan re *Xafuroxillari* hatiye gotin, erdê xwe yê li gund firotiye û ji bo ku nêzikî Şêx Omer Xudayî Baba bibe, çûye gundê Kovenkê. Dîsa tê zanîn ku ew li wir bi cih bûye û heta sala 1927an li vir di xizmeta şêxê xwe de jiyaye. Piştî wî Hecî Mustefa Xeyrî Baba meletiyê wezîfeya rêbertiyê girtiye ser milên xwe. Gora wî li kêleka şêx û murşîda wî li gundê Kovenkê ye û cihê ziyareta ehlê muhebet û îşqê ye.

4.9. Şêx Seyîd Hecî Mustefa Xeyrî Meletî (Xeyrî Baba)

Mustefa Xeyrî Baba, ku bi navlêka *Arifê Billah* navdar e, kurê Mustefa Begê Kurd ê Meletî ye ku bave wî di artêşa Osmanîyan de serbaz bûye. Di sala 1895an de li Meletiyê hatiye dinyayê, li Stenbolê di dibistana Rûşdiye û Harbiyeyê de xwendîye. Di Şerê Cîhanê yê ewil de li Medîneyê

peywirek wergirtiye. Paşê vegeyriyaye welatê xwe û bi girêdayî Hacî Muhemed Babayî Kûrkî, yek ji xelîfên Şêx Omer Xudayî Baba tevî terîqeta Qadirî-Xalîsiyê bûye û jê xilafeta terîqetê wergirtiye. Bi salan şêxîti kiriye û di 84 saliya xwe de, di 17ê Îlona 1979an de li mala xwe ya li Sûadiyeyê- li Stenbolê-wefat kiriye. Tirba wî li Trabzonê, Akcaabatê ye û bi qasî 10 xelîfeyên wî hene. Yek ji wan xelîfeyên giring jî Evdileh Demircioxlî yê Maçakyî ye û hê jî sax e (Yüksel, 2018).

4.10. Hecî Miherem Hilmî (Kosetürkmen) Efendî yê Xarpêtî

Hecî Miherem Hilmî Efendî, ji gundê Sarilî ya Xarpêtê ye. Di sala 1878an de li vir hatiye dinyayê. Piştî ku bi malbata xwe re li gelek gundan geriyaye, di sala 1905an de li Xarpêtê bi cih bûye. Demekê li medreseya Hecî Evdilah Efendî xwendiyê û piştê jî li Erziromê çûye leşkeriyê. Li Erziromê wekî karmend û melayê tabûrê wezîfe girtiye. Li Bedlîsê, ku lê leşkeriya xwe berdewam dikir, tevî kufrewî bûye û di bin çavdêriya wî de îcazeta xwe ya terîqetê wergirtiye (Yüksel, 2018). Piştê ew şandin Yemenê û li Yemenê wek melayê tabûrê xebitî û dersên tirkî dida zarokên ereban. Ji Yemenê vegeyriya, li herêma Hicazê hat wezîfedarkirin. Piştî ku sal û nîvekê li Medîneyê dimîne û paşê diçe Erziromê û li medreseya Edîb Efendî dixwîne û bawernameya xwe distîne. Di sala 1926an de vedigere cihê jidayikbûna xwe, anku Elezîzê. Miherem Efendî yê ku dema Qanûna Paşnavê hat derxistin paşnavê Kosetürkmen girtibû, di 10ê Kanûna 1964an de li Elezîzê jiyana xwe ji dest da û li wir hat definkirin. Hilmî Efendî di tesewîfî de bûye xwediyê îcazeta xwe ya terîqetê. Wekî ku tê zanîn ji Omer Xudayî Baba îcazeta Qadirî-Xalîsî, ji Evdilbaqî Bedlîsî îcazeta Neqşibendiyê, ji Hecî Mustefa Efendî yê Çorimî îcazeta Şazeliyê, ji Şêx Muhemed Efendî îcazeta Kubrewiyê, ji Seyîd Elî Riza Ahiskawî îcazeta Ekberiyê û ji Ehmet Baba Senamîrî jî îcazeta Rifaiyê wergirtiye. Herwiha Hilmî Efendî bi baweriyaya ku “Rêya Pêxemberê me evin e” jîyaneke pak û paqij jiyaye (Ateş, 2002: 275). Hilmî Efendî yê ku di şî‘rên xwe de mexlesa *Sirrî* bi kar aniyê, dîwaneke wî ya birêkûpêk heye û ji bilî vê hin berhemên yê wekî *Mew’izyê Hilmiye*, *Ezkarê Îlahiyye Lisalîqi’-Terîqati’-l-Qadirîyye*, *Rîsaleyên* li ser Neqşibendiyê jî hene. Hinek ji van berhemên Hecî Miherem Hilmî Efendî jî aliyê Süleyman Ateş hatiye weşandin ku ew jî murîdekî wî bû (Yüksel, 2018).

4.11. Xelîfeyê Şêx Elî Telebanî û Serokê Meclîsa Meşayîx; Mustefa Saffet (Yetkin) Efendî

Mustefa Saffet Yetkin, serokê meclîsa meşayîx û parlementerê Rihayê, xelîfeyê herî giring ê Şêx Elî Telebanî yê kurê Şêx Evdîrehman Xalîsiyê li Anatolyayê. Li gor hin çavkaniyan (Ülker, 2013: 506) zavayê Şêx Evdîlqadirê Hewlêrî, Şêx Mustefa Saffet Efendî, kurê Kemaleddîn Evdîlqadir Efendî yê Rihayî, bi eslê xwe kurd e û di sala 1866an de li Rihayê hatiye dinyayê. Xwendina xwe ya seretayî li Rihayê qedandiye. Piştê çûye Qahîreyê û çar salan li Ezherê xwendina xwe domandiye. Piştî ku ji Misirê vegeyriya, wî di nav xelesa dersdayînê ya muftiyê berê yê Rihayê, di dersên Evdîletîf Efendî de cih girt û îcazeta xwe ya terîqetê wergirtiye. Di sala 1900î de li Mekteba İdadî ya Rihayê wek mamosteyê dersên farîsî û exlaqê dest bi karûbarê dewletê kir. Di sala 1906an de demekê li Dadgeha Bîdayeta Rihayê jî wekî endam peywir wergirtiye. Bi vî awayî hem di nav şêxan û hem jî di nav sûfiyan de cî girtiye. Wî îcazeta xwe ya terîqetê jî Şêx Elî Telebanî wergirtiye ku ew xelîfeyê wî bû. Di 22ya Teşrinê Ewîl a 1324/4 Sermaweza 1908an de ji listeya İttîhad û Teraqî di Meclîsa Destûra Bingehîn de wek parlementerê Rihayê hat hilbijartin.

Parlamenteriya wî heta 21ê Tîrmeha 1916an ku wekî serokê Meclisa Meşayîh hat tayînkirin û bi navber berdewam kir. Di vê heyamê de ji ber ku meclis du caran hat fesihkirin, parlamenteriya wî jî hat fesihkirin. Dîsa bi kovara *Tasavvuf Mecmuası* ya hefteyî ya ku di serdema Destûra Binge-hîn a 1911an de weşandibû, navdar bû. Di vê kovarê de nivîskarên navdar ên wekî Şêxulîslam Haydarîzade Îbrahîm Efendî û Şêx Esad Efendî yê Erbillî jî gotarên xwe dinivîsîn. Di 9ê Adara 1917an de ji peywira xwe ya Serokatiya Meclisa Meşayîx ya ku di 21ê Tîrmeha 1916an de dest pê kiribû, hate girtin. Di sala 1916an de wek serokê *Meclisa Tedkîkê Mesahîfê Şerîfe û Muellefatê Şer'îyye* hat tayînkirin. Wî ev peywira xwe ya ku bi navber berdewam dikir, terikand û di meha tîrmeha 1919an de wek endamê Daru'l-Hikmetu'l-Îslamiyye di nav desteya Şêxulîslam de hate tayînkirin. Ji ber ku ev rêxistin di meha Mijdara 1919an de ji holê hat rakirin, dawî li wezîfeya wî hat û ew bê kar ma. Di dema hukûmeta Meclisa Neteweyî ya Mezin a Tirkîyê de vê carê çû Enqereyê û di 11ê Tebaxa 1923an de bû parlamenterê Rihayê û ji ber hêrsa xwe ya li hember xanedan û şêx, ji ber ku di serdema Makezagonê de derweşxaneyek jê re nehatiye veqetandin, di Meclisa Neteweyî ya Mezin a Tirkîyê de di rakirina xilafetê û girtina derweşxane û zawiyeyan de roleke giring list. Di encama vê hêrsê de; zagona Jiholêrakirina Xilafetê û derxistina malbata xanedana Osmaniyan ji bo derveyî welêt, bi pêşniyaza Şêx Saffet Efendî û pêncî hevalên wî, di 3ê Adara 1924an de, derket. Ji ber vê sedemê hin şairên ku endamên terîqetê bûn, derbarê vê yekê de hin hicwiye gotin. Di hin çavkaniyan de jî heye ku di wan salan de beşdarî meclîsên ne dînî û bêexlaqî jî bûye. Şêx Saffet Efendî di çapa yekem a *Mesnewiyê Nuriye (Qetre)* ya erebî ya Bediuzzeman Seîde Nursî, teqriz nivîsiye. Şêx Saffet Efendî jî wek endamê *Daru'l-Hikmetê Îslamiyye* ku di nav desteya Şêxulîslam de hatibû avakirin, digel Bediuzzeman xizmet kiriye. Herwiha du berhemên wî yên çapkirî yên bi navê *Ulum-i Şer'îyye ve Asrî Müceddidlerimiz* (Ulumê Şerî'etê û Muceddidên Serdema Me) û *Tasavvufun Zaferleri* (Serfiraziyên Tesewwifê) hene (Ülker, 2013: 507). Berhema bi navê Serfiraziyên Tesewwifê bersiv e ji bo tiştên ku Îsmail Heqqî İzmirî ku li ser sofîgeriyê nivîsiye. Herwiha xezel û qesîdeyên wî yên çapkirî jî hene. Şêx Saffet Efendî *Heyâkîlu'n-Nûr* a Meqtûl Şihabeddîn Suhrewerdî (kd. 1191) û *Hikema* Etaullah Îskenderî (kd. 1309) û *Lemaat* a Fexreddînê Iraqî (kd. 1289) wergerandine ser zimanê tirkî. Ev hemû werger jî ji aliyê weşanên Wezaretê Perwerdehiyê (MEB) ve hatine weşandin. Di sala 1927an de dev ji parlamenteriya wî jî siyaseta aktîf berdide û di 27ê Cotmeha 1950î de li Stenbolê jiyana xwe ji dest dide. Herwiha Şêx Saffet (Yetkîn) bavê Suad Kemal Yetkin (kd. 1980) û kalikê Çetin Yetkin e (Yüksel, 2018).

Encam

Damezrênerê şaxa terîqeta Qadirî-Xalisî, Şêx Evdirehman Xalis Telebanî, ji serdema Siltan Evdilmecîd vir de, xelîfeyên xwe şandibû bajarên cuda yên Anatolyayê. Van xelîfeyan li navedên cuda yên Anatolyayê hin zawiye û derweşxane ava kirin an jî di zawiye û derweşxaneyên heyî de xebatên rêberî û irşadê kirin. Bi vî awayî, wan piştrast kir ku ev şaxa terîqetê ku ji aliyê şêxên wan ve hatibu pêşxistin li seranserê Anatolyayê belav bibe. Şaxa Xalisiyeyê ya terîqeta Qadirî, bi xêra xelîfeyên Şêx Evdirehman Xalis ê wekî; Mûr Elî Baba li herêmên Anatoliyayê, Sêwas, Toqat û Amasyayê; bi xêra Şêx Evdilqadir Hewlêrî û Dede Osman Ewnî Baba li herêmên Riha, Dîlok û Besnîyê; bi xêra Hecî Omer Xudayî Baba jî li herêmên Elezîz, Xarpêt û Meletiyê belav bûye. Bi xêra xelîfeyên ên navborî jî li gelek deverên wekî Erzirom, Qereman, Stenbol, Trabzon, Qers û Ercîsê belav bûye. Bandora malbata Şêx Telebanî, ku qesra Osmanî û rayedarên dewleta Osmanî jî ji wan hez dikir, dem bi dem piştgirî û parastina wan dikir, carnan jî îradeya xwe ji bo wan

diyar dikir li Anatolya û Tirkiyeya nû, wek bandora Mewlana Xalîdê Şarezorî ya li Anatolî û Tirkiyê ye. Nûnerên herî giring ên terîqeta Qadiriye, ku piştî Neqşî-Xalîdiyê li Tirkiyeyê herî zêde tê hezkirin, bê guman malbata Şêx Telebanî ye. Helbet mirov dikare behsa bandora vê malbatê bike, xasseten ya tesewifî, edebî û dînî ya bê navber û nêzî sedsalekê ku li Tirkiyeyê berdewam kiriye. Herwiha dîsa dikare bê gotin ku ev bandor rasterast nebe jî hê jî berdewam dike. Wekî ku di vê lêkolînê de jî tê dîtin, sofiyên kurd di sedsalên XVIII û XIX-an de, wekî ku di sedsalên berê de sofiyeyê anîne Anatolyayê. Sofiyeyê kurdî jî bilî bandora xwe ya dînî û tesewifî ya li ser Anatolyayê, bandoreke giran li jiyana çandî jî kiriye. Herwiha jî bilî vê, ew bandor xwedî gelek hêl û motîfên cuda ne. Ji ber vê yekê, ev mijara navborî li ber lêkolîneran û di biwarên lêkolîn û dîsîplînên cihêreng de radiweste.

Di dawiyê de, têgihîştin û awayê jiyana tesewifî, herçiqasî di erdnîgariya kurdî de belav bibe jî, bêtir ji xavbûna xwe winda bike, heya roja me ya îroyîn maye û malbata şêxen Telebaniyan jî tenê mînakê jî wan e. Bê guman ew tekilî di nav sînoren çanda xwe de nemaye, bandor li erdnîgariyên cuda jî kiriye. Herwiha têkiliyên sedem-encamê yên vê mijarê ên cuda jî hene. Lêbelê ev tekilî pir berfireh in ku li benda lêkolînên nû ne.

ÇAVKANÎ

Abu-Manneh, B. (2012). “Vali Necip Paşa ve Irak’ta Kadiriyye Tarikatı”, *Tarih Kültür ve Sanat Araştırmaları Dergisi*. 1/3. Karabük.

Ahmad, H. O. (2022). “Name-yi 123 Nefer ez Deraviş ve Mensuban-i Şeyh Ali Hâlis Tâlabânî der Şehr-i Senendec be Devlet-i Osmanî”, *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*. 8/15. Bingöl.

Ahmedî, C. (1395). *Tarixê Edebiyata Kurdî, Ez Axaz ta Cengê Cihaniye Evvel*, Seqiz: Gotar.

Akot, B. (2011). *Müştak-ı Bitlisi*, İstanbul: İnsan.

Ateş, S. (2002) “Muharrem Hilmi Kösetürkmen”, *DİA*, c.26, 275-276. Ankara.

Ateş, S. (2004). *İslam Tasavvufu*, İstanbul: Yeni Ufuklar Neşriyat.

Başçı, V. (2020). *Çok Dilli Bir Hiciv Ustası, Kadiri-Hâlisi Şeyhi Rıza Talabanî ve Türkçe Şiirleri*, İstanbul: Avesta.

Başçı, V. (2022). *Şeyh Ubeydullah Nehrî ve TuHFetü’l-Ahbâb Mesnevîsi*, İstanbul: Avesta.

Bayrak, Mehmet (2004). *Kürdoloji Belgeleri II*, Ankara: Özge.

Bruinessen, M. v. (2015). *Ağa, Şeyh, Devlet*, çev. Banu Yalkut, İstanbul: İletişim.

Çabuk, F. (2013). “II. Abdülhamit Dönemi Osmanlı – İran İlişkilerinde Kürt Aşiretleri Meselesi, *Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi*, Erciyes Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Tarih Anabilim Dalı Yakınçağ Tarihi Bilim Dalı. Kayseri.

Çelik, İ., (2019). “Tâlabânî, Abdurrahman Hâlis”, *TDV İslam Ansiklopedisi*, Ek-2, 575-576. İstanbul.

Çelik, İ., Çelik İ. (2010). “Bir Sufi Şair: Abdülkâdir-i Gulâmî”, *A. Ü. Türkiyat Araştırmaları Enstitüsü Dergisi*. 42.

Çelik, İ., Dumlu M. (2018). “Kâdiriyye Tarîkatı Hâlisiyye Şubesi Mürşidlerinden Elazığlı Hacı Ömer Hüdâyî Baba, Hayatı Eserleri Fikirleri”, *Gümüşhane Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, 7/14.

Çetinsaya, G. (1999). “II. Abdülhamid Döneminde Kuzey Irak’ta Tarikat, Aşiret ve Siyaset”, *Divan*, 2. İstanbul.

Edmons, C. J. (1923). "A Kurdish Lampoonist: Shaikh Riza Tâlabânî", *Journal of The Royal Central Asian Society*, V. 22, 111-123.

Edmons, C. J. (2003). *Kürtler, Türkler ve Araplar*, (Wer. Serdar Şengül & Serap Ruken Şengül). İstanbul: Avesta.

Hamad, K. O. (2015). "Abdulkadir Talebânî'nin (Fâiz) Türkçe Şiirleri (İnceleme- Gramer- Sözlük)", *Basılmamış Yüksek Lisans Tezi*, Selçuk Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Türk Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı Türk Dili Bilim Dalı, Konya.

Hurşîd Paşa, M. (1977). *Seyâhatnâme-i Hudûd*, (Çevirimi yazı: Alâattin Eset). İstanbul: Simurg.

Işık, İ. S. (2017). *A'dan Z'ye Kürtler, Kişiler, Kavramlar*, Kurumlar, İstanbul: Nûbihar.

Karademir, N. (2016). *Sultan Abdülhamid ve Kürtler*, İstanbul: Nûbihar.

Karademir, N. (2017). *Osmanlı'nın son yüzyılında Kürtler, Modernleşme, Merkezîyetçilik ve İsyan*, İstanbul: Nûbihar.

Kemal İnal, İbnü'l Emin M. (1988). *Son Asır Türk Şairleri cüz. VII*, İstanbul: Milli Eğitim Basımevi.

Kıbrıs, M. (2015). "Mûr Ali Baba ve Tenbîhü's-Sâlikîn İsimli Eseri (Metin ve İnceleme)", *Marmara Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Temel İslâm Bilimleri Anabilim Dalı Tasavvuf Bilim Dalı*, İstanbul.

Kurdo, Prof. Q. (1992). *Tarîxa Edebyata Kurdî*, Ankara: Özge.

Nadirî, A. (1395). "Tehlîlê Însanşinaxtê Terîqatê Qadiri-Telebanî der Mentiqeyê Ovramanâtê Lehûn", *Mecelle-i Ferheng-İrtibatat*. 17/33.

Nikitine, B. (2008). *Kürtler*, İstanbul: Örgün Yayınevi.

Ömer, Şêx M. H. (1973). *el-Enfasu'r-Rehmaniye fî Behsîs-Silsileti'l-Qadiriye Telebanîyye*, Kerkûk: Şimal.

Rûhanî, M. (1382). *Tarîxê Meşahirê Kurd*, Urefa, Ulema, Udeba, Şu'era, c. II, Tehran: Suruş.

Sagniç, F. H. (2014). *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Stenbol: Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.

Seccadî, A. (1389). *Mêjûy Edebî Kurdî*, Senendec: İntişaratê Kurdistan.

Telebanî, A. (1946). *Diwanî Şeyh Riza Telebanî*, Bexda: Çapxaneyâ Mearif.

Telebanî, M. (2001). *Şêx Riza Telebanî*, Jiyan, Perwerde, Bir û Bawerî, Şi'r, Hewler: Aras.

Telebanî, Şêx A. X. (1284) *Kitabu'l-Me'arif fî Şerhi Mesnewiyê Şerîf we mîn Kelamî eş-Şêx Evdîrehman*, Kirkuk: Riza Efendi Basmahanesi.

Tavakkoli, M. R. (2010). *Kürdistan Tasavvuf Tarihi*, çev. Mehmet Polat, İstanbul: Hivda.

Tenik, A. (2015). *Tarihsel Süreçte Kürt Coğrafyasında Tasavvuf ve Tarikatlar*, İstanbul: Nûbihar.

Tenik, A. (2018). "Urfa'da Her Gün Yâd Edilen Bir Kâdirî Şeyhi: Dede Osman Avnî", *Harran Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*. 23/40.

Tepeyran, E. H. (1998). *Hatıralar*, haz. Faruk İlkan, İstanbul: Pera Turizm Alaattin Eser Kitaplığı.

Terzibaşı, A. (2013). *Kerkük Şairleri*, Yeni Harflere Aktaranlar: Ali İhsan Öbek, Ayşe Taşralı, İstanbul: Ötüken.

Ülker, M. B. (2013). "Mustafa Saffet Yetkin", *DİA*, c. 43, 506-507, İstanbul.

Xeznedar, M. (2004). *Mêjûy Edebî Kurdî*, c. IV, Hewlêr: Aras.

Yüksel, M. (2018). "Kâdiriyye Tarikatı Hâlisiyye Şubesi Silsilesi ve Şeyh Abdurrahman Hâlis et-Tâlebânî", <https://mufity.blogspot.com/2018/09/kadiriyye-tarikat-halisiyye-subesi.html>



Kurdiyat

Yıl/Sal/Year: 2023

Sayı/Hejmar/Issue: 8

e-ISSN 2717-8315

Doi: 10.55118/kurdiyat.1393666

Rüpel/Sayfa Page: 51-68



Article Types/Cureyê Gotarê/Makale Türü:
Research Article/Gotara Lêkolînê/Araştırma Makalesi
Received/Dema Hatîne/Geliş Tarihi: 20.11.2023
Accepted/Dema Pejirandinê/Kabul Tarihi: 12.12.2023
Mehmet YILDIRIMÇAKAR, Doktora, Bingöl
Üniversitesi.
mehmetyildirimcakar@gmail.com
ORCID: 0000-0003-3565-1156
M. Zahir ERTEKİN, Prof. Dr., Mardin Artuklu
Üniversitesi
zahiretekin@hotmail.com
ORCID: 0000-0003-3519-9892

Reviewing and Plagiarism/ Değerlendirme ve İntihal:
This article has been reviewed by at least two anonym
reviewers and scanned by iThenticate plagiarism
website./ Bu makale iki taraflı kör hakem sistemine
göre en az iki hakem tarafından değerlendirilmiştir ve
iThenticate adlı intihal sitesinde taranmıştır./ Ev gotar
herî kê m ji aliyê du hakeman va hatiye nîrxandin û di
malpera întihalê ya iThenticate ra hatiye derbaskirin.

Citation/Atf: Yıldırımçakar, M., & Ertekin, M. Z.
(2023). Mirina Kalekî Rind wek bildungsromana
rewşenbîrekî kurd. *Kurdiyat*, 8, 51-68.
DOI: 10.55118/kurdiyat.1393666.

MIRINA KALEKÎ RIND WEK BILDUNGSROMANA REWŞENBÎREKÎ KURD

Mehmet YILDIRIMÇAKAR* & M. Zahir ERTEKİN

Kurte

Ev xebat li ser romana Mehmed Uzun a bi navê *Mirina Kalekî Rind* dahûrîneke tematîk dike. Xebat hêmanên romanê yên tematîk vedikole û hewl dide ku di peywendê çîroksaziya romanê de taybetiyên tematîk ên romanê, li gorî kevneşopîya bildungsromanê destnîşan bike. Xebat li ser teoriya bildungsromanê radiweste; li ser mijarên wekî pêvajoya geşedan û veguherîna bildungsromanê, giringiya zimanê dayîkê li sirgûnê û hwd. hûr dibe. Dû re li ser derûniya serlehengê romanê disekine û bala xwe dide temayên wekî bêcihûwarî, hesreta welêt, nebanbûn, tenêti, melankolî, nostaljî û bîrê. Romana Mehmed Uzun a bi navê *Mirina Kalekî Rind*, tevî romana wî ya ewil (*Tu*), hêmanên otobiyografîk dihewîne. Nivîskar qala serpehatiyên xwe yên sirgûniyê dike. Ev roman di heman demê de dikeve nav çêşnê romana ‘bildungsroman’ê anku ‘romana gihîştinê’ û taybetiyên sereke yên vê çêşnê dide kifşê. Di encamê de hat dîtin ku romana *Mirina Kalekî Rind* bildungsromanek e; romana gihîştina serlehengê romanê Serdar e. Serdar wekî ez-vegêr, veguherîna xwe kêlî bi kêlî diguhêze, pêvajoya gihîştinê ya ku dijî û di esasê xwe de cureyekî pêvajoya keşfê ye jî. Serdar bi serboriya xwe hem nivîskarê romanê (Mehmed Uzun) hem jî rewşenbîrê(n) kurd temsîl dike.

Peyvên Sereke: Bildungsroman, Romana Kurdî, Rewşenbîrê(n) Kurd, Mehmed Uzun, Mirina Kalekî Rind.

* Ev nivîsar, ji beşeke teza doktorayê ya bi navê “Aûraya Romanên Mehmed Uzun di nav Derbîrîneke Gelêrî de: Penaberî, Dîrok û Şer” hatiye amadekirin.

Bir Kürt Aydınının Oluşum Romanı Olarak *Yaşlı Rind'in Ölümü*

Özet

Bu çalışmada Mehmed Uzun'un *Yaşlı Rind'in Ölümü* (*Mirina Kalekî Rind*) adlı romanının tematik analizi yapılmaktadır. Çalışma romanın tematik unsurlarını ele alıyor ve bildungsroman geleneğine uygun olarak romanın öykülenişi bağlamında romanın tematik özelliklerini işlemektedir. Çalışmada bildungsroman teorisine odaklanmakta; bildungsroman türünün gelişim ve dönüşüm süreci, sürgünde ana dilin önemi vb. konular ele alınmaktadır. Daha sonra romanın başkahramanının psikolojisine odaklanarak yerinden edilmişlik, memleket hasreti, yersiz yurtsuzluk, yalnızlık, melankoli, nostalji ve bellek gibi temalara odaklanmaktadır. Mehmed Uzun'un *Yaşlı Rind'in Ölümü* adlı romanı, yazarın ilk romanı *Sen (Tu)* ile birlikte otobiyografik unsurlar içermekte olup *Yaşlı Rind'in Ölümü* sürgündeki deneyimlerini anlatmaktadır. Aynı zamanda roman 'bildungsroman' diğer adıyla 'oluşum romanı' türüne de girmekte ve bildungsroman türünün temel özelliklerini taşımaktadır. Sonuç olarak *Yaşlı Rind'in Ölümü* bir bildungsromandır. Eser, romanın baş kahramanı Serdar'ın olgunlaşma romanıdır. Ben-anlatıcı konumunda olan Serdar'ın, dönüşümü an be an aktarılmaktadır. Ayrıca Serdar'ın yaşadığı dönüşüm/olgunlaşma süreci aslında bir nevi onun keşif sürecidir. Serdar yaşadığı deneyim ile hem romanın yazarını (Mehmed Uzun) hem de Kürt aydın(lar)ını temsil etmektedir.

Anahtar Kelimeler: Bildungsroman, Kürt Romanı, Kürt Aydın(lar)ı, Mehmed Uzun, *Yaşlı Rind'in Ölümü*.

Mirina Kalekî Rind as Bildungsroman of a Kurdish Intellectual

Abstract

This study presents a thematic analysis of Mehmed Uzun's novel *Mirina Kalekî Rind*. It also deals with elements of the novel and tries to determine their features in the context of the narration of the novel by the Bildungsroman tradition. The study focuses on bildungsroman theory and handles topics such as bildungsroman's development and transformation process and the importance of the mother tongue in exile. It also focuses on the psychology of the novel's protagonist, focusing on themes such as displacement, homesickness, homelessness, loneliness, melancholy, nostalgia, and memory. It is known that Mehmed Uzun's *Mirina Kalekî Rind* and his first novel *Tu* contain autobiographical elements, but in *Mirina Kalekî Rind*, the author describes his experiences in exile. At the same time, the novel belongs to the 'bildungsroman', also known as 'formation novel', and bears the essential characteristics of the bildungsroman genre. In conclusion, *Mirina Kalekî Rind* is a bildungsroman. The novel is a maturation novel of Serdar, the protagonist of the novel. Serdar, who is the first-person narrator, conveys his transformation moment by moment, and the transformation/maturation process he goes through is a kind of discovery process for Serdar. Serdar represents both the author of the novel (Mehmed Uzun) and the Kurdish intellectual(s) with his experience.

Keywords: Bildungsroman, Kurdish Novel, Kurdish Intellectual(s), Mehmed Uzun, *Mirina Kalekî Rind*.

Destpêk

Mehmed Uzun, ji bo romana kurdî navekî naskirî ye. Heta ji aliyê hinek kesan¹ ve wekî avakerê romana kurdî tê nasîn. Di pêvajoya romannûsiya xwe de heft roman nivîsîne: Çar romanên wî; *Siya Evînê*, *Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê*, *Bîra Qederê* û *Hawara Dîcleyê*, romanên dîrokî ne anku li ser hin leheng û rûdanên dîrokî ava bûne. Romana wî ya bi navê *Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê* li ser tîkiliya şer û edebiyatê radiweste û romaneke alegorîk e. “Herdu romanên Mehmed Uzun ên ewil -*Tu* û *Mirina Kalekî Rind*- berhemên otobiyografîk in. Xwendevan dikarin di nav van herdu romanên de nîşaneyên jiyana Uzun bixwe bibînin. Serlehengê romana *Tu*’yê salên xwe yê girtîgehê -ji ber nivîsîna helbesteke kurdî hatibû girtin- vedibêje. Uzun bixwe jî ji ber heman sedemê di sala 1977²an de hatibû girtin. Vegêr di van herdu romanên de serpêhatiyên xwe yê sirgûniyê parve dikin, qala nasnameyên xwe, malên [niştimanên] xwe û şertên dijwar ên ku pê re rû bi rû mane [girtin, îşkence, girtîgeha leşkerî, rev], dikin” (Ahmedzade, 2011: 71-72).

Romana Mehmed Uzun a ewil *Tu* (1985) û ya duyem *Mirina Kalekî Rind* (1987), paralelî jiyana Uzun (kronolojîk) in, berdehama hev in û hevdu temam dikin. Xeta di navbera van herdu romanên de ya ku wan ji hevdu vediqetîne sirgûniya (rêwîtiya) Uzun e: *Tu*, qala serpêhatiya wî ya berî sirgûniyê ya girtîgehê û *Mirina Kalekî Rind* jî tevî rêwîtiya wî ya ber bi welatê xerîbiyê, qala serpêhatiya wî ya piştî sirgûniyê, dike.

1. Bildungsroman; Taybetiyên wê yê Sereke û Pêvajoya Geşedan û Veguherîna wê

“Bildungsroman ew çeşn roman e ku qala geşedana serlehengekî dike ji zarokatiya wî heya guhîştina wî ya civakî” (Mackay, 2018: 304). Bildungsromana ku wekî romana perwerdehiyê, romana peydabûnê û romana geşedanê jî tê binavkirin, bi taybetî di sedsala XIX-an de, li Ewropayê yek ji cureyên romanê yê giring e. Di vê cure romanê de leheng bi sazîkirina tîkiliyê digel pergala civakî di nav lêgerîna wateyê de ye û di dawîya romanê de veguherîna û gihîştinek peyda dibe. Xala destpêkî ya pêvajoya vê gihîştinê bi gelemperî destpêkirina leheng a rêwîtiyekê ye. Di seranserê vê pêvajoyê de leheng hewl dide ku bi civakê re li hev bike û vê yekê ne bi tena serê xwe bi arîkariya hînkêrên xwe bike ku rê nîşanî wî dixin (rêber). Roman bi bextewariyê bi dawî dibin û diyalogên bi takekesên cuda re cihekî giring digirin di van romanên de. Unsûreke giring a van romanên jî ev e ku riwangeya romanê li ser lehengê romanê hûr dibe anku vegêrê yekem yekjimar (ez-vegêr) tê bikaranîn. Ev cure roman bi giştî pêvajoya ronakbûnê û gihîştina lehengekî dişopînin (Hirsch, 1979: 293-311). Bildungsroman di eslê xwe de têgeheke bi zîmanê elmanî ye lê bi ajotina demê re bûye têgeheke edebî ya navneteweyî.

Di bildungsromanê de serpêhatiya lehengê romanê di piçûkatiya xwe de dest pê dike. Roman geşedana huşî û exlaqî, guheran û di taliyê de ciyawazbûna takekes radixe ber çavan. Ev dirûvguherîna/veguheran di esasê xwe de raperînek e li hemberî sazûmana berdest/heyî a civakî. Di serî de lehengê bildungsromanê di nava wê sazûmana civakî ya berdest de bi awayekî tengjî dijî. Gava ku li ser wan tiştên wî ditengjînin û zextê lê dikin difikire, lê dipirse, hayjêbûnek lê peyda dibe, bi wî awayî kirasê xwe diguhere û gava pêşîn a takekesbûnê diavêje. Ji wê gavê pê de êdî leheng

1 Yaşar Kemal, Selim Temo, Necmiye Alpay, Ömer Türkes û hwd.

2 Divê dîrok 1971 be.

û sazûmana berdest li hev nakin. Leheng ji bo hebûna xwe, xwemalîbûna xwe raxe meydanê, rêya berxwedanê dide pêşiya xwe. Leheng çiqasî bi qerar jî be, rê çiqasî dijwar û bi elem jî be bivê nevē daxilî civakê û sazûmana berdest dibe. Lê dîsa jî ji ber vederbûn û zextê nikare adapteyî pergale bibe û di taliyê de rêya rêwîtiyê yan jî sirgûnê li ber wî vedibe. Herçî sirgûn e, *qedera çarenîn/jêneger a lehengê bildungsromanê* ye. Ev sirgûn bi du awayan xwe dide der: Ya yekem, sirgûneke hundurîn e ku ji rêwîtiyeke huşî (navxweyî) tê pê. Ya duduyan, serpêhatiya revê ye ji zehmetiyên jiyane û berxwedana li hemberî civakê. Rê (rêwîti) di lêgerîna xwemalîbûn û avakirina (lêkirina) nasnameyê de hêmana leheng a jêneger e (Aktokmakyan, 2007: 35).

Bildungsroman, di edebiyata serdema navîn de bi *Parzîfal* (Sedsala XIII.) dest bi rêwîtiya xwe kiriye, di sedsala XVIII-an de bi berhema Christoph Martin Wieland a bi navê *Geschichte des Agathon*³ [Çîroka Agathon] (1766) bi hêla xwe ye ronakger derketiye pêş, di berhema Goethe ya bi navê *Wilhelm Meisters Lehrjahre* [Salên Wilhelm Meister ên Çiraxtiyê] (1795) gihîştîye lûtkeya xwe ya klasîk (Aytaç, 2014: 155).

Di bildungsromanê de beriya sedsala XVIII-an zêdetir wateyên dînî li pêş bûn, digel tevgerên ronakgeriyê, guherîn hatine pê û nixê dinyevî bûne xwedîwate tevî derketina têgeha takekes. Û her çiqas perwerde û gihîştin li pêş bin jî şewegirtina manewî û çand pêşdetir e (Duran, 2018: 32). Li gorî Moretti (2000: 18-19) gihîştina kesayetiye û tevdeyîbûna bi civakê re du rê ne ku hevdu temam dikin, di xalekî de dibin yek. Moretti, van tezahurên ku hevdu dibirrin (hevdu hevkeşê dikin) jî wekî gihîştin (geşbûn) wesif dike.

54

Rûdanên siyasî, civakî û hwd. ên sedsala XIX-an bûne sedem bo guherîna vê cureyê. Lehengê ku berî niha hewl dida bi civakê re li hev bike, di vê pergala nû de dest bi hilweşîna pergale dike û bi wî awayî dikeve dû lêgerîna wateyê. Têgeha rêwîtiyê ya ku destpêka pêvajoyê bû êdî veguheriye rêwîtiyeke hundurîn (huşî). Bextewariya ku encama vê pêvajoyê bû êdî cihê xwe daye şer, şikestin û pevçûnan. Leheng yan dê girêdayî nixê dîrokî bimîne, derveyî serdemê bimîne yan jî dê rêbazan tune bihesibîne bi vî awayî ji bo ku ji xwe re cihê bibîne, hewl bide. Diyalog û guftûgoyên bi takekesên din re dihatin kirin di serdema pêşîn de dê cihê xwe bidin lêpîrsînên leheng ên hundurîn. Dîsa di sedsala XX-an de jî ev cure dê veguhere û bikeve formeke nû. Pêşketina senayiyê, mêtîngerî û karîgeriyên neyînî yê herdu şerên cihanê sedemên sereke yê ne veguherîne ne (Duran, 2018: 33-34).

Bi saya serê berhemên femînîst û postkolonyalîzmê (piştî-mêtîngeriyê) di wateya bildungsromanê ya klasîk de berfirehî çêbûye. Ev berfirehî di serî de di temayên sereke yê wekî pêşveçûna bajarî û erêkirinên civakî de hatine pê, şûna van temayan ên wekî veguherînên global (gerdûnî), perçeyî û vegêranên raperînê zêdetir cî girtine (Boes, 2006: 231). Sê qonaxên giring hene ku divê lehengê bildungsromanê tê re derbas bibe: Yek, derketina rê anku sirgûn (piştî lihevnekirina bi civakê û pergala berdest re); du, wendabûn anku lêpîrsîn û xwekeşîfîkirin; sê, xwegihan anku gihîştin û ronîbûn. Em ê li jêr di peywenda çîroksaziya romanê de taybetiyên tematîk ên romanê, li gorî kevneşopîya bildungsromanê binirxînin.

3 Ev roman wekî yekem romana vê çeşnê (bildungsroman) tê hesabandin.

2. Danasîn û Kurteya Romanê

2.1. Danasîna Romanê

Mirina Kalekî Rind romana Mehmed Uzun a duyem e. Cara pêşî di sala 1987an de, li Stockholmê ji nav weşanên Orfeusê der çûye. Çapa romanê ya ji bo vê xebatê em jê îstîfade dikin çapa sêyem e, li Stenbolê, di sala 2012an de di nav weşanên Îthakiyê de cî girtiye. Roman ji pênc beşan pêk tê û 127 rûpel e. Uzun ev romana xwe diyarî Seydayê Cegerxwîn û ronakbîrên kurd ên wê nifşê kiriye. Beriya metna romanê wekî epîgraf sê risteyên ji *Dîwana* Melayê Cizîrî cî digirin.

Mirina Kalekî Rind, tevî romana Uzun a ewil *Tuyê*, hêmanên otobiyografîk dihewîne. Nivîskar qala serpêhatiyên xwe yê sirgûniyê dike. Roman, qala serpêhatiya Serdar û Kalo dike: Serdar kurdek e ku neçar maye ji welêt derkeve/bireve Sûriyeyê, li wir derbasî Swêdê bibe û li wir cîwar bibe û dest bi nivîskariyê bike. Herçî Kalo ye kesekî gerok e; çûye gelek welatan, li wan deran xwendiyê û hînî gelek zimanan bûye, di taliyê de li gundekî sînor cîwar bûye û li benda mirina xwe ye. Serdar di dema reva xwe de li gundekî sînor rastî Kalo tê, wî nas dike û meraq dike. Car caran ji bo lêkolînên xwe bîne pê ji Swêdê rê digire tê Sûriyeyê. Dema tê Sûriyeyê seriyekî li Kalo jî dixê, ew û Kalo li ser destanên kurdan ên kevn dixebitin. “Roman, tevî çîroka Kalê Rind î hostayê bilûrê, di navbeyna nifşê kevn û nû de, koçberî, sirgûnî, nasname, aîdiyet û hesreta welêt guftûgo dike” (Parlıtî & Galip, 2010: 60). Roman bi reva Serdar dest pê dike û bi mirina Kalo diqedê. Mekanê romanê gundekî li sînorê Tîrkiye û Sûriyeyê ye ku Serdar û Kalo li wî gundî hevdu nas dikin. Jiyana Serdar, serpêhatiya wî gelekî dişibe ya Uzun bixwe. Di romanê de Serdar ronakbîrê kurd ê îroyîn, Kalo jî yê sedsala XX-an temsîl dike. Roman li ser hest, serpêhatî, fikr û nêrîn, xewn û xeyalên wan herdu rewşenbîrên kurd, sirgûnî, tînêti û bêçaretî û derûniya wan ava bûye. Serdar hem qala Kalê bisir (biraz) dike hem jî pê re serpêhatiya xwe, hestên xwe, hêviyên xwe pêşkêş dike.

Di romana *Mirina Kalekî Rind* de ez-vegêr heye. Ev roman jî wekî romana wî ya bi navê *Tuyê* qala rabirdû (do) û dema niha (îro) dike. Lê belê vê carê ez-vegêr van herdu hêlên demî diguhêze û do û îro di nav hevdu de ne. Ev roman wekî romana *Tuyê* bi binebeşên cihê cihê, dor bi dor nayê vegêran. *Mirina Kalekî Rind* dikeve nav çêşnê romana ‘bildungsroman’ê ya ku wekî romana ‘gihîştin-bîrewerbûn-bidestxistina nasnameyê’ tê pênasekirin. Roman, taybetiyên sereke yê wê cure romanê dide kifşê. Ez-vegêrê ku yek ji qerekerê romanê ye û navê wî Serdar e, hem bi wê teya rastî hem jî bi ya mecazî welatê xwe diguherîne. Wextê ji welatekî ku tundiya siyasî mişt in -Tîrkiye- berê xwe dide welatekî ku tu kesek jî ber fikrên xwe yê siyasî rastî tundiya nayên -Swêd-, li gundekî tam li ser sînor -sînorê Tîrkiye û Sûriyeyê- rastî kalekî tê. Diyaloga wî ya bi Kalo re dibe sedem ku bala xwe bide hin hûrgiliyan, ên ku berî wê demê ji ber siyaseta nezanibûye lê binêre. Di vir de encamên bikaranîna ez-vegêr ên bi vî awayî hene: Yek, em dikarin ji kesê yekem -ji çavkaniya eslî- veguherîna dinêya Serdar a hundirîn/derûnî hîn bin. Du, eger na -ez-vegêr nehata bikaranîn- me dê bikaribûya tevî Kalê Rind, hînî dinêya hundirîn a karakterên romanê yê din -şivan, hevalê Serdar- jî bûna. Encax hewcetî bi vê tuneke, çunkî ev roman, romana gihîştina Serdar e. Sê; Serdar wekî ez-vegêr, veguherîna xwe kêlî bi kêlî diguhêze. Pêvajoya gihîştinê ya ku dijî, di esasê xwe de cureyekî pêvajoya keşfê ye jî (Temo, 2007: 4).

2.2. Kurteya Romanê

Serdar Azad, bi alîkariya dostekî xwe, welatê xwe terk dike (Uzun, 2012: 12). Bêyî dilê xwe, bi neçarî berê xwe dide welatekî nû, jiyaneke nû (r. 13). Ji ber bêçaretî û bêgaviyê rêyeke bitalûke hildibijêre (r. 14). Ew û hevalê xwe piştî meşeke bi saetan, di nava hestên têkel de, derbasî aliyê din ê sînor dibin (r. 15). Piştî ku sînor derbas dibin hinekî din jî dimeşin û xwe digihînin gundekî piçûk û xwe dispêrin mala şivanê gund. Wê şevê bo ku dotira rojê şivan wan bibe bajêr li wir dimînin (r. 18-19). Piştî hevnasînê, radikevin.

Berbanga sibehê, Serdar bi dengê delal ê bilûrekê hişyar dibe (r. 22). Dengê bilûrê li xaniyê kêleka xaniyê şivên dihat. Serdar ji şivên pîrsa kesê ku li bilûrê dixwe dike û şivan wiha bersiva wî dide: “Xwediyê bilûrê Kalê me ye. Kalê gundê me” (r. 23)... “Ew bi tena serê xwe dijî” (r. 24). Dengê bilûra Kalo tesîreke mezin li Serdar dike: Bilûra Kalo, Serdar dibe ber bi kes, tişt, deng û pejnên kevn û kevnar. Serdar Kalo meraq dike û dixwaze Kalo nas bike. Ji ber ku serê sibê ye û Kalo dixwaze bi tena serê xwe bimîne, ev daxwaz nayê pê (r. 28).

Piştî ew bi rê dikevin, ber bi bajarê nêzik ve diçin (r. 28). Dema êdî têra xwe ji gund dûr dikevin, ji nişkê ve hevalê wî ferq dike ku cizdanê xwe li gund, li mala şivên ji bîr kiriye (r. 29). Wextê ew ji bo cizdên vedigerin gund, Serdar dibîne ku Kalo li bin dara ber xaniyê xwe rûniştîye (r. 31). Serdar silavê dide Kalo û Kalo silava wî hildide. Serdar wê hingê ferq dike ku Kalo nebîna ye (r. 32). Paşê Kalo wan vedixwîne çayvexwarinê. Piştî dostê Serdar wî dide nasîn: “Serdar, dostekî min î kevn e. Me bi hev re li Stenbolê di fekulta hukukê xwend. Bi dû xwendina xwe re wî dest bi karê xwe kir. (...) ji kovar û rojname re tiştin nivîsîn. Niha jî ew mecbûr ma ku ji welêt derkeve” (r. 35).

Piştî çayê û axaftina li ser bilûrê êdî wextê çûyînê wan tê. Serdar pir dixwaze Kalo nas bike lê nikare hinekî zêdetir li cem wî Kalê ku bi ‘tesadufî’ derketibû ser riya wî, bisekine (r. 38). Ew Kalo û bilûra wî li wê derê dihêlin û bi rê dikevin (r. 41). Piştî ku xwe digihînine bajêr, şivan û dostê wî ji wî vediqetin. Serdar bi tena serê xwe ber bi bajarê Stockholmê, warê xwe ye sirgûniyê bi rê dikeve (r. 42).

Serdar diçe Stockholm’ê û dest bi jiyaneke nû dike, jiyana nû ya sirgûniyê (r. 46). Lê Serdar, Kalo ji bîr nake. Piştî du salan diçe gundê Kalo (r. 48). Dema dikeve oda Kalo dibîne ku Kalo, şivan û du gundî li wir rûniştine. Kalo wî ji dengê wî nas dike (r. 49). Kalo, Serdar û yên din dikevin nava suhbetê kûr; qala stran, destan, titûn, mazûvanî û gelek tiştinên din dikin. Li wir Serdar mebesta xwe eşkere dike: “Ez jî dixwazim, stran, destan û çîrokên kevn berhev bikim” (r. 56). Ji bo vî karî bibe serî ji Kalo alîkariyê dixwaze. Kalo jî bi kêfxweşî qebûl dike.

Serdar dil dike nêzî neh-deh rojan li wir bimîne, ji Kalo stran, destan û çîrokên kevn quhdarî bike, wan qeydî kasetan bike û paşê vegere Stockholmê (r. 62). Li gorî agahiyên şivên Kalo ne ji wî gundî bû, bi tena serê xwe bû, çend sal berê hatibû û li wir cîwar bûbû. Berê ne kor bû, paşê şereş li ser çavê wî de hatibû (r. 62). Dotira rojê ew dest bi xebatê dikin. Ew her roj 4-5 saetan dixebitin (r. 67). Piştî çend rojan êdî dema vegerê tê. Serdar gelek stran, destan, çîrokan ji Kalo berhev dike. Lê der barê Kalo de tu tiştî bi dest naxe. Wextê ji hev veqetîna tê Serdar daxwaza dîsa

hatinê dike, Kalo jî bi kêfxweşî qebûl dike. Nişkêve Kalo ji Serdar dipirse: “Tu dizanî rind⁴ kî ne û edet û torên wan çi ne?” (r. 74). Serdar cara ewil e wî navî dibihîze. Dixwaze ku Kalo bibersivîne lê Kalo bersivê nedê... Wî bi rê dike... Serdar çawa vedigere Stockholmê hema dest pê dike li ser rindan agahiyan berhev bike lê li ser wan çiqas bikole jî tu tiştêkî kêrhatî peyda nake (r. 75-77). Lê rojekê li Tehranê nameyek ji bo Serdar tê. Hozanekî kurd jê re bi rêya wê nameyê agahiyên gelek giring der barê Rindan de dinivîse. Saya wê nameyê êdî Serdar digihije mirazê xwe (r. 77-78). Piştî salekê Serdar dîsa rojêke biharê diçe serdana Kalo. Dema Serdar xwe digihîne mala Kalo dibîne ku wa ye Kalo li bin dara ber deriyê xwe li bilûrê dixwe (r. 82). Dotira rojê Serdar dîsa tê cem Kalo (r. 90). Serdar dîsa qîseyê tîne ser Rindan; bi hûrgilî qala çîroka wê nameya ji Tehranê hatî dike (r. 96). Serdar vê carê sê hefteyan li bal Kalo dimîne û der barê serpêhatiya Kalo de hînî gelek tiştan dibê: Kalo ji Diyarbekirê ye. Li Stenbol û Kahîreyê edebiyat û ziman xwendiyê. Baş bi tirkî, farişî û erebî dizane. Piştî xwendina xwe çûye gelek deveran (r. 95). Di taliyê de westiyayê û hatiye vê derê, li vî gundî, bi cih bûye (r. 98). Kalo ji Serdar re qala sergûzeştê xwe û Rindiyê jî dike (r. 103-108). Piştî sê hefteyan Serdar, bi hêviya sala bê meha Adarê dîsa vegere cem Kalo, li ser destaneke kevn bixebitin, li wir vediqete, diçe “welatê xwe yê xerîbiyê” (r. 108).

Serdar li ser soza xwe disekine; salek şûnde, di meha Adarê de, dîsa diçe gundê Kalo. Lê Kalo du hefteyan berî ku Serdar bê gund, çûye ber rehma Xwedê (r. 110). Kalo piştî mirina xwe pakêtek ji bo Serdar hiştiye (r. 114). Di paketê de gelek tişt hene: Kaset, kovar, lênûsk û hwd... Serdar dibîne ku Kalo ew destana ku dê vê carê bi hev re li ser bixebitiyana bi dengê xwe straye û qeydî wan kasetan kiriye (r. 116).

Çend kovarên kevnare hebûn; di nav rûpelên wan de nivîsên Kalo jî hebûn. Deftereke stûr û bergreş hebû (r. 119). Çend helbest di defterê de hebûn. Kalo nîvco hiştibûn, di nameyê de xwestibû wan helbestên kevn ji pirtûkxaneyên kevn peyda bike û bi xeteke wekî ya Kalo li wê defterê binivîse da ku karê Kalo dest pê kiribû û nekaribû bibe serî, tamam bike (r. 124-125). Li ser wesiyeta Kalo, Serdar li Şarezorê kalekî peyda dike ku ew pisporê edebiyat û zimanê kurdî ye û dizane wekî Kalo binivîse. Ew pispor jî wekî Kalo ber bi korbûnê ve diçe. Serdar wiha sozê dide Kalo: “Berî ku ew kalemêrê zana kor bibe, ez dê xwe bigihînim wî. Ji bo ku ev rûpel ji valahiya dilsoj û keserkûr rizgar bibin, ez ê her tiştî bikim, bêguman her tiştî... De bi xêr û xweşî de biçê Kalê [R] ind, bi xêr û xweşî” (r. 126-127).

3. *Mirina Kalekî Rind: Bildungsromana Rewşenbîrekî Kurd*

Uzun pêşî di romana xwe ya ewil, *Tuyê* de tê girtin, dikeve hepsê, îşkenceyan dibîne, li wir jî hêla *fikrî û siyasî* ve bîrewer dibe, xwe û civaka xwe nas dike. Paşê tê berdan, li ser wî doz tîne vekirin, tu rê namîne ku li welêt bimîne (bijî), rêya revê (sirgûnê) dide ber xwe. Di *Mirina Kalekî Rind* de, ji sînor derbas dibe, berê xwe dide sirgûniyê, li ser rêya revê, li gundekî ser sînor, Kalekî Rind (rêber) nas dike, pê re dikeve diyalogê, dikeve bin bandora terza jiyana wî û fikr û nêrînên wî, ji hêla *çandî û felsefî* ve jî digihije, ronak dibe. Wekî her lehengê bildungsromanê jî her sê

4 Kesên ku kar û barên dinyayê badilhewa dibînin. Rind tiştên baş û nebaş xweş dibînin; li gorî wan xem û şahî yek tişt e. Ji wan kesan re rind tê gotin, ên ku felsefeya jiyana wan bi vî teherî ye. Rindî di edebiyata klasîk de xwedî cihêkî giring e. Rindî ne qelenderî ye lê bi awayekî qismî bohemî ye. Şairên klasîk xwe wekî rind dinirxînin. Li gorî wan bi qasî misqalêkî qîmeta dinê tuneye. Şairên ku di heyata xwe de tu carî mey venexwaribin jî ji bo jiyana rindane empoze bikin gelek caran di naveroka helbestên xwe de qala xerabat, mey û meygêr û hwd. kirine (Pala, 2000: 330).

merheleyên ‘derketina rê’, ‘wendabûn’ û taliyê ‘xwegihan⁵’ê re derbas dibe.

Pevçûna serdest a çîroka rê/rêwîtiyê [sirgûnê/revê] ya romana *Mirina Kalekî Rind* ku Serdar vedigêre encama travmayeke dîrokî ye. Loma ye Serdar do û îroyê bi hev re îdraq dike anku têgihîştina Serdar a bêyî ku do û îroyê ji hevdu cihê bike/veqetîne, wî dike lehengê bildungsromanê. Çîroka gihîştina Serdar di esasê xwe de bildungsromana rewşenbîrê(n) kurd e. Mehmed Uzun di vê romanê de tevî çîroka xwe ye şexsî di heman demê de portreya rewşenbîrê(n) kurd ê(n) serdemê jî xêz dike. Uzun bi karakterê Kalo jî paralelî portreya xwe (portreya rewşenbîrê îroyîn), portreya rewşenbîrê(n) beriya xwe, rewşenbîrê(n) kurd ê(n) sedsala XX-an jî xêz dike.

3.1. Sirgûn: Qedera Jêneger a Lehengê Bildungsromanê

Wekî li jorê jî hat gotin, li gorî Aktokmakyan (2007) sirgûn, *qedera jêneger* (çarenîn) a *lehen-gê bildungsromanê* ye. Rêwîti (sirgûn) di lêgerîna xwemalîbûn û avakirina nasnameyê de hêmana leheng a jêneger e (r. 35). Uzun jî di romana xwe ya bi navê *Mirina Kalekî Rind* de qedexeyên ku di aloziya nasnameya Serdar de roleke mezin dilîzin û loma Serdar ji kirdariyên (cezayên) dewletê -yên ku karîgeriyê li hemû jiyana civakî dikin-, coş û xiroşa dîrokî ya Kurdistanê dipirse û bi rêya pevçûn û berxwedanê zayîna takekesekî dihene. Ev cure roman bi piranî romanên ewil ên romanûsan in. Roman, romana romannûs a duyem e û lê wekî kronolojî berdewama ya yekem (*Tu*) e. Taybetiyên romanê yê otobiyografîk hene. Loma em dikarin bibêjin ev roman çîroka lêgeranê ya leheng (Serdar Azad) û nivîskarê romanê (Mehmed Uzun) bixwe ye. Ji ber vê yekê, gelek caran nivîskar û leheng hev dibirrin, li hev dikin anku heman kes in, çîroka afirîna (peyda-bûna) nasnameyên xwe vedibêjin. Serdar di romanê de bi dewletê re dikeve pevçûneke bêeman û berê xwe dide welatê xeribiyê.

3.2. Wendabûn; Lêpîrsîn û Xwekeşfîkirin

Vegêr (Serdar) li ser rêya sirgûnê, Kalekî Rind (rêber/mamoste) nas dike, pê re dikeve têkiliyê, diyalogek di navbera wan de saz dibe. Piştî Kalo nas dike, dikeve bin bandora fikrên wî û terza jiyana wî. Serdar (ez-vegêr), di wê rêwitiya xwe de, bi rêberiya Kalê Rind veguherîna xwe kêlî bi kêlî diguhêze. Vegêr rêwitiya xwe çawa ku ji çîrokan dizanibû wekî keşfekî dibîne; “her ger her rêçûn, her rêwîti weke helbesteke xweş di mêjî û dil de pêl dide û îmkanên tîne pê da ku meriv tiştên xweş û nû keşf bike” (r. 13).

3.2.1. Zimanê Dayîkê wekî Çeper û Kozîk li Welatê Xeribiyê

Têkiliyeke zexim di navbeyna sirgûnî û zimên (zimanê dayîkê) de heye; lewra sirgûnî dike ku nivîskar bigihîje hişmendîya zimên. Bi rêya zimên kesayeta edebî ya nivîskêr çê dibe. Ziman delîla hebûna edebî ya nivîskêr e. Cihê welatê rasteqîn e ziman ji bo nivîskarê li sirgûnê (Goytîsole, 2006: 81). Nivîskar zimanê xwe û welatê xwe yekpare dibîne û bi saya zimên têkiliyên xwe yê bi welêt re qut nake. Nivîskarê sirgûn her tiştî li pey xwe dihêle lê zimanê xwe bi xwe re dibe. Zimanê dayîkê hilberîna nivîskêr xweyî dike. Tekane stargeha nivîskarê sirgûnê zimanê dayîkê ye. Nivîskar zimanê xwe keşf dike di vê pêvajoyê de. Bi saya zimên serpehatiyên xwe,

5 Xwegihan; ji hêla çandî û felsefî ve gihîştin, ronibûn, birewerbûn.

bêrîkirinên xwe û fikr û ramanên xwe şewq vedide. Kesê sirgûn, bi hêsanî hînî zimanê welatê ku lê sirgûn e bibe jî ev yek encax dikare hinekî sirgûniya wî hêsantir bike, lê sirgûniya zimanê wî hê jî berdewam e. Berhemên nivîskî encax di dorhêla zimanê dayîkê de digihîjin qîmetên xwe yên rastîn. Rizgariya zimanî ya ji sirgûniyê encax bi nivîsînê pêkan e (Doğan, 1994: 2- 3).

Ziman, nûnerê çandê ye. Nivîskar, bi rêya zimanê xwe welatê xwe tîne bîra xwe û bi vî awayî hesta xwe ye xwemalî wenda nake. Ziman, di vî nuqteyê de xwedî roleke giring e, wekî mifteyekê ye, lîmanek e ku meriv lê bisitirê. Nivîskar bi awayekî qewî zimanê xwe hembêz dike, bi zimanê xwe re dibe yekpare û bi zimanê xwe têkoşîna xwe berdewam dike. Nivîskar hilberîna xwe ye nivîskî bi zimanê xwe yê dayîkê didomîne, li hemberî otorîteya li welatê wî li ser hukm wekî çekekî bi kar tîne. Ew çiqasî wî nebînin jî ew bi vî helwesta xwe dibe kelema (strûya) çavê wan (Aytaç, 1996: 381).

“Kesê sirgûn her çendê zimanê welatê lê sirgûn e baş bizanibe jî ev yek bi tenê dikare hinekî rewşa wî/ê ye sirgûniyê sivik bike lê sirgûniya zimên (zimanê kesê sirgûn) her û her berdewam e” (Doğan, 1994: 2). Ziman temsîlkarê çandê ye. Nivîskarê li sirgûnê bi rêya zimên welatê xwe tîne bîra xwe û bi vî awayî hesta xwe ye aîdbûnê wenda nake. Her çiqasî dûrî welêt jî be bi nivîsîna bi zimanê dayîkê berxwedana xwe berdewam dike.

Zimanê dayîkê ji bo kesên sirgûn dewsa welatê ku bi neçarî terikandine, digire. Bi taybetî welatê xerîbiyê ji bo kesên nivîsende wekî stargehekê ye. Agirê hesreta welêt, bi zimanê dayîkê tê temirandin. Nivîskarê ku hatiye sirgûnkirin ji ber ku li welatê ku çûyê nikare bi zimanê xwe yê dayîkê (zîkmakî) xeber bide, kesên bi zimanê wî dizanin li derdora wî tune ne ku bi wan re xeber bide, di jiyana rojane de zimanê xwe yê dayîkê bi kar naîne. Ew jî zimanê xwe bi rêya nivîsînê bi kar tîne bi wî awayî hesreta xwe sivik dike. Zimanê dayîkê wekî nivîskarên din ên sirgûn ji bo Uzun jî cihekî xwe yê giring heye. Uzun, di romanê de cî daye hesreta zimanê dayîkê ya takekesên sirgûn û bi vî awayî têkiliya rewşenbîrên kurd ên sirgûn a bi zimanê dayîkê re teyisandiyê. Di romanê de ez-vegêr (Serdar), kesên ku li sirgûnê hesreta welêt û zimanê xwe yê dayîkê dikişînin, temsîl dike.

Em ji salixdana dostê Serdar tê digihên ku Serdar, li Stenbolê hiqûq xwendiyê, dû re dest bi karê xwe kiriye, pê re ji kovar û rojnameyan re tiştin nivîsîne, paşê jî bêgav maye ku welêt terk bike (r. 35). Li gor van agahiyan em dizanin ku Serdar yekî xwende û nivîsende ye.

Sirgûnî karigeriyê li derûniya Serdar dike; bîranînên welêt gelekî zora wî dibin, xewnên ecêb dibîne. Ji bo bikare tehemila sirgûniyê bike biryara xwe dide ku xwe bispêre peyv û hevokan. “Bi tenê peyv û hevok[an] dikaribûn min ji wê cihana derve ku dijminê xatire, xewn û bîranînan [in], biparêz[in]. Peyv[an], bi tenê peyv[an] dikaribûn alîkariya min bikin da ku ez li hemberî pêlên dijwar ên ba û bahozên jibîrkirinê rawestim. Bi tenê peyv[an] dikaribûn ji min re bibin çeper û kozik” (r. 12). Gava cara ewil Serdar xatirê xwe ji Kalo dixwaze da ku ji gund veqetin, herin bajêr û peyre berê xwe bide welatê xerîbiyê, Kalo şîreteki lê dike; “ji reh, rêç, ax û zimanê xwe vemeqete. Ew, di nav vî jiyana nexweş û neçar de kaniyên kêfxweşiya me ne” (r. 40). Ev gotinên Kalo ji ber ku hêj ji wan (reh, rêç, ax û ziman) veneqetiye, an jî nehatiye veneqetandin, pêşiyê tu wateyeke xwe tunene ji bo Serdar lê piştî Serdar diçe welatê xerîbiyê, rastî zimanê biyanî tê, dûr

ji zimanê xwe yê zikmakî dimîne, hesret serî hildide, gotinên Kalo di mêjûyê wî de olan didin. Piştî ku Serdar hesreta zimanê xwe yê zikmakî dikişîne, gîr û giriftên zimanê biyanî zora wî dibin, bêyî hemdê xwe hejmar û pêjimarên zimanê zikmakî zikir dike, çaverê li posteyê dinêre da ku nameyên ku bi zimanê zikmakî hatine nivîsîn jê re werin, wan hilde û pêşî bêhn ke û paşê bixwîne, pê hesreta dilê xwe bişkêne, ji şîretên Kalo têdigihê (r. 40). Dema Serdar diçe welatê xerîbiyê, her çiqas zimanên biyanî nedizanî jî, ji xwe re çendek kitêban dikire, tîne malê, datîne ser refê. Lê wextê li kitêban dinêre li ber xwe dikeve; “min pir xwest ku bila kitêbeke pir kevn ku bi zimanê min hatibû nivîsîn, li ba wan kitêban hebûya. Ew jî bibûya pardarê xerîbiya min” (r. 45). Serdar bi rêberiya Kalo xwe ji nû ve keşif dike. “Belê, min zimanê xwe, heyîna xwe ya herî pîroz, herî mezin ji nû ve keşif kir” (r. 57). Serdar nivîskariya xwe wekî şerê xwe û peyvan terîf dike (r. 126).

Nivîskarên sirgûn ji bo nasnameya xwe wenda nekin, li welatê xerîbiyê pala xwe didin zimanê xwe yê zikmakî, zimênji xwe re dikin piştevan. Bi nivîsîna bi zimanê xwe yê zikmakî nasnameya xwe ji mirin û wendabûnê diparêzin. Edebiyata li sirgûnê bi zimanê zikmakî tê hilberîn, dike ku nivîskar nasnameya xwe ji nû ve bi dest bixe. Serlehengê romanê Serdar jî nivîsîna bi zimanê xwe yê zikmakî ji xwe re wekî erkekî esasî dîtiye, bi wî awayî nasnameya xwe parastiyê. Di romanê de nasname, welat û ziman bi van bêjeyan; reh, rêç, ax û ziman têne temsîlkirin. Divê meriv bikeve dû ew reh û rêça ku Kalo behs dikir. Divê meriv ji reh û rêça xwe bi dûr keve da ku bizanibe ka reh û rêç çi ne (r. 41). “[M]eriv di bin perdeya giran a tenêtiyê de dikare bi peyvan re hevaltiyeke kûr û besttîjî bîne pê” (r. 57). Vegêr nivîsandinê jî wekî rêwîtiyekî dibîne: “Rêwîtiyeke di nav pêlên deryayê de. Rêwîtiyeke ku bi maceran tijî ye” (r. 68).

3.2.2. Derûniya Leheng (Ez-Vegêr)

Kesê ku hatiye sirgûnkirin, êdî ne hemwelatiyek e ne jî perçeyekî jiyana civakî ye, yekî biyanî ye û welatê wî axa kesên din e. Ji milê din, sirgûn, wekî dûrketineke der-pergalî dikare bê wesfandin ji kok û bendên zimanî, civakî û çandî ku ji bo kiryara nivîsînê gelekî giring in (Kula, 2008: 433). Dikare bê gotin têkiliyeke heta tu bixwazî (bêjî) nêz heye di navbeyna têgeha sirgûnê û edebiyatê de. Lewma ji bo gelek nivîsar û ramangêran sirgûn, digel ceza hildanê, wekî jêdera îlhamê ye di nivîsîna gelek berhemên herî sosret (bijare) an jî zayîna fikr û nêrînen nejrêzê, cuda (balkêş) de. Bi vê bergehê sirgûn, ne bi tenê ceza, vederbûna civakî, jidûrxistina ji welêt, aforoz an jî qewirandin e, di heman demê de yek ji hêzên hunerê ye afirîner e jî. Li gorî Kula têgeha sirgûnê gelekî giring e ji ber ku van tiştan; digel qewirandina ji hemwelatiyê; bêyî mafên xwe yên şexsî û malbatî man; bêwelatî bûn; bêcihûwar bûn; tehdîdên jiyani; tengasiya debarê (aboriyê) û hwd., li milê din, pirsgirêkên zimanî, bêfikirina welêt (niştimên) û tirs û endîşeya ji bo yên li pey xwe hîştine, dihewîne û dibe çavkaniya îlhama edebî (2008: 434).

Dante, Victor Hugo, Oscar Wilde, James Joyce, Samuel Beckett, Vladimir Nabokov, Bertolt Brecht, Thomas Mann, Milan Kundera, Mehmed Uzun û hêj gelek kesên dîtir ji ber sedemên polîtîk hatine sirgûnkirin an jî ji ber tehdîda li ser jiyana û fikrên wan, neçar mane ku welatê xwe biterikînin. Jiyana li sirgûnê bivê nevē bandorek li berhemên nivîskar û ramangêrên li sirgûnê kiriyê. Dema em li berhemên wan dinêrin em rastî du taybetiyên tîne: Yek jê nostalji ye ku bêfikirina welêt, hesreta weten (niştiman), jiyana rabirdûyê û hesreta ji bo wê jiyane, derdikevin pêş. Ya

duyan rabûna zor û zexta li ser wan bûye sedemê nivîsîna bi azadane û afirîner. Ev herdu tişt jî rê li ber nivîskaran vedikin da ku rabirdû û dahatûyê ji nû ve binirxînin, bi bergeheke cuda li rûdanan binêrin, tiştên qalibgirtî (req) serobino bikin.

Sirgûnî derûniya kesên çûne sirgûnê serobino dike. Li sirgûnê hesta bêkesî, bêkokî û tenêtiyê dike ku kesên sirgûn xwe wekî hîçekî (tuneyekî) hîs bikin. Dûrketina ji welêt, di gel kesê sirgûn hesteke gelekî neyînî peyda dike, sirgûn xwe wekî kesekî/a nayê-xwestin dihesibîne. Ji ber vê jî nikare li cihê ku çûyê (welatê xerîbiyê) germ bibe, hînî wir bibe, entegre bibe. Cihê sirgûnê wekî cihê cezayê dibîne lewma jî jê hez nake. Derûniya sirgûniyê dibe sedema pirsgirêka nasnameyê. Kesê sirgûn nasnameya xwe ya berê ji der daye (wenda kiriye) û ketiye nav hewldanekî ku nasnameyeke nû bi dest bixe. Dibe ku ew kesê sirgûnbûyî li welatê xwe kesekî naskirî, navdar, rêzdar be lê li cihê nû bi tenê yekî biyanî ye. Ew nasnameya wî ya ku bi salan, bi ked û xebateke mezin, bi dest xistibû, êdî tune ye, ji dest çûye. Divê ji nû ve ji xwe re nasnameyekî çê bike.

Li gorî Timur ji ber ku kesê sirgûn nikare bêkokiyê hezim bike, pirsgirêka nasnameyê derdikeve meydanê di vê pêvajoya sirgûnê de. Dibe ku kesê sirgûnkirî nasnameya xwe ji der bide, di wê kêliyê de kesê sirgûn bi xwe re dikeve şerekî, dest bi lêgerîna nasnameyê dike. Ji bo nasnameya xwe wenda neke li ber xwe dide, têdikoşe. Hewl dide ku bi rabirdûya xwe û welatê xwe re pêwendiyê saz bike (2012: 20). Kesê sirgûn berî her tiştî rûberî tenêtiyê dibe li sirgûnê. Rûyê hemû kesên ku derdikevin pêşberî wî bi rûpoş (maske) in di vê pêvajoya sazkirina nasnameyê de. Bênasnamebûn heye di paşxaneya vê yekê de. Lêgerîna nasnameyê ya bi şûn de dest pê dike di vê kêliyê de (Akay, 1996: 72). Kesê sirgûn di heman demê de di nav nakokiyekê de ye. Dikeve li dû pîrsa “Kî me ez?”. Di nava du keviran de dimîne; ezîtiya berê û ya niha. Kesê sirgûn xwe bêcihûwar, veder hîs dike di vê pêvajoya sirgûniyê de. Xwe ne aîdî welatê xwe ne jî aîdî welatê xerîbiyê dibîne.

3.2.2.1. Bêcihûwarî û Hesreta Welêt

Bêcihûwarî ew tişt e ku cihekî ku takekes xwe wekî malê hîs bike êdî li ser rûyê dinê tune be. Kesekî bêcihûwar êdî nikare vegere mala xwe, ew mal êdî tune ye. Sirgûnî jî bi xwe re bêcihûwariyê jî tîne. Takekesê bêcihûwar hesta xwe ya aîdbûnê jî wenda dike. Nikare cihê sirgûniyê ji xwe re wekî welat qebûl bike loma berê xwe dide zimanê xwe yê zikmakî, xwe dispêre zimên û zimên ji xwe re wekî welatekî qebûl dike. Bi nivîsîna bi zimanê xwe yê dayîkê êşa bêcihûwariyê hêsan dike, dikare pê re serederiyê bike.

Serlehengê romanê Serdar pîrî caran, rasterast, xwe wekî sirgûn û warê xwe yê nû jî wekî “welatê xerîbiyê”, warê sirgûniyê bi nav dike: “Serdar Azad ê sirgûn” (r. 34), “Stocholma ku dê bibûya warê min ê sirgûniyê” (r. 42), “jiyana nû ya sirgûniyê” (r. 46), “min li welatê xwe yê xerîbiyê, ji jinikekê guhdarî kir” (r. 69), “ez dîsan vedigeriyam welatê xwe yê xerîbiyê” (r. 74), “xaçerêyên tevlihev ên sirgûniyê” (r. 78), “[w]î [Kalo] rêwîtiya xwe ya dûr û dirêj weke celebke surgûnî didît” (r. 98), “ez vegeriyam welatê xwe yê xerîbiyê” (r. 108), “Min dil hebû ku ez li mekana xwe ya sirgûniyê, li welatê bakur, li welatê xerîbiyê vekim” (r. 115). Uzun, di pêvajoya sirgûniya xwe de gelekî hesreta welêt kêşaye û di romanê de gelek caran qala hesreta welêt dike. Ez-vegêr bala me dibe ser bêcihûwarî û hesreta welêt.

Li gorî vegêr rêwitiya wî ji cihên nas ber bi cihên nediyar, tarî: “[E]z ji welatê xwe bi dûr diketim û diçûm cihaneke nû ku li pey mij û dûmanê” (r. 13). Vegêr derketiye rêwitiyekî, cihê ku dê biçê ne diyar e ku cihekî çawa ye, pê guman e, pêşiya wî ne ron (zelal) e. Çûyîn û hatin bi macera, xemgînî û bêrikirinê mişt in, lê kêfxweşî pir hindik. Herçî vegeer e gelekî dijwar e (r. 13). Vegêr ji bêçaretî û bêgaviyê rêyeke bi telûke tercîh dike, tevî dostê xwe şevêkî li sînore xeternak derbas dibin. Vegêr stêrkên wê şeva li sînore derbas dibin jî dixê hevparê tenêtiya xwe; “[h]eta stêrkên şeva reş ku ji me re dibişîrîn jî -mêriv digot qey- strana xerîbiyê bi awakî zîz û kezexur digotin” (r. 14). Hestên wê şevê “keser, tirs, nenasî û nezaniya pêşerojê” (r. 14) ne. Vegêr sînore wekî “niqta sifir a wext û jiyânê” pênase dike. Wextê li sînore derbas dibin li pey xwe dinêre, naxwaze li sînore bi dûr keve, gelek tiştên cihana wî ya li pey xwe hîştibû wekî şerîdeke sînemayê li ber çavê wî re derbas dibin (r. 15). Wextê meriv van teswîran dixwîne meriv dibêje qey nivîskar qala jiyân û mirinê dike, hestên kesekî li ber sekerata mirinê tîne bîra mêriv. Kesên ber sekeratê jî berî ku koçî cihana nû bikin, panoramayeke cihana ku dê li pey xwe bihêlin wekî şerîdeke filmekî li pêş çavê xwe dibînin, li ser niqta sifir a jiyân û mirinê ne. Vegêr rêwitiya xwe ya derbasbûna li sînore wekî “rêwîriya pira Siratê” a tirsnaq bi nav dike (r. 33).

Vegêr xwe û hevalê xwe wekî “mêvanên şeva reş” bi nav dike ev yek jî dîsa nîşanî me dixê ku vegêr wê şevê wekî şeveke bêyom, wekî şînekê dibîne û dahatû jî tarî ye. Lê li aliyekî din derbasbûna ji sînore, xilasbûna ji telûkeya li pey xwe, hestê erênî jî daye vegêr: “em niha li aliyê din ê tixûb bûn. Em niha hîn rehet, azad û bêtirs bûn” (r. 16). Hesta ku herî zêde vegêr li ser dîsekine li aliyê sînore ê din, hesret e. “Hesret... Hesretên stûxwar, şikestî, qurmiçî, dilgerm û dilsoj. Hesreta wextên aza û wekhev. Hesreta azadiya ne zincîrkirî. Hesret” (r. 21)...

Dema ku vegêr, sirgûn û bêcihûwariyê teswîr dike qedera “merivê kurd Serdar Azad” dişîbîne qedera hehecikan (r. 29). Ji ber ku hehecik cureyek ji çûkên koçber in, wextê koçber dikin gelek caran venagerin. Hehecik dema koçî cihekî nenas dikin ji xwe re hêlûnekê çê dikin. Heta jî ewlehiya xwe beled nebin, nêzîkî mirovên wê derê nabin (r. 30). Hehecika zaroktiya vegêr ji ber ku kulek bûbû, nedikarî bifiriya, ji hevalên xwe veqetiyabû, li paş mabû, ên din firiyabûn, xilas bibûn. Ji ber wê jî ji xwarinê tê birrîn, ji ber wê xemê roj bi roj dihele û taliyê dimire. Vegêr di navbera serpêhatiya hehecikê û hevalên wê yên koçber de têkiliyekî saz dike (r. 95) û xwe û yên wekî xwe sirgûn, koçber dişîbîne hevalên hehecikê. Herçî hehecik e di şexsê dostê vegêr ê li welat mayî de temsiliyeta rewşenbîrên kurd ên nekarîne yan jî nexwestine koçber bin, ji wê zilmê xilas bin û li welêt mane, di zindanan de, di bin îşkenceyan de hatine kuştin, temsîl dike. Dostê Serdar bi rezadilî li welêt dimîne, xebatên xwe yên çandî, siyasî didomîne. Tê girtin û bi îşkenceyê tê kuştin. Helbet ev yek karîgeriyeke neyînî li Serdar jî dike. Li welatê xerîbiyê bilûr dibe pardarê tenêtiya Kalo (r. 37). Kalo bi bilûrê, pêlên di hundirê wî de dikelin, radiwestîne (r. 36). Vegêr li welatê xerîbiyê “çarînên hêvî-hesret û azadiyê” nivîsîne (r. 44) û helbestên ku hêvî didin mêriv xwendine (r. 46). Xwestiye û dil kiriye da ku ew hewşên welatê xerîbiyê bişîbin hewşa mala wan a eşîrî, lê ne pêkan bû (r. 45).

3.2.2.2 Nebanbûn (Biyaniyên) û Tenêti

Nebanbûn (*biyanîbûn*, îng. *Alienation, estrangement*) bi giştî wekî tişta ku kesên ji xwe û dor-

hêla xwe ji dûr dixê, dike ku kes ji tiştêkî, dorhêla xwe, li xwe bi dûr keve, bibe biyanî, tê pênasekirin (Oxford, 2015: 508). Kesên li sirgûnê vê hesta nebanbûnê zêde zêde hîs dikin. Nebanbûnê tê wateya têtikilîqutkirin, dûrbûn û cudabûna takekesê ji merivan, civakê û dinêya derve. Takekesê nebanbûyî nikare bi civakê, çandê û hawirdora xwe re têtikiliyê saz bike, xwe wekî endamê komekî bihesibîne, loma xwe ji civakê dûr dixê û bi vî awayî tenêtiyê dijî û dibe neban. Jixwe sirgûnî jî kêr zêde tiştêkî bi vî rengî ye loma jî têtikiliyê xurt heye di navbera sirgûnî û nebanbûnê de. Uzun jî wekî sirgûniyekî, di berhema xwe de nebanbûna xwe teyisandiye. Uzun pêşî jî welatê xwe hatiye qetandin, paşê jî ji zimanê xwe yê dayîkê. Vê yekê jî kiriye ku nebanbûnê bijî, xwe bêçare, bêkes û bêkok hîs bike.

Tenêti ew hîs e ku yê diçine sirgûniyê berî pêşî rastî wê hîsê tîn, bi awatekî tîr vê hîsê dijîn. Çi bi riza dilî çî jî bi darê zorê be dîrketina ji kokên xwe, ji hezkiriyên xwe, ji welat û zimanê xwe berê mîriv dide tenêtiyê. Têkçûna jiyana berê, rasthatina zorî û zehmetiyên jiyaneke nû, ziman û welatekî nû, derûniya mîriv serobino dike, mîriv pêrgî tenêtiyê xedar tê. Uzun dizane sirgûnî qedera wî ya çarenîn/jêneger e, nikare jê bireve, loma di romanê de gelek çaran qala tenêtiyê dike. Bi rêya tenêtiya Serdar anku ez-vegêr xwestiyê qala tenêti û bêkesiya rewşenbîrên kurd ên sirgûn bike, bala me xwîneran bikişîne ser wê hestê. Stocholm ji bo wî cihê sirgûnê ye, lewma çî jî bike li bajêr germ nabe, nikare xwe bi temamî pê ve girê bide. Her tiştê ku li wir ber çavê wî dikevin sirgûniya wî pesend dikin. Stocholm çî qas cihekî medenî, xweş û azad jî be dîsa jî ji bo Serdar welatê xerîbiyê ye. Here ku derê jî dîsa hesta biyanîbûnê û tenêtiyê her û her hîs kiriye. Li gorî vegêr “mîriv divê bibe xerîbek li welatê xerîbiyê bibe biyaniyek. (...) û xerîbiyê, biyanîbûnê bijî... bijî” (r. 41).

3.2.2.3. Melankolî, Nostaljî û Bîr

Melankolî kirûyek e ku hin çaran wekî nexweşiyekî, hin çaran wekî haletê rûhiyeyê tê dîtin, bi têtgehên wekî wenda û huznê re pêwendiya wê tê sazkirin, carinan bi afirîneriyê carinan jî bi lihevnekirina bi sazûmanê, tê pênasekirin. Melankolîbûna ramangêran bi piranî girêdayî tefekûra wan a kûr e lê melankolî her gav di navbeyna dînitî û zanyariyê de çûye û hatiye. Di serdema modern de Freud melankolî bi feraseteke nû şîrove kiriye. Li gorî Freud şîn, bertekek e ku li hember wendabûna kesekî hezkirî yan jî nîrxên şênber yê wekî welat, azadî, îdealê tê nîşandan; ev wenda carinan jî dibe sedema melankoliyê (Freud, 2013: 243). Anku melankolî bi wendakirina tiştêya jê tê hezkirin, tê pênasekirin. Wekî tê dîtin bi xebatên Freud, melankolî ketiye ser xeteke nû. Têtikiliya melankoliyê ya bi nîrxên şênber ên wekî welat, azadî û îdealê re rêyeke nû li ber me vedike da ku em li ser meseleyên wekî bê-cihûwarî, bêkokî, wendabûna nasnameya kolektîv û hwd. rawestin ku ew meseleyên navborî gişk bi sirgûnê re têtikildar in.

